
Doza me


Qurban


Banga me



Dewra berê

banga heq ji


# kelhaamed

kovara Îslamî çandî û hunerî

Sal: 1 • Jimar: 3 • Zivistan 2009 - 2010 • Biha: 5 TL



## Azadiya me Îslam e
## Rewşa welat û dunya me


Beyatname


Nuxumandin


Bigre Şîret


دَعْوَا عَصَبِيَّتِى دَعْوَا ظُلْمِى يَه

# Îslam li ber dil şêrînî

*Îslam li ber dil şêrînî, rehma xweda ye di her hênî*
*Bînahîya însan tu yî, hem çavî jêr hem dûrbînî*

*Ne-j te be dunya tarî ye, roja te kirye ronî ye*
*Çibkim kora te nediye, dermanê qelbê birînî*

*Ger kor nizanbin qedrê te, nekrin bi ruh can durrê te*
*Em xwe dikin sed gorî te, tu-j bo me eşq û evînî*

*Ferhad bi milyona hene, tev aşiqê bejna te ne*
*Lewra li dor perwane ne, wek firfirokên havînî*

*Em hesreta ala te ne, her tim bi galgala te ne*
*Em berxê sersala te ne, me divê tu me neguhrînî*

*Dunya û axret ne bi te be, ya doje ya zulm û şev e*
*Hukmê te ger tim ser me be, namîne derd û ğemgînî*

*Dengê Ummeta Îslam*



بسم الله الرحمن الرحيم

## Ji Weşankar

**Bismîhî Subhanehû,**

Di jimareke nû de, em bi navê Allah, dest bi kovara xwe dikin. Em hêvîdarin ku navê Allah, ewê bibe wesîla rûsipîtiya me û bereketa vê xebatê.

Ev kovar, bi nîyeteke xalis û dilsoz birê ketiye, pişta xwe daye mîraseke bêhempa, berê xwe daye riza Xweda û azadiya gelê Kurd, bi hîdayetê.

Jiber gelê me xwe bi Îslamiyetê naskirye, mîraseke pir mezin ji me re maye. Lewra ne bi navê xwe tenê, bi eser (berhem) û jiyana xwe jî Melayê Bateyî, Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran, Ehmedê Xanî, Siyehpûş, ‘Eliyê Herîrî, Selahaddînê Kurdî, Şêx Seîd, Seîdê Nursî û yên din mîraseke Îslamî û însanî ji me re hiştine. Bi vê mîrasê em dikarin Rebbê xwe û qasidê Wî naskin, riya rast û çep jihev veqetînin û çanda xwe bidomînin. Delîla vê gotina me, berhem û jiyana van şexsîyeta ye.

Heger hun jî bixwazin, ka em bi hindikî bibne mêvanê Melayê Cizîrî û pirsa yekîtî û meznatiya Rebbê xwe jê bikin:

*“Sirrê wehdet ji ezel girtiye hetta bi ebed*
*Wahid û Ferd e bi zatê xwe, Wî nînin çu ‘eded”*

Yanî sirrê yekîtiya Allah e; ku kaînat (gerdun) ji ezel heta ebed girtiye. Ew Xweda ku yek e, ji ğeyr Wî zatê mezin kî heye? Ma ji vê gotinê nayê fêmê ku yên lipey ji ğeyr riza û de’wa Xwedê diçin, çiqas pûç û beradayî hereket dikin...

*“Yek e derya tu bizan, qenci çi mewc û çi hebab*
*Di esil da ku hemî av e, çi av û çi cemed”*

Bizanbe ku behr yek e her çiqas mewc û pêl cûr be cûr bin jî. Eslê teva av e, heliyayî be; yan qeşa be. Kaînat jî bi vî hawayî ye. Tev ji behra navên Xweda ne. Her tişt cilwe û beriqandina esmaê îlahî ne.

*“Afitabê ehedîyyet di xwe da girtîye kewn*
*Ne ku ‘ewrek heye, lê girtîye çehvên me remed”*

Tava yekîtîya Allah e, ku hemî kaînat îhate û dorpêç kirîye. ‘Ewr ne mani’ û astengin jiboy dîtina yekîtîya Allah; belkî nexweşiya çava ye sebebê nedîtinê. Çewa emê şahidî meznatiya rebbê xwe nebin? Ma her tişt ne sen’et û hunerên wî ne. Qey bê hunermend mumkun e ku huner bibe? Ma ev hebuna ku însan ‘aciz e, ji fêm û çêkirina wê, ne mohra yekîtî û meznatiya rebbê me ye? Heger hê em nebînin divê em li nêrina xwe û çavê xwe binêrin. Lewra emê bibînin ku bi kibr, hêrs, menfe’et, şehwet û ideolojîyên pûç, nexweş e. Divê em li tedawiyê bigerin. Doktorê van nexweşiya jî encex qasidên Xweda û warisên wan bin...

Bi **“Parastina Mîrasa Çandî”** û **“Destana Meşa Azadiyê**” emê van me’na bibîr bînin...

Di vê jimarê de emê **“Meyzandina meyî li Gel û Qebîla”** eşkere bikin û di bin sîya Quranê de li gel û qebîla meyzênin, **“Bi Kurtehî Dîroka Kurda”** bixweynin, **“Doza me”** ewê di **“Teşî”**yê de bê rêsandin. Bi **“Çûna ba Helîme”** emê li heyata Hebîbê Xweda û bi **“Hinek wesfên Hezretî Fatima”** li gulilka mala wehyê, mîsala jinên Musluman binêrin, digel van **“Pîrek Dipeyvin”** û dibên **“Ey Xweha musluman” “Nuxumandin”** şerefa te ye.

Jiber ku ev jimara me li ‘îda Qurbanê û meha Muherremê rast tê, emê heqîqeta Qurbanê, ‘Îdê û Îmamê Huseyn yad bikin.

Dîsa emê **“Herne ber pez”** û bi xwendina **“Xefkê li ber xort û keçên Kurda”** hişyar bibin, Ewê Fexreddîn Şemrexî bê **“Bigre şîret nebe sosret”** Abdulbaqî Botî **“Dewra Berê”** bi bîra me bîne, Muhemmedê Hecî’ezem **“Sebr û Tewekkul”**ê tewsîye bike.

Bi **“Bedîuzzeman û mîllîyet” “Du Nukte”** û **“Nura Îmanê”** emê di dersa seydayê Bedîuzzeman de çoka bişkînin û guhdariya emrê heqiyê bikin.

Hasilê kelam, xwendevanên hêja! Emê bi vê kovarê jî mest bibin înşaallah. Bi nivîs, helbest, hevpeyvîn, zarok û wergerên hêja emê bêhna xwe berdin.

Em hêvîdarin ku hunê jî bêdeng nemînin: bixwînin û bidne xwendin. Bi tewsîye û di’ayên xwe ji me re bibne alîkar.

Heta jimareke nû, bimînin di xêr û xweşiyê de, spartî rebbê ‘alemê bin.

# naverok


Parastina Mîrasa Çandî....................Kelhaamed....................3
Du Nukte....................Risale-î Nûr....................5
Peyvên mezina....................5
Hewar rabin hewar e....................Mela Mizgîn....................7
Teşî....................M. Zanyar....................9
Doza Me....................Hesen El-Benna....................10
Çuna Ba Helîme....................M. Kılıç....................12
Hinek Wesfên Hezretî Fatima....................M. Xalid Bağdu....................14
Nuxumandin....................Yasemîn Kılıç....................16
Pîrek Dipeyvin....................Feyzullah Zerey....................20
Cejn a Me Ye....................Naşît Tutar....................21
Boraq/Qurban....................M.Ehmed el-Qoğî....................22
Qurban Çi Ye?....................M. M. et-Tibyatî....................23
Nura Îmanê....................Seîd Yusuf....................24
Gûz û Mewîj....................Şêx M. Xinukî....................25
Banga Me: Biratî ye....................'Emerê Wezrînî....................26
Mele Îbrahîmê kurê Mele Îsma'îl....................28
Ava Heyatê: Gotinên Hebîbê Xweda....................29
Xefkê Li Ber Xort û Keçên Kurda....................M. Emînzade....................30
Seyda Bedîuzzeman û Millîyet....................33
Bigre Şîret Nebe Sosret....................F. Şemrexî....................34
Munacaat....................Sîyehpûş....................35
Ebu Ubeyde Bîn Cerrah....................Muharrem Feqîr....................36
Kanîya Hêzê....................Îbrahîm Berzencî....................37
Dil Got....................Selamîyê Bilêderî....................38
Werin Em Herne Ber Pez....................F.Muhemmed....................39
Dewra Berê....................'Ebdulbaqî Botî....................40
Hevpeyvînek....................C. Karaman....................42
Xweşdîtina Misilmana....................M. Mucahid....................44
Ziman û Zimanê Dozvanê Îslamê....................Muhsîn Canan....................45
Rîyakarî....................Huseyîn Olam....................46
Namê Allah....................Şêx Ehmedê Xanî....................47
Sebr û Tewekkul....................M. Hecî'ezem....................48
Em Meğlub nabin....................49
Nimêj....................M. Tahir Soranî....................50
Rûsipîtî....................Mamoste Faruq....................51
Ma Qey Kesî Xwend....................H. Weysî Sipyagî....................51
Bey'atname....................Şêx Selaheddîn....................52
Edeb û Heya....................Adem Gönül....................54
Dest Hirayi....................Hesen Çoligî....................55
A Menda Mar Muslumantir a....................Î.Çabakçurî....................55
'Erebî....................'Ebdussamed Hilmî....................56
Bexçê Zaroka....................60
Ji Xwendevana....................64


✍M. Muhammed Bêcirmanî



## Meyzandina Meyî Li Gel û Qebîla

*...bawerkerên bi vî dînî, di tu dem û dewrên dîrokê de te'assuba cahilî û rehperestî ne kirin e. Ji kîja gelî bin hebuna gelên din înkar nekirin e.*

6

✍Zînnur Zivingî

## Dîroka Kurda



*Gelê Kurd di rojhilat a navîn de, gellekî kevnare ye ku di herêman ji çîyayên Zagros destpêdike heta çîyayên Torosê, bi cî buye.*

8

✍Ömer Faruk Sîpkanî



## Ey Xweha Misilman

*Pîrekê misilmanê Kurd bi xapa anîne halekî wisa ku bêje: "Em jinin, ne namusa kesî ne", "Namusa me azadîye." Bi çend gotinê xemilandî pîrekê Misilmanê Kurd di xapînin û wan dixine xizmeta kafira.*

18

✍Necat Özdemir

## Hevpeyvîn



***Sıddık Şeyxanzade***

*"Heger îro musluman bi me'nake heqîqî werne bal hev û bibne ehlê tewhîdê, wî çağî wek gotina Seydayê Bedîûzzaman "Madem em muwahhîd in, naxwe em muttehîd in."*

32


kelhaamed
banga heq ji
Kovara Îslamî Çandî û Hunerî

Sal (Yıl) : 1 ❖ Jimar (Sayı) : 3 ❖ Biha (Fiyat) : 5 TL
Zivistan (Kanun - Çile - Sibat) 2009 - 2010
❖
Xwedî u Berpirsîyarê Nivîsaran
(Sahibi ve Yazı işleri Müdürü): Abdulkudus YALÇIN
❖
Ciyê Îdarê (İdare Yeri) : Yavuz Selim Mah. Mehmetçik Sk. No:71 K: 3/E Esenler/İSTANBUL
❖
Têkilî (İletişim - Sipariş):
Tel : 0212 646 21 72
Gsm: 0530 226 99 63

Web: www.kelhaamed.com
Mail: kelhaamed@kelhaamed.com
❖
PTT Hesap No: Abdulhalim TÜRE - 591 87 91
❖
Yaygın Süreli
❖
Çapxane (Matbaa):
Platin ofset : 0212 446 00 79
❖
Nîşe (Not): Mesulîyeta Ramanên Nivîsaran aîdê Nivîskaran e. Berhemên têne şandin nayên vegerandin.

Behra wucûdê coşi hat
Nûrek tenezzul bû ji zat
Hatin te'eyyun têk sifat
Eşya zuhûr 'ilmîyye da
*(Melayê Cizîrî)*


# Parastina Mîrasa Çandî

**...Serokê ku dinav gel de mezin bûne û gel ji alî dînî ve jîndar digrin hene. Hin ji wan hê dijîn û hinan jî rehmet kirine. Jiyana van însanan, liser gel bandor e. Ji bona pêşîya, winda bûna van buhayan bête girtin, divê ku bêne qeydkirin û sitirandin.**

Hemd ji Rebbê 'alemê re be. Selat û silav li ser Pêxemberê me Muhammed (Sallallahu 'aleyhi we sellem) al û eshab û etba'ên wî be...

Wekî em dizanin, ji destpêkirina dîroka Cumhûrîyetê û vir de, milletê Kurdê misilman ku ji Îslamê pêve dîn û şêwaza (metod, usul) vvvî jê re tune ye, ji bo bête guhertin û buhayên wî yên netewî, dînî, çandî û însanî bêne tunekirin, xebat hate kirin. Bona vê yekê pêk bînin, zordestîyên leşkerî, siyasî, çandî û aborî kirin. Li dînê wî heqaret hat kirin. Ew xistin dewsa ehmeqan. Jiber ku nevîyên Selaheddîn bûn, hatin parçekirin. Tune hat hesibandin. Hat guherandin. Hat lînçkirin...

Di encamê de ev gel bû parçe parçe. Birçî û nezan ma. Hinekî jî asîmîle bû. Piçkî ji dîn dur ket. Heta ewqasî dûr ket ku, bawer kir windakirina buhayên wî yên însanî, seb dilsozîya wîyî bi dîn re ye. Em dibin şahid ku her roj piçkî dîtir dûr dikeve. Bêguman ji bo standina buhayên çandî, dema hin kes xebitîn wan jî xwestin gel ji eslê wî dûr bikin



û ‘eynî bêhurmetî kirin û xebitîn ji bo biguherînin. Naxwe navbeyna pêla asîmîlasyona kevin û di ya nû de, ji alî nêrîn û zîhnîyetê ve, cudatiyek nîne.

Lê însanîyetê ev fêhm kir ku pir çandên ji hevdû bi temamî cuda, dikarin bê teşqele û bi destgirî, bi hev re bijîn. Di vê heyamê ku li mafê heywanan tê pirsîn, însanîyetê fehm kir ku, neqebulkirina mirova li ser halê wan û nexweşîya neqebulkirina cudatîyan, iflas kirîye. Di heyama me de, ferd û cudatîya qîmet sitandin e. Divê dema ku sazîyên çandî yên ku hijmara wan ji tilîyên destekî derbas nakin piştevanîyê dibînin de, li zîhînan hate nexşkirin ku, xebatkarîya li ser îmhakirina mirovên bi deh milyon însana bi tu buhayên/nirxên dînî, sîyasî û însanî re, li hev nake.



Li ser vê rewşê, di van rojê ku hişyarbûnê jêr: “Ji nû ve vejîn” dikarê bête gotin çêdibin de, divê ku gavên zexm bêne avêtin; ji bo gihandina armanca rast cudatîyên ferdan ber çavan bêne girtin; nirxên çandî yên bi sed salan bin siha Qur’anê de geş bûne, zindî bêne hiştin û ji bona ji wan nirxan bi asta ezamî bête istifadekirin, xezîne bête derxistin û qeydkirin.

Divê ku ev neyê jibîrkirin, mirov bi qasî zanebûn û xwedîkarîya zimanê xwe yê dayîkî, pêşveçûyinê nîşan didin. Zimanê we, çi qasî dewlemend be, seha we ya ifadekirinê ew qasî fireh e.

Bi qasî nemimkunîyê zor e ku gelê we, hemû zimanên biyarî hîn bibe. Lêbelê bi wesîteya zimanê xwe yê dayîkî, dikare xwe bigihîne dewlemendîyek çandî ya ku li her qorzîka dinyayê tête hilberandin. Dikare bigihe vî buhayî. Ji ber vê divê ku zimanê dayîkî ji bo îfadekirina dewlemendîyên têne hilberandin kêrhatî be. Bêguman divê ku ji sewiyeya zimanê çîrokan pêşvetir be û bi asta îfadekerîya zimanê felsefe û zanistî pêşveçûyî be. Ziman xwedî bingehek jîndewar, pêşveçûyîn û paşketinê ye. Bi vê sedemê îhtimala ku bigihe asta îfadekerîya armanca xwe, tê qebulkirin.

Zimanekî ku bikaribe çîroka “Mem û Zîn” bi helbestan îfade bike, em dikarin bêjin di heyema xwe de pêşketî bû û hewcetîyên dewra xwe bi zêdeyî pêk anîye. Lêbelê vî tiştî, îro li Tirkîye, bi hêsanî ji bo Kurdî em nikarin bêjin.

Di vê pêvajoyê/sürecê de, ne zimanekî wê yî medya, ne jî zimanekî nivîskî/fermî çêbû. Ji ber vê yekê, di seyra tabi’î de Jiyana xwe domand. Di bin bandora çandên derdorê xwe da ma û li wan bandor kir. Carnan ji ‘Erebî, carnan ji Tirkî, carnan ji zimanê herêmî bandor/tesîr dît û li wan bandor kir. Lêbelê di vê pêvajoyê/sürecê de, ji hevdû veqetîn û cudatî peyde bû. Navbeyna herêman de, car car, bû sedema ji hevdû nefêhmkirinê. Ev ji rexekî ve baş çêbû, ji rexekî ve ne baş bû. Rexê baş ev e: Ziman di rêza xwe ya tabi’î de domîya û ji bona ma’nekî, çend gotinê cuda çêbûn. Ev, dewlemendîyek e. Ji bo bikaranîna vê, îhtîmam lazîm e. Lewra lihevanîna gotinan, ne ji vê xwezayîyê ye. Rexê menfî jî ev e: Bû sedema bête gumankirin ku wê zimanek şirîk çênebe. Ev rewş, ji alî nîyet xeraban ve, bi salan di çarçoveya projeya asîmîlasyon û qutifandin de, hember ziman û gel hate bikaranîn.

Bêguman dibe ku ev rewş wergere avantajê. Ev çanda ji hevdu xweser, heger li hev bête civandin û nirxandin, wê bibe xwedîyê xezîneyek ziman ya mezin.

Digel vê, serokê ku di nav gel de mezin bûne û gel ji alî dînî ve jîndar digrin hene. Hin ji wan hê dijîn û hinan jî rehmet kirine. Jiyana van însanan, ser gel bandor e. Ji bona pêşîya winda bûna van buhayan bête girtin, divê ku bêne qeydkirin û strandin. Ji bona pêşîya windabuna berhemên çandî yên wekî çîrok û gotinên pêşîyan bête girtin, zindî bimînin û bigihin destê ehlê ilim, divê ku bêne qeydkirin.

Wexta me çanda pêşîyên xwe parast u mihafeze kir emê bibînin ku mîraseke İslamî û dewlemend ji pêşîyên me ji mer maye. Ewê zarokên me bi vê çandê rabin, ne bi çanda ewrupa û ğerbê ku aniha tê teşwiqkirin. Di çand û mîrasa pêşîyan de rih heye, heyat heye lewra İslamî ye; belê çanda Ewropa cesedekî bê rih e; yanî mirî ye. Lazim e neslên nû vêya baş bizanbin... Spartî Xweda ê Te’ala bin...

# Peyvên Mezina

- Milletekî ku terka cîhadê bike; mehkumê di bin zillet ê de bijîne. (Hz. Ebu Bekr)

- Çar ruknê kufrê hene: Qahr, şehwet, hamaqat(yanî ehmeqtî) û timakarî. (Wehb b. Munebbih)

- Heger hun xêr û xweşîya heyatê dixwazin, heyata xwe bi Îman ê, bican bikin, bi pêkanîna ferza bixemilînin, û bi parastina ji guneha muhafeze bikin. (Bedîuzzeman Se'îd Nursî)

- Ser ava şêrîn her dem qelebalix e. (Mewlana)

- 'Alim ku bimre jî li heyatê ye. Cahil di sağbuna xwe de mirîye. (Hz. 'Elî)

- Ji menfi'etê dinyê ev her sê tişt baqî dimênin: Hevalê sadiq, feyza ji Quran ê tê girtin û li cihê xalî ku meriv Xweda bi bîra xwe bîne. (Malik b. Dînar)

- 'Efukirina zalima, zulma li mezluma ye. (Hz. 'Umer)

- Tavek ji tavê Nîsanê çêtire ji malê Xorasan ê. (Gotina pêşîyên Kurda)

- Ê ku malê xwe 'ezîz dike xwe rezîl dike. Û, ê ku malê xwe rezîl dike xwe 'ezîz dike. (Gotina pêşîyên Kurda)

- Mal ket malê xwe muhafeze bike. Mal buha bu ujdanê xwe muhafeze bike. (Gotina pêşîyên Kurda)

## Ji "Lem'a Yazdehemîn"

# DU NUKTE

Bi navê Xweda ê Rehman û Rehîm

**"Ji we re, ji nav we pêxemberekî wisa hatîye ku hun têkevin diltengîyê ev pê gelek giran tê. Dilê wî pir li ser we ye. Ji mumina re zahf bi şefqet û zahf bi rahmet e."** [1]

Di vê ayetê de di meqamê pêşî de rîayeta metoda sinnetê heyê, di meqamê duduyan de jî derencên rîayeta sinnetê heyê.

**"Heke berê xwe ji te vegerînin, ji wan re bêje: "Xweda besi min e. Ji Wî pêve layîqê 'îbadetê tu îlah nîn e. Min her xwe sipartîye Wî. Ew xwedîyê 'erşê mezin e."** [2]

Ji va herdu ayetên bilind, bi seda ma'nê narîn dertên. Belê bi kurtî yazdeh nukte ê nazik û narîn wê bên beyankirin. *(Di vê nivîsê de, du nukte hatine wergerandin)*

**Nukteya Yekemîn**

Resulê Ekrem 'aleyhisselat û wesselam ferman kiriye ku: ***"Kî, di dema fesada ummeta min de, xwe bi sinneta min bigre, xêra sed şehîdî kar dike."***

Erê, rîayeta sunneta senîyye miheqqeq pir bi qîmet e. Nexasim di wextê ku bîd'a her cîh dagirtibe, pêgirtina sunneta senîyyê hê pir hêjatir e. Xususen zemanê ku ummet dinav fesadîyê de be, rîayeta adabekî biçuk teqwake muhim û bawerîyeke bi qewet divê. Rasterast rîayeta sunnetê, Resulê Ekrem 'aleyhisselat û wesselam bibîr tînê. Ev bîranîn, vedgere bîranîna hizura Xweda. Heta di mi'ameleke biçuk de; heta di dema rîayeta sunnetê di xwarin–vexwarin û edeba razanê de, di wê kêlîyê de ev mi'amela hêsan û fitrî dibe 'îbadetek bixêr û tevgerîyek şer'î.

Lewra bi wê lebata hêsan, xwe tabi'ê Resulê Ekrem 'aleyhisselat û wesselam dibîne û tesewwura edebek şeri'etê dike û tê hiş û eqlê wî ku Xwedîyê Şerî'etê ew e. Ji ber vê dilê wî diçe bibal Xwedyê şerî'atêyî heqîqî ve, bi vi awayî hizur û 'îbadête qezenc dike.

Ji ber vê yekê ê ku riayeta sunneta seniyye jixwer bike 'adet, hemî 'adetê xwe diqulubînê 'îbadetê, tevê Jiyana xwe kare bike semeredar û sewabdar.

**Nukteya Duyemin**

Îmamê Rebbanî Ahmedê Faruqî (Xweda jê razî be) gotîye: **"Wexta ez di seyeheta meqamê ma'newî de digerîyam û dinav merteban de bilind dibum, di tebeqên ewlîyaan de mi temaşe kir ku, dinav wan de herî bişewq, herî bilind, herî spehî û herî pêbawer ewin ku rîayeta sunnetê jixwer kiribûn bingeh. Heta di vê tebeqê de ewliya ên 'amî, ji welîyen xas ê tebeqên din, bêtir rewneqdar û muhteşem bûn."** [3]

Erê, Muceddidê elf-î Sanî; İmamê Rebbanî heq dibêje. Ê ku sunneta seniyyê bike bingeh; di bin siya Hebîbê Xweda de, dighê meqamê mehbubîyetê. (Yanî dighê hezkirina Xweda) *(Risale: Mirqatü's–Sünne Wergêr: Ken'anê Nisêbînî)*

---

1. Tewbe: 128
2. Tewbe: 129
3. İmam Rebbanî (El–Mektubat: 260. Mektup)

M.Muhammed Bêcirmanî

Ne Kurdî û ne Tirkî ne
Ne li pey irqa zengarin
Li pey de'wa Resulullah
Birê Selman û 'Emmar in
*(Mela Mizgîn)*



# Meyzandina Meyî Li Gel û Qebîla

Hemd, ê Xweda ê 'alemê be, em bawerê bi dînê Îslamê ne. Ji ber vê yekê weke her mesele yî li vê meselê jî em di şibaka Îslamê de dimeyzênin. Û em ji hukmê Îslamî pêve tu hukmê din rast û heq nabînin.

Çavkanîyên Îslama bê hemta aşîkar kufşe û beyandikin ku însan tev bi çar hawaya yekin, ji hev nezêde û kêmtirin.

**1–** Bi xaliq û aferînende ê xwe yekin, lewra xaliqê tevên însana Allah Te'ala ye. Tev eser û hunerên Wî ne.

**2–** Însan tev bi bav û dîya xwe jî yekin; lewra tev ji bavê me Adem û dîya me Hewwa ne. (Selamê Xweda li wan be.) Tevên kitebên semawî (Tewrat, Zebur, Încîl, suhuf û Qur'an) bi yek zimanî weha beyan dikin, dibêjin.

**3–** Însan tev ji ax û ava yek sitêrê ne. Ku ev sitêra em tev li serê dijîn û dimrin.

**4–** Însan tev vêgavê bi pêxemberê xwe jî yekin; lewra Muhammed (Sallallahu 'aleyhî we sellem) ji tevên însana re, bê veqatandin, hatîye şandin. Tevên însana tê de heparin/şirîkin.

Rebbê 'alemê di Qur'an'a Kerîm de ev mijar ji me re weha beyan kirîye: ***"Gelî însana! Me we, ji zilam û pîrekekî afirandîye û ji bonî ku hun hevdu nasbikin me we kiriye gel û qebîle. Bêguman li cem Xweda qenctirê we teqwatirê we ye. Bêguman Allah gelek zana û haydar e."*** *(Hucurat: 13)*

Pêxemberê 'alemê Muhammed (Sallallahu 'aleyhî we sellem) jî, di derheqa vê mijarê de weha kerem kirîye: ***"Gelî însana! Bêguman Rebbê we yeke, bavê we yeke, hun tev ji Adem in û Adem jî ji axê ye. Qenctirinê we teqwatirinê we ye. Ji teqwa ê pêve zêdayeke 'Ereba li ser 'Ecema tune."*** *(Beyheqî/Terğîb û Terhîb/ Mecmu'uz Zewaîd/el fiqhul Îslamî Wehbe Zuheylî C:8, S: 6415 Arabî wesana Darul Fikir)*

***"Însan mîna diranê şe, weke hevin; zêdayeke 'Ereba li ser 'Ecema tune, zêdayî tenê bi teqwayê ye."*** *(Subulus-Selam/El Fiqhul Îslamî, C: 9, S: 6736)*

***"Bêguman Rebbê we yeke, bavê we yeke. Ku ne bi teqwa ê be, zêdayeke 'Ereba li ser 'Ecema, a sipîya li ser reşa tune."*** *(Cem'ul Fawaîd/Rudanî, jimara hedîsê: 4144)*

***"Me te mizgînvan û hişyarker ji hemu însana re şandîye (ne ji hineka re). Lêbelê pirên însana nizanin."*** *(Sebe:28)*

***"Tu bêje: "Gelî însana! Bêguman ez qasidê Xwedê me, bi bal we teva ve hatime şandin. Ew Xweda ê ku tevên asîmana û erdê ê Wî ne. Ji wî pêve tu Xweda nînin..."*** *(A'raf: 158)*

Ha weha, piştî ku Xweda ê tevên gela û qebîla yeke, bav û dîya wan yeke ji ax û ava sitêrekî ne û pêxemberê wanî dawî jî yeke, naxwe bi esl û riha xwe kes ji kesî ne

çêtir e û ne baştir e. Belê weke ku di ayet û hedîsên buhurîn de jî derbas bu, bi teqwa ê yanê bi dînên xwe û exlaqên xwe, ji hev zêde û kêm, baş û pîs, bilind û nizim dibin.

Herkes qebul dike ku birakî kafir û birakî musluman, birakî ‘adil û birakî zalim, yekî rastgot û yekî deruker, yekî hîlebaz û yekî dirist yekî paqij û yekî çepel, yekî camêr û yekî çikuz her weha... ne yekin.

Ji ber vê heqîqeta eşkere û kufşeye ku di dînê Îslamê de heyî bawerkerên bi vî dînî, di tu dem û dewrên dîrokê de te’assuba cahilî û rehperestî ne kirin e. Ji kîja gelî bin hebuna gelên din înkar nekirin e. Xerabên xwe ji başên gelên din çêtir ne dîtin e. Ziman û tevên heqên însanî ên gelên din, ji wan qedexe ne kirin e. Di vê yekê de heke em li dîroka Îslamê meyzekin, ji siltanên Emewîya pêve kesî ev rêz xira nekiri ye. Belê dost û neyar dizanin ku siltanê Emewîya di zilm û rehperestîya xwede li pey te’lîmên Îslamê ne meşîn e. *(Ma’lume ‘Umer ê lawê ‘Ebdul’ezîz -Xweda jê razî be- ji wan xaric e. Lewra ew ji xelîfên ‘adil e.)*

Nêzî hezar û sêsed salî gelek gel û qebîle di bin sîya hukmê Îslamê de Jiyana xwe bi serbestî bibiratî û azad domandin. Belê piştî hukmê Îslamî hate rakirin û hukmên duwêlên emperyalî dicîyê wê de hate danîn, qernek diserde derbas nebu, te’assub û rehperesti di nav her gel û qebîla da bicî kirin, hinek kirin serdest hinek jî kirin bindest. Zimanên gelek gela men’ kirin û wan ji gelek mafên însanî bêpar hiştin.

Tevî van heqîqetên eşkere ku kes nikare înkar bîke, em heyîrî û şaş dimînin li hinekên ku dibêjin “Em tekoşîn û kêferata azadîya gelê xwe didin” û neyartîyê bi Îslamê re dikin û hez ji emperyalî û felsefe û fikrên wan dikin û bune heyranê wan.

Hez kirina me ji gel û qewma re bi qasi Muslumanî ‘edalet û xizmeta wanî ji însana re ye. Ji bonî ku Resulê Ekrem Muhammed (Sallallahu ‘aleyhî we sellem) pirên sehabên kîram (Xweda ji wan razî be.) ‘Ereb in, Qur’an bi ‘Erebî ye û xizmeta wanî ji dinya û axreta însana re bê hesab e. Hez kirin û hurmeta me ji wan re bê hesab e. Di pey wan re xizmeta gelên Tirk, Kurd û Faris ji Îslamê, Muslumana re û ji însanîyetê re gelek çêbune nayê înkar kirin. Ji ber vê yekê em ji wan jî pir hez dikin. Di dîroka Îslamîyetê de digel ‘Ereban her sê milletên din jî gelek bi hurmet û şerefin.

Wer hasil tevên gel û qebîla ‘îbad û mexluqên Xweda ê alemê ne. Ên ku weke emr û nehyê Wî bi meşin ew qencin, layiqê hez kirin û hurmetê ne û ên ku li berê rabin û muxalîfê Wî herin ew terorîstin. Karê wan timî xerakirin û zilm e. Ne layiqê hurmet û hez kirinê ne.

Xweda ê alemê her û daîm xizmeta Îslamîyet û însanîyetê bike qismetê me û me bike layiqên hurmet û hez kirina însana.

Bi selam û dua re em we dispêrne Xweda ê ‘alemê.

# *Hewar rabin hewar e*

***Hewar rabin hewar e gelê mumin bi ğîret***
***Bes e îdî temaşe sukût û tirs û zîllet***

***Temam ê têne kuştin li Ḡezzê û Filistîn***
***Em in tev muslumanin serî rakin bi ‘izzet***

***Hewar û hem qîrîna jin û zarok û kalan***
***Dibin fuze û bomba dilê guran dike qet***

***Sukût û sernuxunî ne karê mumina ye***
***Qiyam ferze li ser me bi Quran û bi sunnet***

***Temamê hêzê kufrê xwe dane pişt Cihûya***
***Di vê em jî ji bonî Hemasê bibne quwwet***

***Hemas ceng û cîhad e li ber kufra dinê tev***
***Ji bo Qudsa mubarek bi zîvrîne li ummet***

*Mela Mizgîn*
*(22 Çile 2009)*



Zînnur Zivingî

# Bi Kurtehî Dîroka Kurda

Wexta em dixwazin li dîroka milletê xwe binêrin; wek zanebûna dîroka Îslamê û pêxembera, ne mimkun e ku bi hêsanî bê tesbît kirin. Lewra dîroka Îslamê ji teref rebbê 'alemê ve hatîye qeydkirin û hunda nebûye. Belê dîrokên gela, ne wilo ne. Axa derbasbuna zeman bi ser wan dabuya û pir tişt hundayî ne. Jiber vê yekê kes nikare bêje: "Dîroka me, bi her hawayê xwe ev e" Belkî ji hinek delîla tê derxistin ku yek dikare bejê: "Belkî bi vî hawayî be"

Piştî hatina Îslamê, nivîs û qeydkirin di nav milletên Musluman de belav bu. Belê; berya Îslamê, baxusus milletên wek Kurda, nivîs û qeydkirin bikarneanîne. Jiber vê yekê wexta em li dîroka Kurda yî berya Îslamê dinêrin digel hinek buyerên qet'i, em nikarin bi qet'îyyeteke 'umumî bipeyvin. Di vê çarçovê û zanebûnê de, bi qederê imkanê xwe bi kurtehî emê li dîroka gellê xwey berya Îslamê binêrin.

Gelê Kurd di rojhilat a navîn de, gellekî kevnare ye ku di herêman ji çîyayên Zagros destpêdike heta çîyayên Torosê, bi cî buye. Zimanê Kurmancî di gruba zimanên **"Hînd-Ewrupa"** de ye. Zimanê Kurdî di nav gruba **"Zimanên İranî"** de di gruba **"Bakurê rojava"** de ye. Kurd; mensubê etnîtîsma **"Aryan"**îyan e. Di dîrokê de ji herêma Kurda re navên wek Kurdistan û mezrabota hatine gotin.



Navê **"Kurd"** navekî pir kevn e. Hinek lêkolîner dibêjin koka kelîma "Kurd" "Kur" e; ku ev kelîme di zimanê Sumer a de hatîye bikaranîn. Di dewleta Sumer de ji çîya re **"Kur"** gotine. **"Tî"** îlawe û pêvek e ku tê me'na 'aîdîyetê. Bi vî şeklî kelîma **"KURTİ"** tê me'na **"Ehlê çîya, gelê çîyayî"** ***Kevnbuna vî navî heta berya "mîlad" ê 3000 sal e.***

Ligor tê zanîn herêma Kurdistanê çîyayî ye. Di zemanên berê de ligor herêma kesa nav li wan dihatine kirin. Hinek dîrokvan dibêjin Kurd jiber di çîya de bun û herêma ku tê de dijîn çîyayî bu, ji wan re **Kurtî** hatîye gotin, bi vî şeklî hatine navkirin.

Ev navê **"Kurtî"** ji teref Grekan ve berya 2200 salî bi şeklê **"Kurdîenne"** (memleketê Kurda) derbas buye. Di kevalbereke (tablet) Sumeran de navê **"Kurtîe"** derbas buye û hinek zanyara gotîye evana Kurdên berê ne. Li gor G. R Drîver ev cîyê behs tê kirin başurê gola Wanê ye.

Di kevalbereke ku ji Asurîyan maye navê **"Kurtî-Qurtîe"** derbas dibe. Dîsa G. R. Drîver gotîye "Dibe ku ev der der û dora Bidlîs û herêma Mezrabota be." Di kevalberên Asurîyan de jiboy Kurtîya dibên "Cinê/mezinên çîya"

Di nîvîsa xwe yî bi navê **"The Name Kurd And İts Phîlologîcal Connectîons"** de Drîver dibê; *"Her çikas cihêbun di navbera Kurtî, Karda, Karduk, Gord, Kord, Kardakes, Kyrtîî de hebe jî tev di dengê "krd/krt" de şirîk in. Ev jî dide nîşandan ku ji kokekê tên."*

*Ligor Dîrokvana, gelên di mezrabota de derketine, weke Subaruyan, Kurtîyan, Gutîyan, Luluyan, Kusîyan, Kassîtan, Mîttanîyan, Mannaîyan, Urartuyan, Cyrtîyan, Kardukîyan û Medan bi îhtîmaleke mezin Kurd in.*

Nivîs di dîroka Kurda de diçe berya 1000 salî. Baba Tahirê Hemedanî(935-1010) li İranê bi zimanê Kurdî berya 1100 salî nivîsand. Ev Nivîs bi elfaba 'Erebî bu. Piştî wî 400 sal derbas bu û 'Elîyê Herîrî(1425-1495) dest bi nivîsandina Kurdî kir. Piştî sed sal derbas bu Feqîyê Teyran(1590-1660) dest bi nivîsandina zimanê Kurdî kir. Di wê demê de Melayê Cizîrî(1570-1640) bi zimanê helbest û qesîdên xwe nivîsandin. Heta gihîştine Ehmedê Xanî(1650-1707) ku piştî "Mela" di nava 50 salî de xuya bu. Wî jî berhem û kitêbên xwe digel 'Erebî bi zimanê Kurmancî nivîsandin... Bi vî hewayî Kurd gihîştine roja me...

**Herêma Kurdistanê**

Di dîrokê de cîyê Mezrabota, der û dorê çîyayê Zagrosê û Kurdistanê cihê ye. Lewra nivîs di vê herêmê de dest pe kir. Qasidên Xweda li vê herêmê gerîyan û dînê Xweda teblîğ kirin... Teker (çerxe) pêşî li vir zîvirî, teleskop li vir berê xwe da asîmana, helbest li vir hatine nivîsandin, 'îbadetê li vir dest pê kir. Çemê Dîcle û Ferat di dîrokê de cîh girtin...

**Di dîrokê de Kurd**

Di dîrokê de pir beg, xunkar û dewlet li Kurdistanê hakim bun. Dîrokvanê Yunan û Roma behsa wan kirin. Di kevalberên Hîtîta de behsa Subaruyan hate kirin. Li gor van kevalbera yên di herêmê de peşî dewlet sazkirine Hurrî bune, ku bi navê Mîttanî dewletek sazkirine. Ligor tê gotin Mîttanî "Qewmê Medyen e" ku di Qur'anê de derbas dibin û Hezret-î Şu'eyb ('eleyhîsselam) bi qasidtî ji wan re hatîye şandin.

Dibêjin berya "Mîlad" ê bi sê-çar hezar salî, Subaru di herêmê de bun û navê çemê Ferat ji teref wan hatîye dayîn. Ligor tê zanîn Subaru û Hurrî ji kokekê ne. Navê Subaru ya di gotineke din de "Suvar" e. Dibêjin ev kelîme ji kelîma "Şivan" tê.

Belê xuyabuna Kurda di dîrokê de berya "Mîlad" ê bi hezar salî destpêkirîye. Wî çağî "qewmê Med" ku dibin hakîmiyeta Asurîyan de bu, tekoşîn û micadelê li hember Asurîyan dike û berya "Mîlad" ê di sala 612an de dewleta Asurîyan ji ser ruyê 'erdê radikin û dewleta "Med" sazdikin. Di derbasbuna dîrokê de pêşî bi dewletî dibine şirîkê Farisa yanî dewleta Pers, di pişt re bi îşğala İskender dikevne bin hukmê Makedon a, piştî "Mîlad" ê di sala 30 de jî dikevne bin hikmê Roma û heta fetha İslamê bi sed sala di bin hikmê Roma de dimînin. Di temamê hakîmiyeta de "'Eşîr, Beg û Mîr"a îdare û rêveberîya Kurda kirine. Di qerna 10an û 11an de hinek dewletên wek Merwanî û Şeddadî ji teref Kurda ve têne sazkirin. Heta dikevne bin hikmê dewleta Osmanîyan.

Şixwe piştî qebulkirina Îslamê tu veşartî tuneye. Êdî di nivîs ne din de emê li ser dîroka piştî qebulkirina Îslamê, bisekinin înşaallah.



# Teşî

*Di destekî min de hirî*
*Di destê din de teşî*
*Li pişta min zarok*
*Di lingê min de gora hirî...*
*Dirêsim hirîya xwe*
*Hêdî hêdî...*
*Biz didim ba didim*
*Teşîya xwe...*
*Zirav zirav dipêçim*
*Hurik hurik dimeşim*
*Belê bi gavlê qewî...*
*Ne baran dikarê min biqefilînê*
*Ne herî dikarê min biteqinînê*
*Pişta xwe didim bê*
*Berê xwe didim xwedê*
*Û dimeşim li ser rê...*
*Rîya Seîda*
*Rîya Şehîda...*
*Hin bihin werîsê qalin çêdikim*
*Werîs û benê dirêj dihonim*
*Boyağa îxlasê lê dikim*
*Da ku her bar bi selamet*
*Bimeşê bi kerwanê heqîyê re...*
*Dema destê xwe tavêjim teşîyê*
*Mewlana tê bîra min û gera wî ya li dor heqîyê*
*Îcar teşî dibe seydayê min û dibêje:*
*"Ey însanê ğafil!*
*Min gelek şal û şepik pêçane*
*Gelek dewr û dewran dîtine*
*Pir konê kejî*
*Merş û tayîjên dirêj*
*Hem şal û bendek*
*Têr û xurcik badam e.*
*Û ez bume turikê milê şivana*
*Turê milê Mûsa û Muhammed ('eleyhimusselam)*
*Qey ti nabîne?*
*Ez gera gerdunê me*
*Ez dara benîkê û zeytûnê me*
*Û ez keda destê dayîka me...*



*Muhemmed ZANYAR*

Şehîd Hesen el Benna

# Doza Me

**Çend xususîyetên (taybetî) doza birayên misilman**
1–Dûrbûna ji minaqeşê (devjenî)
2–Ji ketina bin lepê giregiran xwe vedan
3–Xwe dûrgirtina ji hemû partî (bend) û sazîyan
4–Qîmet pêdana organîzebûnê. Derbaskirina merheleyan hêdî hêdî
5–Xebat, ser propaganda û reklamê re ye
6–Cema'eta Birayên Misilman zêde meyldarê ciwanan (xort) e.
7–Li bajar û gundan, bi lezî belavbûna fikra birayên Misilman.

**Deh wezîfeyên me**

**1–Pêvekirina nîşanên me**
**2–Parastina bawerîya xwe**
**3–Domandina wezîfeya xwe**
**4–Beşdarbûna civînên me**
**5–Qebûlkirina daweta me**
**6–Qebûlkirina şîretên me**
**7–Parastina veşarên me**
**8–Parastina şerefa xwe**
**9–Ji birayên xwe hezkirin**
**10–Domandina têkilîya xwe**

**Beşa Duyem**

**Bîat**

"Ên ku bi te re bîat kirine, bêguman wan bi Xweda re bîat kiriye. Destê Xwedê li ser destê wan e. Vêca kî (ji bîata xwe) vegere, êdî ew, bes (hew) dijberê nefsa vedigere. Kî soza ku bi xwedê re daye bîne cih, wê çaxê Xweda dê xelatek mezin bi de wan."[1]

Hemd ji wî Xwedayê ku hemû hebûn ji tuneyî afirandî re. Selat û selam, ser rêberê mutteqîyan, serdarê mucahidan û pêxemberê meyê bêxwendin û bêqelem Muhammed û ser ehlê Wî û sehabîyên Wî û ser kesên heta roja qîyametê di rêya wan de be.

Vê kitêbokê (rîsalê) ji bo kesên ku bi bilindîya doza xwe û bi pîrozîya fikra xwe bawerî anîne û ji bo birayên misilman ên mucahid pêşkêş dikim.

Belê, ez van gotinan bes ji van birayan re dibêjim. Ev kitêbok, ne hin dersên ku bêne jiberkirin, fermanên ku bêne tetbîqkirin in.

Gelî birayên dilsoz! "Bibêje. Bixebitin. Di nêz de Xweda û pêyxemberê Wî û mumin dê xebatên we bibînin. Bal zanayê xeyb û şehadetê ve, hûn ê bêne vegerandin. Ji tiştên we kirine, ew ê we haydar (xeberdar) bike."

Silav û rehmet û bereketa Xwedê li ser we be.

Gelî birayên min ên dilsoz! Ji bona bîatkirina bi me re, şertên esasî (bingehîn) ev deh (10) mijar in:
1–Hişyarbûn
2–Dilsozî
3–Xebatkirin
4–Cîhadkirin
5–Fedekarî
6–Îta'etkirin
7–Biryardarî
8–Dilsafîbûn
9–Biratî
10–Pêbawerî (amintî)


Ji Mîtînga Amedê

**Şertê yekemin:**

**Hişyar bûn**

Ji hişyarbûnê meqsed ew e ku qet'îyyen tu bizanibî fikra me Îslamîye û wekî ku me fêhm kirîye, Îslamê di bin ronahîya van bîst (20) destûrên kurt de fêhm bikî:

**BÎST DESTÛR (PRENSÎP)**

**Destûra Yekemîn: Nîzama (sazûmana) Îslamî**

Îslam! Çawa bawerîyek zexm e û 'îbadetekî ji dil e, nîzamek 'umûmî û cîhanî ye jî, ku hemû alîyên Jiyanê di xwe de dicivîn e.

Îslam, hem ummet e, hem exlaq e, hem artêş e; hem rahmet e, hem 'edalet e, hem çand e, hem qanûn e, hem 'ilm e hem hukm e; him made ye him kar e, him cîhad e, him gazîkirina heqîyê ye, him hêz e, him fikr (raman) e.

Îslam dermanek bê emsal e ku Xwedayê mezin, ew ji nimêj, rojî, exlaqê xweş û ji bona dilşadîya mirovan fîdakirina mal û can, saz kirîye, heke em, vî dermanî bi temamî bistînin (bi kar bînin), Xweda dê şîfayê bi de me. Lê em vê ji dest berdin an jî dev ji qismekî berdin, derman wê wergere mîkrobê (bibê mîkrop). Digel jehrkuj (panzehir) e jî, wê bibe jehr.

Îslam nîzamek e ku welat şert digre. Lewra dewletek welatê wê nedîyarkirî be, nikare tu tiştî bike.

Îslam nîzamek e ku hikûmetê mecbûrî dibîne. Ji bona sitirandan û dûrkirina xerabîyan, gelekê mirovan hewcedarê hêzê ne.

Îslam nîzamek exlaqî ye. Lewra dinya, bes bi exlaqê xweş, xweşîyê bibîne.

*Îslam hêz e. Lewra heq neyê parastin, batil dest bi êrîşan (hicûm) dike.*

Îslam, dînê merhemetê ye û nîzamek bi'edalet e.

Îslam 'ilm e. Cîhadê ferman dike û damezirandina (sazkirina) artêşê ferman dike.

Îslam fikr e. Lewra ji bona misilman bûnê, di bin



tehdîdan de, zorê nade tu kesî. Îslam, him qîmet dide ferd him dide civakê. Îslam terbîyekirina zordest û fesadkaran ferman dike.

**Destûra Duyemin: Quran û Sunet**

Quran a Kerîm û Suneta Pêxember Sallallahu 'aleyhi we sellem, ji bo 'elimandina hukmên Îslamê ji her misilmanî re çavkanî ye.

Quran a Kerîm bi esasên (bingehên) rêzimanê (gramer) 'Erebî, bêzehmetî û bêkulfet têye fêhmkirin. Ji bo fêhmkirina suneta pêxember li rawîyên hedîsan yên ewledar, mureca'et tê kirin.

**Destûra sêyemîn: Lezeta îmanê ya rastîn**

Di bawerîyek (îman) zexm, 'îbadetek ji dil û cîhada di rêya Xwedê de, nûr û lezzet heye. Xwedayê mezin, vê nûr û lezzetê dixe dilê bendeyên ('evd) xwe yên dixwaze. Lêbelê lazim e ku baş bête zanîn ku îlham û tiştên tên aqil û xewn, ji bona hukmên dînî nabin delîl.

**Destura Çaremîn: Bawerîyên Xurafa**

Morîya nezerê, moriya spî, niviştkarî, falbazî, stêrnasî, kahîntî, îdîakirina zanîna xeybê û weke van... Ev hemu betal in, bê hukm in. Ev tişt di Îslamê de nînin. Li hember van tekoşîn lazim e. Lêbelê ji Quran e ayetek şîfadar an jî nivişta di dîn de cihê wê heyî, ji vê yekê îstîsna ye.

**Destûra pêncemin: Raya Îmam**

1- Di mijarên derbarê wan de delîl tune be, an derbarê babatên jê re gelek îhtîmal hene, an jî derbarê meslehetê de, raya îmam û wekîlê wî têye tetbîqkirin. Bi şertê ku ne muxalifê (Dijberê) destûrek dînî be. Raya îmam li gor cih û zeman di be ku bête guhertin.

2- Di 'îbadetan de ya rast ew e ku ji hikmeta wan neyê pirsîn û weke xwe bêne tetbiqkirin. Mijar ên ne ji 'îbadetan bin, ya rast ew e ku sir û hikmetê wan bêtin 'elimandin (hînkirin) û li gor wê werin tetbîqkirin

Kesê ku ji alî cema'etek Îslamî ve bi rêberî hatîye hilbijartin (neqandin), ji bona wê cemaetê, "Îmam" tê qebulkirin. Raya îmamek holê (wisan) an jî ya wekîlê Wî, bi şertê ku ne dijê hukmên Îslamê be, tetbîqkirina wan şert e.

**Destûra şeşemîn: Pêşawerên salih (selefî salihîn)**

1- Ji xeynî pêxemberên Xwedê ku ew mesûm (bêrî) in, gotina her kesî têye qebûlkirin jî û nayê qebûlkirin jî.

2- Her tiştên ji pêşawerên salih hatine rîwayetkirin, heta ku li gorî kitêb û sunetê bin, emê qebûl bikin. Heger ne welê be, şopandina Kitêba Xwedê û Suneta Pêxemberê Wi Sallallahu 'aleyhi we sellem, hêjartir e.

Lêbelê kesên îxtîlaf dikin (wekî me nafikirin), tu mafê me nîne, em wan rexne (tenkîd) bikin. Emê wan dev nîyeta wan ve berdin.

**Destûra <u>H</u>eftemîn: Şopandina Îmamekî**

Misilmanên ku negihabin dereceya zanîna delîlên hukmê meseleyên teferrûat, lazim e ku bide pey îmamê mezhebekî. Digel vê jî heger taqeta wî bigihîyê ji bona delîlên imamê mezhebê xwe hînbibe, bixebite, ev tiştekî baş e.

Her şîreta ku bi delîla rast têye kirin, qebûlkirina wê baş e. Bes ku bizanbe şîretvan rast û ehîl e. Da ku çiqas zanabe jî, kêmasîyên xwe temam bike. Û bigihîşe mertebeya (paye) lêkolînê.

**Destûra <u>H</u>eştemin: Îxtîlafên Fiqhî**

Di meseleyên teferûat de îxtîlafên Fiqhî, lazim e nebin sedemên neyartî û firqetê. Lewra ji her muctehîdî re mukafat heye.

Bi armanca hînbuna eslê meseleyê, ji bo lêkolina 'ilmî, di behskirina mijarên îxtîlafî de, tu asteng nînin. Bes ber teasûbî û riyakarîyê ve nebe. Îxtîlafên navbeyna mezheban de, ne di warê hukmên esasî de ne.

**Destûra Nehemin: Meseleyên bêfeyde**

Ev meseleyan di dîn de hatine qedexekirin:

1- Lêkolîna meseleyên bêfeyde

2- Li ser tiştên tu car dê nebin (neqewimin). Ji bo derxistina hukmekî cehdkirin

3- Ji Qur'an'a Kerîm derxistina mijarên ku 'ilm hê negihaştîyê, cehdkirin.

4- Sihabîyên Hz. Pêxember, hin ji hinan faziletdartir bêne girtin.

5- Tehlîlkirina îxtîlafên navbeyna wan (sehabîyan) û weke van, derbarê îxtîlafên navbeyna sehabîyên kîram de em biaxifin, pêşberê yekî ji wan em zimandirêJiyan bikin, ev tiştekî ne di cihê xwe de ye.

**Destûra Dehemin: Bawerîya herî girîng (muhîm)**

Ji bawerîyên Îslamê a herî girîng, naskirina Xwedayê mezin e û qebûlkirina yêkîtî û bêkêmasîya Wî ye.

Ayet û hedîsên muteşabîh (ma'na wan veşartî), çawa bin, lazim e wisan em bi wan bawerî bînin û nedin pey îxtîlafên ku 'aliman derbarê wan de kirine. Tiştên ji bo Pêxemberê Xwedê û sehabîyên Wî caîz in, ji me re jî caiz in. Mijarên ku wan behs nekiribe tu heqê me nîne em behs bikin. Xwedayê, mezin wisa ferman kiriyê:

**"Kesên ku di 'ilm de kûr bûne dibêjin: 'Me bi Qur'anê bawerî anî. Hemû (ayetan) ji cem (bal) Wî ne."[23]**

(Înşaallah wê berdewam bike...)

**(Wergêr: Yusuf Azadî)**

M. Mahmud Kılıç



# Çûna Ba Helîme (Şîrdana wî)

Heçîka pêxemberê ku qasidê Xweda ne, jiyana wan, zaroktîya wan, xortanî û navendîya jiyana wan ji yên hemsalê wan ferqtirin. Teqdîra Xweda qasidê wî ji biçukanîya xwe de dinava jînek zor de mezin dibe.

Belê, pêxemberê dawya zeman berya were dinyê bi çar heyva bavê xwe 'Ebdullah wunda kiriye. Bavê wî di nabêna Mekke û Şamê de bazirganî dikir. Berya Muhemmed were dinyê bi çar heyva malê ticaretê ji Mekkê dibe Şamê. Malê xwe difroşe û vedgere. Jiber Medîne li ser riya wî bu û xalanê wî li wêrê bun, dadigere cem xalanê xwe zarê Neccar. Çend roja li ba wan bi mêvantî dimêne, teqdîra îlahî nexweş dikeve û dimre. Xalanê wî li wêrê li ser gelîyekî bilind meytê wî vedşêrin. Piştî mirina wî bi çar heyva Muhemmed yetîm diwelide. Resulê Xweda dema çêdibe sê rojê ewil carîya "Ebu leheb" "Suweybe Xatun" wî şîr dide. Ji xwe "Suweybe Xatun" berya wî apê wî Hemza û Ebu Seleme jî şîr dabu. Ji ber vê yekê Hz. Muhemmed(s), Hemza û Ebu Seleme birayê hevî şîr bun.

Di nav bajarê Mekkê de 'adetek hebu, zarokên nû çêbune didane pîrekê murebî (diyê şîr). Ev 'adet di malê eşrafa de bêtir dihate bikaranîn. Helbet hinek sebeb û hîkmetê vî 'adetî hebun. Hun hez dikin emê ji vana hineka di vê nivîsa xwe de rêz bikin:

1— Li cezîra 'Erebîstan nexweşîyê zarokayî têger hebu. Li 'Erebîstanê gelek zarokê biçuk bi van nexweşîya dimirin, yan jî Kullek dibun. Jibo zarokê xwe ji van taluka bistirînin eşraf û dewlemendê Mekkê zarokê xwe yê nû çêbuyî bi armanca ji vê metirsiyê bistirînin dişandin cem pîrekê murebbîyî li çolê dijinîn.

2— Bê guman ev 'adetek bu di Mekkê de û rehê vê adetê pir ji kevn de hebu û di dema Muhemmed welidî hê jî dewam dikir. Çungî zarokê biçukanî diçun ba diyê şîr, li çolê bi tebî'etê re seranser di-

man; his û ramanê wan bêtir bi pêş da diçu, bi gihaştina ruhekî azad mezin dibun. Dîgel geşbuna zarokî ya fîzîkî, wucuda wan jî ji nexweşîya azad dibu.

3— Jîna gunda nexasim yan koçera nêztirî tebî'etê xîlqeta însan, nexasim nêztirî yan sebîyê biçuke. Lewra bermayê pîşesazîya bajara li ser zarokê biçuk û nû çêbuyî tesîreke neqenc çêdike. Xeml û xêza jîna wanî tabi'î û sîstema wanî ruhî, yan civakî xira dike; wan ji tebî'etê bi dûr dike. Li miqabil vêna jiyana gunda yan çola zarê biçuk di himêza tebî'etê de mezin dike, hewak bêbermayî bi wan dide helmijandin. Tekamulê bi vî rengî dîgel parelelî heqîqetê yî jî di mezinkirina zaroka de gelek tesîr dike. Di jîna çolê de, di yan gunda de gelek zorî û zehmetî hene. Zarokê dinava van zorîya de mezin dibin di pêşerojê de dema bi zorî û zehmetîya re seranser dimînin muqawemet gelek xurt rê didin. Nuha vêgavê jî gelek petagogê zanîstî 'esra me jî dibêjin lazime derguşa zarokayî ewil çol û tebî'et be. Çungî zanîstîya ewil li ser jiyana însanî pêşerojê gelek tesîra wê heye.

4— Pirekê eşraf û dewlendê Mekkê û yên 'Erebîstanê zarokê xwe ye nû çêbuyî şîr nedidan. Çungî nerîn û xweyîkirina zarê biçuk hem zor û zehmet û hem jî xebat jê ra divêt. Ji ber vê yekê li miqabil heqekî ev xizmet bi pîrekê murebbî didane kirin. Bi vî awayî pîrekê eşrafa xwe bi temamî texsîsî zilamê xwe dikirin. Bi rastî ev 'adet di çaxa me da jî li bajara di malê seglaw û eşrafa de tê dîtin. Jinê vana jî bi wasita pîrekê berdest paqijî, şîrdan û xweyîkirina zarokê xwe yê biçuk didin kirin.

5— Bi teybetî di cezîra 'Erebîstanê de xwendin û nîvîsadin hindik bu, hema hema tunebu. Dîgel vî qasî xeberdana xweşik, şê'r û edebyat li ba tevê 'Ereba meziyetek hêja û mezin dihate qebul kirin. Çungî di wê dewrê de qedr û qîymetê însana bi belağat û xîtabetê dihate pîvan. Kanîya xîtabet û beleğetê jî şê'r û edebyat bu. Hozan, edîb û xetîbê zana û jêhatî bi teybetî ji nava bedewîya yanî 'Erebê li çolê dijinîn, derdiketin. Çungî 'Erebîya li çolê dihate şiteğilandin; 'Erebîyek saf, sade û zelal bu. Gelê 'Ereb jibo zarokê wan bi zanistîya ziman û edebyatê mezin bibin û bi girbunek munasib bighêjin, dişandin ba diyê şîrî çolê.

Di vê derheqê de rojekê Hz. Ebu Bekr dibêje: *"Ya Resulellah! Dinava me de kesekî weke te bi zimanekî fesîh diştеğile me nedîtiye? Resulullah (s) dibêje wî:* ***"Ey Eba Bekr! Çima ezê fesîh neşteğilim? Ez ji qebîla Qureyşîya me, û min li ba qebîla Benu Sa'd şîr xwariye."***

Resulê Xweda (s) sala hate dinyê ji qebîla "Benu Sa'd" pîrekek bi navê Helîme û hinek hevalê xwe jî diçine Mekkê li zarokê nû çêbuyî digerin da ku wan bibne ba xwe şîr bidin. Pîrekê murebbî ev kar li hember xilatekî ku xwedyê zaroka bida wan dikirin. Hevalê Helîme her yek ji xwe re zarokekî dibîne, Helîme jî Muhemmed digre û dibe. Erda qebîla "Benu Sa'd" pir ji zûde baran lê nehatibu barîn, gîha şînn nedibu, pez û dewar ji şîr qut bubun. Feqet bi çuna "Muhemmed ê Kurê 'Ebdillah" Xweda Rehm û bereket bi ser erda qebîla "Benu Sa'd" de anî. Baran barand, mêrg û çayir şîn hatin guhanê pez û dewara tijî şîr bun.

Muhemmed çar sala li ba "Helîma keça Zu'ayb" şîr duxwe mezin dibe, diqebile, gir dibe û gelek ders û zanîn ji jîna koçera, ji çêrandina pez û ji tebî'etê digre. Piştî ku 'emrê wî dibe çar sal Helîme wî dibe Mekkê teslîmî diya wî "Amîne" dike.

Hz. Muhemmed (s) li Mekkê du sala li ba diya xwe Amîne dimîne. Rojekê jibo çuna Medînê diya wî xwe kar dike û ew, diya wî û carîya wanî bi navê "Bereke" (Ummu Eymen) her sê bi du deva diçine Medînê cem xalanê bavê xwe "Zarê Neccar." Ji bil zîyaretê yek ji armanca vê seferê jî Amîne dixwest gora bavê wî 'Ebdullah pêş kurê xwe bike. Mişwarekî li ba zarê Neccar bi mêvantî dimînin û vedgerin. Bes çend qonaxa ji Medînê bi dûr dikevin dighêjin nehyak bi navê "Ebwa." Li vê rê Amîne nexweş dikeve, û teqdîra îlahî li "Ebwa" yê Amîne wefat dike. Bi alîkarîya xelqê gundî li Ebwayê wê vedşêrin. Hz. Muhemmed (s) bi kêf hatibu Medînê lêbelê bi dilekî şikestî vedgerîya Medînê. Yetîm hatibu îdî sêwî û yetîm vê vegerîya Mekkê. Salê zaroktîyê salên şefqet, merhemet û dilovanîya dê û bavayî li ser zarokê wanî biçukin, lê belê Rebbê 'izzetê "Muhemmedê kurê Ebdullah" ji vêna mehrum kir. Belkî jî Rebbê wî nedixwest qasidê xwe ye pêşerojê di bin terbîya însana de mezin bike. Dixwest qasidê xwe di bin terbîya xwe de mezin bike. Dixwest wî, dinava şertê heyatê yî zor û zehmet de bighîne da ku dikaribe di bin zor û zehmetîyê pêşerojê de rabe. Da ku dema derîyê ceng û cîhadê li put û putperesta vekra jê ra negotana ev tiştana dê û bavê te pêş te kirine.

Hz. Muhemmed (s) mişwarekî li ser gora diya xwe runişt girîya, dilê wî şewitî. Pişt re "Bereke" wî li ser devê li ber xwe danî û bire Mekkê teslîmî kalê wî 'Ebdulmuttelib kir. Kalê wî jê hez dikir û weke kurê xwe şefqet û merhemet rê didayê. Hindikba jî Muhemmed li ba kalê xwe di atmosfera hezkirin û xweşîyê de mezin dibu. Bes Xwedayê te'ala di heşt salîya wî de ev extîyarê dilsoj jî jê sitend. Belê Muhemmed carekî di tenê mabu. Carekî di bi mirina kalê xwe mehzun bubu û bi şertê jiyanê yî zor û zehmet re seranser mabu.

Hz. Muhemmed piştî mirina kalê xwe 'emrê wî heşt sale diçe ba apê xwe "Ebu Talib" Îdî nêzî 42 sala di bin hîmaya apê xwe de dimîne...

| | | | |
|---|---|---|---|
| **Têger** | : Bulaşici | **Bêbermayî** | : Katiksiz |
| **Bazirganî** | : Ticaret | **Seranser** | : Karşi karşiya |
| **Metirsî** | : Tehlîke, korku | **Zanîst** | : Bilim, ilim |
| **Berma** | : Atik | **Hozan** | : Ozan, aşik, |
| **Pişesazî** | : Endustiriyel | **Taybet** | : Özel olarak |

Molla Xalid Bağdu



# Hinek Wesfên Hezret-î Fatima

**Bismîhî Subhanehû,**

Di nivîsa xweyî bori de, em li ser numûne û mînakbuna Hezret-î Fatima sekinîn. İcar emê li hinek wesfên Hezret-î Fatima binêrin û xwe ligor vî exlaqê bilind rast bikin...

## Hezret-î Fatima 'abid bu...

Hesenê Basrî gotîye ku; ***"Di nav ummetê de kesi ku ji Fatima zehftir 'îbadet dikir tune ye. Wisa 'îbadet dikir ku heta pîyê wê, ji şipîyabuna ser limejê diwerimî."***

## Hezret-î Fatima comerd û mêhvanperwer bu...

Fatimatuz Zehra çewa ku, xwedî 'îlm û zanebunek zêde û ehlê îman û 'îbadetek zêde bu; wisa jî xwedî comerdîyek û daneka zêde bu. Ji mêhvana pir hez dikir û dixwest ku daîm mêhvan werine mala wê; lewra zanibu ku mêhvan bi rizqê xwe tê û bi 'efûkirina gunehê ehlê malê jî diçin. Ti zemanî 'acîzî ji wan ne dikir, îkram û mêhvandarîyeka qenc dikir. Pir delîl û rîwayet di heqê mêhvandarî û fedekarîyên wê de hatîne.

## Hezret-î Fatima keçeke dilşewat û micahide bu...

Fatimatuz Zehra ewladeka salih, dilovan û dilşewat bu. Li dê û bavê xwe pir îkram dikir, hurmet dida wan, bi ber wan diket û ti zemanî, ji piçukayîya xwe heta wefata wan, dilê wan ne êşandîye. Piştî mirina dîya xwe, ewê xwedîtî li ronîya çava dikir, bi ber diket, li ser diqewimand. Wextê ku muşrikê Mekke ê, Hezret-î Resulullah (silavên Xweda lê bin) dêşandin u heqaret lê dikirin, ew dibu piştok û destegîr ji bavê xwe ra, dest û ruyê wî dişuşt û nifira li neyarê wî dikir. Hetta rojekî Resulê Ekrem ('aleyhîsselatu wesselam) li Mescîd-ul Heramê limêj dikir. Hinek muşrîkê Mekkê lê meyzandin û henekê xwe pê dikirin. Di vê navê de mel'unê 'Uqbê kurê Ebî Muayt, hur u rêvîkê deveka mirarî rahiştê û bir avête ser pişta ronîya çava ('aleyhîsselatu wesselam) Piştî vê heqaretê, ew û hevalê xwe bi menzerê kenîyan û henekê xwe bi resulê Xweda kirin. Fatimatuz Zehra li wir bu. Lê belê hê zaruk bu. Baz da, ew tiştê ku avêtin ser pişta bavê wê paqij kir û wê pîsîtîyê avêt ser û çavê wan muşrîka. Piştî ku resulê

Xweda limêja xwe qedand destê xwe vekir û wiha du'a kir: **"Ya rebbî! Ez van bê ôla hewalê te dikim. Ya rebbî! Ez Qureyşê li hevîya te dihêlim"** Belê, Fatimatuz Zehra keçikekî dilovan dilşewat û mucahîde bu. Ji xizmeta îslamê û Quranê paş ne dima, xebat û cehda wê jiboy bilindaîya ala Muhemmedî bu. Bê tirs û fedakâr bu.

## Hezret-î Fatima nimuna pîreka bu...

Fatimatuz Zehra piştî ku bi kûrê apê xwe 'Elîyê Heyder re zewicî, îdî bubu jina mala xwe, u kebanîya zilamê xwe. Ew di jinantîyê de jî, mîsal û numuneye ji boy temamê hermeta. Lewra ti zemanî dilê malxweyê xwe neşkinandîye, li ber ranebuye û bi devê wî ne girtîye. Daîm bi ruweki biken, lênenihêrtîye, ji bin emrê wî derneketîye. Digel ku qiza fexrê kaînat bu jî, digel ku hedîye u xelata rabbê 'alemê bu li jinen cîhane. Digel ku nesla pîroz, jê bu, dîsa ew hermeta mala xwe bu, jina malxweyê xwe bu û îta'etkareka nerm bu. Hurmet dida zilamê xwe wextê bihata mal ji ber radibu pîya, pesnê wî dida, dilê wî xweş dikir, ğemê wî direvand. İmam 'Elî wiha gotîye **"Piştî westandin û çun û hatineka zêde ku ez dihatim malê û min li Fatima dimeyzand, temamê ğem û westandinê min, ji min diçun."** (Menakib-î Harezmî, s. 256)

Bê izna mêrê xwe ji mal dernedket, ti zemanî wî 'aciz nedikir û nediqehirand. Lewra ewê zanibu ku bavê wê ('aleyhîsselatu wesselam) wiha kerem kirîye: **"Xwedayê te'alâ rojî û limêja pîreka ku dilê mêrê xwe ji xwe dihêle û wî 'aciz dike heta ku wî kefxweş neke û liber dilê wî nede û wî ji xwe razî neke qebul nake."** (Vafî, kîtab-i nîkah, s. 114) İmam 'Elî wiha gotîye: **"Fatima ti zemanî min 'aciz ne kirîye."** (Menakib-î Harezmî, s. 256) Birastî ev gotina İmam 'Elî her tiştî îsbat dike. Çawa ku îkram li aqrubayê xwe dikir û hurmet dida wan, bêkêmasî îkram li akruba ê mêrê xwe jî dikir û hurmet dida wan.

## Hezret-î Fatima dayikek dilovan û dilşewat bu...

Fatimatuz Zehra digel ku kebanî û jinek qenc û baş bu, bi wî rengî dayîkek dilovan û dilşewat bu. Digel hemla wêy ku ji berê çu, pênc heb zarukê wê hebun. Terbîya ku ji bavê xwe sitandibu dida zarokê xwe. Dersa wanî Quranê dida li ser muzakerê û jiberkirinê disekinî hê bi piçukayî wan hînî limej û îbadetê dikir. Ti zemanî dev ji wan bernedida û li ser bicîanîna 'îbadetê pir disekinî. Bi wan re lîstika dilîst, şîretê qenc li wan dikir, mêranî û fedekarîyê bi wan dida naskirin, ji boy parastina heq u heqîqetê û 'îbadeta Xweda, wan amade dikir.

Ti zemanî ji zarukê xwe ne di qehirî, dengê xwe li wan bilind nedikir. Jixwe nifir û la'net ne dikete bîra wê.

**İmam 'Elî wiha gotîye "Piştî westandin û çun û hatineka zêde ku ez dihatim malê û min li Fatima dimeyzand, temamê ğem û westandinê min, ji min diçun." (Menakib-î Harezmî, s. 256)**

Lewra ev herdu ne exlaqê însanane, bê wê çewa bibin exlaqê pîrekê musluman. Wan bi xwe ra radikir şevlimêja û 'îbadetê nafîle bi wan dida hezkirin. Ferqî û meylî nedixist nava wan, ne dihişt ku yek ji êdin hesudîyê bike. Ji xwe seyyîdê şuheda a Huseynê Kerbela ê qey ne berxê wêye. Bi rastî ev bi tenê jî 'elametê ku çi dayîkeka pîroz u dilovan bu di dayikîyê de.

Bi rastî wesf û ewsafê Fatimatuz Zehra di ewladtî, jinantî, dayîktî u mu'mîntîyê de pirin. Di dîroka îslamê de gelek pesnê wê hatîye dayîn. Qedr û qiymetê wê zêdene, rîwayetê ku di behsa wê de hatine di kîtêb û pirtukê însanê berê de pir hatine nivîsandin. Emê vê mijarê, hewalê wan kîtêb û pirtuka bikin. Û nivîsandina xwe bi rîwayetek dilşewat biqedînîn. Lewra fexrê kaînat çewa ku wefat kir, keça wî pîroz û nazenîn jî piştî wî bi çend meha wefat kir. Bavê wê ('aleyhîsselatu wesselam) vê mîzgînîyê dayê bu.

Belê resulê Xweda nexweş bu û çiqa diçu nexweşîna wî giran dibu. Rojekî pêxemberê Xweda('aleyhîsselatu wesselam) ji giranîya nexweşîya xwe ketibu nava cîya, wefat nêzîk bubu. Fatimatuz Zehra li ser bavê xwe digirîya û sitêrka dipaland. Bavê wê ('aleyhîsselatu wesselam) çavê xwe vekir û lê meyzand îşaret kir ku nêzî wî bive, ewê jî guhê xwe bir ber devê wî. Resulê Xweda tiştek jêra got, girîyê wê zêde bu. Di dûre disa îşaret kirê disa tiştek jê re gote. Vê neqlê vebişîrî û kenîya. İnsanê ku vê menzerê dîtin meraq kirin û pirsîn wiha cewab da wan. "Neqla pêşî ji min re go: "Ezê bimrim." Ji ber vê ez girîyam. Neqla diduwa ji min re go "Di pey min ra ê ewwil ku were ba min tuye, ji ber vê ez vebişirîm" û wisa jî çêbu.

Xweda, meşandina rê û exlaqê Hezret-î Fatima, nesîbê hemu keç û xwuşk û jin û dayik û pîrekên me bike... Amîn.






Jin û Jiyan

Yasemîn Kılıç

# Nuxumandin

Bi navê Xweda yê Rehman û Rehîm.

**"... Ji pîrekê mumin re bibêje; bera çavê xwe ji heram bizîvirînin û irzê xwe jî muhafeze bikin. Ji bil ewanê ku tê dîtin, bera xeml û xêza xwe li pêş çava ranexin. Şerpê xwe bera bi ser beјna xwe de berdin..."**

Çiqas hemd û pesindanê xweşik hene ji Rebbê Settar re be. Selat û selam li ser pêşîvanê mezluma, hamîyê mustez'efa, Muhemmed Mustafa (s) be. Û Rehm û bereketa Rebbê Settar li ser we xuşk û diyên Musluman be.

Ji roja daketiye heta îro û hetanî roja qîyametê, ji Quranê qenctir û jê çêtir reçete jibona se'adeta însana bikarbîne tune ye. Ew kelama Rebbê zulcelal, kanîya xilasîya herman û bêmanê û werîsê rehmêyî ku Xweda ji insane re berjêrî erdê kiriye. Ji ber vê yekê çiqas 'esr bi pêş da here xezînê Quranê yî giranbiha, hê bêtir însana dewlemend dike, riya herî rast bi berwan dixe.

Qur'ana pîroz aqlê kaînatê ye. Xweda jibo rêşanî 'îbadê xwe yê mihtac bide ew şandîye. Çi dema însan bibe xerîbê wê îstîqrara kaînatê jî wê li binguhê hev keve. Ji ber vê yekê divê ku jin û mêrê Musluman, jîna xwe li gor şîretê wê rast bikin.

Xweda gelek qîymet daye jina. Cenneta mêra xistiye bin lingê wan. Her wekî Resulê Xweda dibêje: **"Cenneta ewlada di bin lingê diya de ye."**

Feqet bi îslamê jin gihaştine zanava xwe ya eslî. Çungî di demê berê de weke malekî bêqîymet dihatine kirîn û firotin, mafê ji mêra re hebun jibona wan qet tunebun. Heta li gelek cîha di heqê ku "jin jî însane yan ne insane" gengeşî dihatne kirin. Bes bi hatina pêxemberê îslamê pîrek jî weke mêra gihaştin mafê xwe. Jibo 'izzeta xwe muhafeze bikin Xweda û resulê wî gelek tiştê qenc û giranbiha xilatî wan kirîye. Bêguman yek ji van xilatê Xweda jî sitara wê; yanî nuxumandina pîrekê ye.

Jixwe nuxumandina pîrekê bi çêkirina însan destpêkiriye. Di tevê dînê semawî de nuxumandina pîrekê weke rojî û nimêjê li ser jina ferz e. Çungî hissê nuxumandinê tevlî fitretê pîrekê bûye; û ev hiss bi edep, heya, namus û fedyê hatiye xemilandin.

"...
**Ji pîrekê mumin re bibêje; bera çavê xwe ji heram bizîvirînin û irzê xwe jî muhafeze bikin.**

**Ji bil ewanê ku tê dîtin, bera xeml û xêza xwe li pêş çava ranexin. Şerpê xwe bera bi ser bejna xwe de berdin..."**

**"Ey zarê Adem! Me cilnî ku tiştê we yê neqenc veşêre û xweşikbunê bide we ji we re daxistîye. Û heger hun bi cilê teqwê xwe veşêrin û xwe binuxumînin ev jibona we hê bi xêrtir e."**

Gelek tişt jibo bibe şî'ar û nîşan Xweda şandiye ji civaka insane re. Weke: nimêj, azan, mizgeft, Girikê Sefa, Girikê Merwe, 'Erefe, Qurban û Muzdelîfe. Nuxumandina pîreka jî di vê mijarê de ayet û nîşaneke ku bawerîya bi Xweda temsîl dike.

Bêguman nuxumandin nîşanê terbîye û tirsa Xweda di şexsê pîrekê de dide xuyanî. Bi vêna re pîrek bi nuxumandina xwe şukrê 'ebdîtiya xwe ji Rebbê xwe re eda dike. Ji bikaranîna nuxumandinê bi serê xwe tesdîqa sedeqeta îmanê, û 'elametê îslamê yî herî qewî ye. Ji vê hêlê de divê ku tevê jin û keçê Musluman li vî 'elametê giranbiha xwedî derkevin û bi şerpa xwe, bi çarşefa xwe dengê îslamê di şexsê xwede bilind bikin. Nexasim ji Qurana pîroz "Suretê Nûr" buxwînin, bidne xwendin û ji xwe re bikne bingeh...

Rojekê sehabak dibê je: "Ya Resulellah! Ehlê Xweda kijanin? Resulê Xweda dibêje wî û di şexsê wî de dibêje me teva **"Ehlê Xweda yî heqîqî dema meriv wan dibîne Xweda tê bîra meriv."** Gelo ew xuşk u diyê me dema çarşefa xwe li xwe dikin û bi rêda dimeşin Xweda tînin bîra çiqas însan hun dizanin?

Ustad Bedî'uzzeman dibêje **"Çarşefa pîreka Musluman, kelha wê ye, sîpera wê ye ji herî sîpera qewîtir e."** Bi rastî pîrekê nekevne hundir vê kelhê wê bi talukê dujmin re seranser bimînin, û di encamê de wê zirara xwe ji dujmin bibînin. Çawa îro jibona benîştekî bi wereqekî pîrek têne tazî kirin di reqlemê televîzyonê de têne leystandin û weke destmala kaxizî ku meriv carekî destê xwe pê paqij dike û davêje çopê, ew jî wuha têne bikaranîn. Qey pîrek hevqas erzan û bê qiymetin? Nexêr! Ji ber ku ew ji hundir kelha xwe derketiye, ji her hêlê de bi êrîşê xayin û bêolan seranser maye. Bawer bin çi roja ku têkeve vê kelhê kesek nikare bi serde here, û dujmin wê dîsa jê hesaba bike. Çungî heybet û tirsa nuxumandinê heye. Heya u edeba pîrekê, 'îzzeta wê, namus û rumeta wê, hissê wê yî şefqetê, nîşanê wê yî bawerîya bi rastî; belê ev gelek tiştê weke vana ku nayêne ser zimanê di hundir çarşefa pîrekê de veşartîne. Çi dema ku pîrek dest bavêje vê sitara xwe, wucuda xwe weke Quranê emir kirîye binuxumîne; wê vî malê xwe ye giranbiha ku wunda bubu bibîne. Wê însanbuna xwe, dayikbuna xwe, qedr û qîymetê xwe yî li ba Rebbê xwe ji nu ve nas bike.

Çarşef, yan şerpe, bi kinnayî nuxumandin yan jî sitara pîrekê; bêguman ayetek ji ayetê Xwedayi ku pîrek di şexsê xwe de li pêş çava radixe. Ji vê hêlê de nuxumandin bi serê xwe teblîğeke. Û bi nuxumandinê xuşk û diyên me her lehzê teblîğê li civaka di navde dijîne dike.

Di encamê de meriv dikare bibêje nuxumandin yanî lîbasê azayê canê pîrekê vedşêre, nîşan û 'elemetên îslamê ne; nenuxmandin yanî tazîbun jî herba bi wehyê re, herba li hember heqîqetê îslamê ye. Çungî her timtêl û qîyafetek nîşan û e'lametê zanavekê ye. Her zanavek jî î'lana dînekî ye.

Sermîyanê şeytan û hevalê wî pîrek, tazîbun, fuhuş, û dilbijandin e. Heger em duxwazin şeytan bixesire, werin li gorî emrê Xweda û resulê wî em xwe binuxumînin; û derîyê herb û cengê li şeytan û hevalê wî vekin...

| | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|
| **Zanav** | **: Nasnav (Kimlik)** | **Jîn** | **: Heyat** | **Civak** | **: Xelq ( toplum)** |
| **Xeml û xêz** | **: Süs** | **Maf** | **: Heq (Hak)** | **Bêol** | **: Kesê bêdîn ( Dinsiz)** |
| **Herman** | **: Axret, dinya wîyalî** | **Gengeşî** | **: Xiricir ( Tartişma)** | **Encam** | **: Di dawî de ( sonuç- sonuçta)** |
| **Bêman** | **: Dinya** | **Giranbiha** | **: Pirî biha ( pahabiçilmez)** | **Timtêl** | **: Qîyafet, cikê jin li xwe diki** |

Ömer Faruk Sîpkanî



Ji mîtînga Batmanê

# Ey Xweha Misilman!

## Nuxumandina Te Wek Stirîyeka Di Çavê Kafira De Ye

*"(Ey Muhammed!) Ji pîrekê mumin re bêje: **"Bira çavê xwe ne berdine heramîyê, namusa xwe bistirînin, tiştê ku ji ber xwe tê xwiya ne tê de bira xemlê xwe ne derxine holê. Bira dolbendê xwe bi şiklê ku binuxumîne berdine ser berstûyê xwe. Xemlê xwe ji ğeyrî mêrê xwe yan bavê xwe yan kurê xwe yan kur hilyê xwe yan birazîyê xwe yan xwerzîyê xwe yan pîrekê misilman yan ev zilamê ku nemêrin û li ber destê wane yan jî zarokê ku hê ciyê pîrekayî 'eyb nasnake nîşan nedin. Xemle xweyî ku veşartîne ji bo ku werê zanîn bira pîyê xwe li 'erde nexin. Gelî Mumina! Tev bihev re tobe bikin, hevî heye ku hun bighine xilasîyê."***[1]

Behsa Îslamê dibabeta heqê pîreka da, bi xulkîyeta însanîyetê destpêkirîye. Lewra Xweda ê Te'ala di serê suretê Nîsa de wiha dibêje: ***"Gelî însana! Ji Wî Rebbê xweyî ku hun ji nefsekê çêkirî û ji wî jî pîreka wî çêkirî pişt re jî ji wan gelek kur û keç afirandî û belavkirî bitirsin û xwe jê biparêzin..."***[2]

Di dewrê cahilîyê û di komelên cahilîyê de heta di temamê cihanê de zilm û serdestîya li ser pîreka bê hedd û hisab bû. Pîreka ji însana ne dihesibandin. Ti mafekî ne didanê. Heta hinek komel di însanîyeta pîrekê de bi guman bûn.

Ligor hinek bawerîyê Hinduya, wextê ku yekî pirs bikira bi gota: "Ma pîrek çiyê?" ti bersiveke wanî ku ji vê pirse re bidin tinebu. De ka bawerîyeka wiha ewê çawa maf û dadê/huqûkê pîrekê bidê? Di komela Hinduyan de heta 'esra 17a wextê ku mêrê pîrekê dimir, pîreka wî jî pê re dişewitandin û xwelîya wê beladikirin.

Di komela cahilî de jî pîrek tim bindest maye. Ev halê pîrekêyî wiha halekî şermezarî bû. Bi çavê însana li pîrekê ne dirêhtin. Weka firaxekî dikirîn û difrotin. Heta wextê ku qîzikek ji wan re çêdibû şerm dikirin û bi zindî ew qîz dixistin mezel. Quran a pîroz vî halê wan wiha teswîr dike:

***"Yek ji wan dema ku mizgînîya zaroka keçik jêr hat, ruyê wî bi carkê ra ji qehra reş dibe. Ji ber xerabîya vê mizgînîyê xwe ji civata diveşêrê, (difikirê) ka wê serê xwe tewênê û keçikê sağ hêlê yan ewê wê têxe bin 'erdê. Binêr! Hikmê ku didin çiqas xirab e."***[3]

Li gorî wan, hebuna pîrekê ji bo zewqa zilam bû. Bi vî şiklî li pirekê dirêhtin. Li Babîlê li gorî qanunê Hammurabî, pîrek di sinifa heywana de dihat hesiban-

din. Ji ber vê ti maf û rumet jê re tune bû. Heta zilamê pîrekê, wextê ku xisarek bi da hineka, di berdela wê xisarê de pîreka xwe dida.

Di medenîyeta Yunan û Romayê de jî halê pîrekê ji van medenîyet û komelên din ne dûr bû. Çiqas di van medenîyetê mezin de hinek maf dabinê jî, ev ne ji ber ku ji kula wê ketibun. Ev maf jî ji bu ku zewqa xwe pê bikin û jê îstîfade bikin dabûnê.

Lêbelê di Îslamê de, di 'ubudîyeta Xweda ê Te'ala de pîrek û zilam wek hevin. Di 'esil û fitrata xwe de di navbera wan de ti ferqî tuneye. Ferqa di nava wan de; di huner û wazîfê yê wan de ye. Îslam pîrekê ji avzêlaya cahilîyê xelaskirîye û wê pîroz kirîye. Ew rumeta xweyî ku winda kiribû bi mal û malbatîyê dîsa dayê. Cî û rumeta wê di nav komelê de bilind kirîye. Heta bi wî şeklê ku Resulullah aleyhissalat û wesselam di heqqê wan de gotîye: ***"Cennet dibin pîyê dîyan de ye**."*

Fikrê Ewrupaî û ê ku wan 'ecibandine, di heqqê Îslamê de dibêjin: "İslam ti azadîyek ne daye pîrekê, di dadê (huquqê) Îslamê de ê ku maf û dadê pîrêkê bi tevayî di xwe de bicivîne tune ye." Kafira bi van fikrê xweyî batil hiş û eqlê pîrekê Misilman tewlîhevkin û wan têxine destê xwe. Lewra zanin ku hetta Quran a Pîroz di destê pîrekê Misilman de be nikarin wan têxine destê xwe. Piştî ku bi van fikrê xweyî batil dema pîreka Misilman xistine destê xwe, ewê mala wê jî têxine destê xwe. Zanin ku ê dinav malê de bi terbîya zaroka re mijul dibe pîrek e, dê ye. Bivî rengî ku pîrek xistine destê xwe, ev pîreka ku kete destê wan; dinav mala xwe de, ji dêlva ku perwerdeyîya Îslamî bide zaryê xwe, ewê perwerdeyîya Ewrupaî bide wan. Bi vî awayî pîreka Misilman ewê nîzama Îslamî yî ku di dilê wê de şax dabû, ê bavêje û ewê bibe neyarê Îslamê, wextê ku dayîk bu neyarê Îslamê ewê mala xwe jî bike neyarê Îslamê, gava ku mala wê jî bu neyar, jiber kû komel ji mal û malbata têne holê, ewê komeleka xeyrî Îslamî û neyarê Îslamê derkeve holê.

Kafira bi navê azadîya pîrekê wê kirin neyar ji dînê wê re û ji Îslamê re. Lêbelê ya ji vê hê dijwartir ewe ku dinava herêma Îslamê de û dinava Misilmana de komel û partîyê ku bi navê mafê gelê Kurd (!) derketine ji bo ku pîrekê misilmanê Kurd ji dînê wê veqetînin bi tevê hêza xwe dixebitin. Pîrekê misilmanê Kurd bi xapa anîne halekî wisa ku beje: **"Em jinin, ne namusa kesî ne"**, **"Namusa me azadîye."** Bi çend gotinê xemilandî pîrekê Misilmanê Kurd di xapînin û wan dixine xizmeta kafira.

Laîkê Kurda dixwazin pîrekê gelê Kurd ji dînê wê veqetînin û bikin **"zerduşt."** Dibên paşketina gelê Kurd bi sedem ku Misilmanin. Ev laîk bi vî şeklî pîreka dibin çerxa cehaletê. Lê ew ji dewra cehaletê xiraptir xwina wê dimijin û wê di perçiqînin.

Pîrekê ku jîna Xweda ê Te'ala ji wan re 'ecibandîye na'ecibînin di bin çerxa xwinmija de di perçiqin. Ji wî qedr û qiymetê ku Îslamê daye wan mehrum dimînin. Ji ber vê yekê ew pîrekê ku dibin çerxa wan de diacikin wextê ku dibêjin **"Em jinin ne namusa kesine"** pir rehetin. Lêbelê ji van sloganê wanî xayrî Îslamî re di nav gelê Kurd û pîrekê Kurd de ti rumet nîne. Lewra ev gel Misilman e. Zane ku xelasîya wan bi Îslamê ye û bi emr û nehyê Xweda ye.

Divê ku pîreka Misilmana Kurd jî li hember van bênamusa û zerduşta berXwedaneka Îslamî bide û zanibe ku dînê wê namus û azadîya wê ye. Disa zanibe ku Kurdê Misilman xwedîyê namus û îmanin.

Ev serê 80–90 salî ye sazumana laîk ku nikaribu bi gelê Kurd bike, bi destê van laîkê Kurda anîn cî. Çendekî berê li Dersîmê li Munzurê plajek vekirin û zilam û pîrek tazî dinav hev de diketine çemê Munzur ê. Medyaya Tirkîyê jî li vî halê han devê wan ma vekirî û pesnê wê dan. Lewra zanibun ev tazîtî û plaj ne li welatê ku nêzî behrê bû. Di welatê wisa de çêdibû ku ev serê 80–90 salî ye nikaribun xeyala vî jî bikin, lê îro liber çava di hate kirin.

Ji roja ku sazumana laîk hatîye avakirin, armanca wê ku Misilmana ji dînê wan dûr bike. Lêbelê heta îro ev armanca wan ji destê wan ne dihat û armanca xwe nikaribun bibin serî. Rabun ev armanca xwe bi destê **laîkê Kurda (ku di eslê xwe de, pir ji wan û serokên wan ne Kurd in)** birne seri. Laîkê Kurda, ji bo ku xwe bi neyarên Îslamê xweşkin, rabun neyartîya xweyî li hember dînê Xweda bi vî şeklî derxistin holê.

Bela ku gelê meyî Kurd jidil Misilman e, çawa ku sazumana laîk nikaribu wan bi xapîne înşaallah laîkê Kurd jî bi çi navî derkevin holê bira derkevin ewê nikaribin wan bixapînin. Ewê nikaribin û inşallah ê namusa pîreka Misilmanê Kurd payîdar be.

Ew edeb û exlaqê Îslamî ku dinava gelê me de heta îro runişti bû, laîkê Kurda dixwazin bidin jibîrkirin. Li hember vê divê em jî wan cardin bînin bîra xwe û di Jiyana xwe de bikarbînin. Ji ber wê yekê laîk di fitna xwe da çiqas bişixulin, divê em ji wan zahftir bişixulin. Lewra ewan îxaneta en mezin li vî gelî kirin, bi taybetî li pîreka gelê Kurd kirin û wê ro bi ro ji 'îffet û heyayê dûr dixin. Wextê ku pîrek bê 'iffet û heya bibe, nesl jî ewê bê 'iffet mezin bibe. Jixwe ew jî vê dixwazin. Bi vî şeklî komeleka bê 'iffet û heya derxin holê.

*Pîreka Misilman! Hişê xwe bide serê xwe û neyarê xwe baş nasbik e. Ê ku azadîya te dixwaze Îslam e, Misilman in. Ne ê ku bi navê azadîya te derketin e û te ji xwe re dikin alav. Her çiqas bi navê azadîya te û gelê te derketibin jî bi wan gotinê way xemilandî newe xapandin. Zanibe ku cîyê sitara te mala te ye. Mala xwe li gorî emr û nehyê Xweda seruber bike. Zarokê xwe li gor edeba Îslamî û bi heya mezin bike. Li namusa xwe xwedî derkeve. Namusa te dînê te ye.*

---

**1. Nahl: 58,59 - 2. Nur: 31 - 3. Nisa: 1**



Xaltîka Kinê, Kamîle û Gulê

# Pîrek Dipeyvin...

**Sual:** Li xort û qîzê zamanê me hun dixwazin çi şiret û nesiheta bikin. Xort û qîzê me dive çawa bin?

**Cewab:** İnsanê zamanê me tiştê baş û ne baş tevî zanin, belê nakin. Xwendin zêde buye, zanibun zêde buye. Sebiyê vî zamanê me, bîra her tişti dibin û riya Xwedê nas dikin. Ne ku nasnakin. Belê nakin. Buk û qizê min ez dixwazim giş wek insana bin, ya nixumandi bin, emrê Xwedê bi cî bînin. Ê wan bibin bila bêjin “Wella ev qîzê felankesin ya çi başin.” Yanî jiber wî şerefban e, ser bilindayî bane. Lê em nikarin...

**Sual:** Dê û bavê we hun çewa terbiye dikirin?

**Cewab:** Em çar qîz bun, diya me tunebu, em li cem bavê xwe mezin bun. Bavê me nehişt em rojekî xweşik derkevin. Ne mala xaltikê, ne mala cîranki, ne gezmaxek qet’en em ne derketin. Heta em zewicîn. Wê demê jî ne wek aniha bu. Hinek derdiketin, hinek ne derdiketin...

**Sual:** Mesele dê û bavê we ji wer çi digotin?

**Cewab:** Digotin zêde ne derkevin, heya we, ji we hebi, da navê me bi pîsîtî nederkeve. Em xerîbê ciyê xwe bun. Wexta em derketibana, ji derve bêhtir emê derketiba ser ca’dê. Jibo vêya diyên me digotin: “Weki pezek bê qiloç têkeve nava ê bi qiloç.”

**Sual:** Behsa zamanê xwe yê berê bikin. Wexta hun qizbun, wexta hun bûn buk... Hun jî dibînin insanê aniha xerabune. Cilê wan ne başin, ne li gora İslamê ne. Ka hun berê çewabun?

**Cewab:** Berê kar pir bû, fikir felan ji tunebûn. Herkes mesulê ji karê xwe bu, ji hal diket û dihatin mala xwe jixwer radiketin.

İnsanê aniha têr xwarine, qewi bune. Bi vi awayî ji rîya dîn derketine. Xwedê nasnakin, dibên qey wê ciyê me weha be. Hesabê ciyê teng û tarî qe nakin. Evaya jî giş ji qewîtî û ji têrxwarinê ye. Eva ji nankorî ye. Xwedê ni’met dane însan, însan ji nankorîtîyê dike. Ne ‘îbadetê Xweda dikin, ne şikra Wi dikin. Tiştê ku Xwedê gotiye bi cî naynin, pir nankorin. Xweda jî wê hesabê bipirse.

**Sual:** Li gor aniha terbiya we çewa bu? Bi zilama re, bi pîreka ra we çawa mu’amele dikir?

**Cewab:** Zamanê me û ê berê hezar qat ferq dike. Cilê me dirêj bun, fireh bun, em li cem zilama nediruniştin. Em aniha jî li cilê xwe diqqat dikin; lê ê aniha diqqat nakin.

**Sual:** Ji bo çi xort û qizê aniha diqqat nakin?

**Cewab:** Ev tev ji dê û bavê wan in...

**Sual:** Di wexta we de hûn diçun civatê zilama? Yan jî wexta hun leqayî zilama dibun we çi dikir?

**Cewab:** Wexta berê tû kesî şireta li me bike tûnebu. Kesî ku bêje bê “Xwe ji zilama vedin, li cem zilama nerunên.” Belê aniha zanîbun pir buye, kitêb zêde bune, xwendin zêde buye.

**Sual:** Aniha însanê me yani qîz û xortê me di ber xerabune diçe; yan jî diber çêbunê diçe?

**Cewab:** Wella ma em çî zanin, ew encex Xwedê zanî. Rastî, ê baş û qenc xwe tam dabana vî ‘îşî wê çêbuba. Îcar tev buye menfe’at, însan berê xwe dide menfe’etê. Yani menfe’et pir buye.

**Sual:** Evê xwedi parti di vê dema dawî de ji bo pîreka dibên: “Em ne namusa tu kesî ne.” Hun jibo vê dibên çi?

**Cewab:** Pîrek mecbure emrê Rabbê xwe bi cî bîne, ê zilamê xwe bi cî bîne, xwe mihafeze bike. Evanê wilo dibêjin jixwer vêya dixwazin; demek li gori nefsa xwe hereket dikin. Ne li gori emrê Xwedê hereket dikin.

**Sual:** Evana dixwazin em jî bibin wek Ewrupaîya, em dev ji dînê xwe bedrin?

**Cewab:** Ê dev ji dînê xwe berdin jî hene, ê bi heft desta pê bigrin jî wê hebin...

**Hevpeyvîn: Feyzullah Zerey**

Rojev

Naşit Tutar

(Ji Kovara "İnzar"ê)

**'Îd e û mîre me îro, dergehê lutfê vekir**
**Go Mela hingî bixwazî, dê bidim, bes tu bixwaz**
***(Melayê Cizîrî)***

# Ev Cejn, Cejna Me Ye…

Ev cejn cejna me ye. Dîgel derd û kulê me bi qasî giranîya çiyane jî, di sibeha 'îdê de bi şahîyek heta mejîyê hundir hestîyê me hisbikin em pêşwaz bikin vê cejnê. Em guh nedne van tengî, tehlî, êş û elem, fîraqa em ji hev bi dûr xistine, nexasim armanca meyî ku weke bizotek agir hundirê me dişewitîne; bi heyecana da'wetekê em pêşwaz bikin vê cejnê.

Çungî ev cejn cejna me ye.

Tu tiştek bera xira neke di vê îdê de, kêfa me ya îdê... Qelbê me bi evînê û male me jî bi xweşîyê bera tîjî bibin îro... Dilxweşîya ewanê di meydana mahşerê de ji her tiştî emîn bune, bera di wechê me de xwe rê bide. Jibo nimêjê meşa meyî di nabêna mizgeft û malê bera weke meşa wanê ku piştî ji hewdê kewserê avê vedixun bi kêf bi bal derîyê cennetê ve diçin. Hetanî ku bi av u hewa cennetê xwe bipêçin riyê em tê da dimeşin, neqebê tê da derbas dibin, û mizgeftê diçine wan... Li ser zimana tekbîr, di wecha de dilgeşî, û di çava de jî bi kêf; ê ku em leqayî wan bun selam bikin weke selama meleka yî li ehlê cennetê dikin... Tevê tengî û tehlîyê xwe jibîr bikin, ji îro û ji pêşeroja pêşerojê biqetin û vê cejnê bizîvirînin evîn û aşîtîyê... Çungî ev roj roja me ye, ev cejn cejna me ye...

Divê ne peyvê hesudayî musluman me rencîde bike û ne jî êrîşê dujminê me ku nahêle em rihet bibin... Ne jî hevqetandin bera nîvco bihêle kêfa me, û ne jî ezyet îşkence, zulm û îşğala coğrafya îslamê bişikîne şahîya cejna me... Ne tehlîya şehîdê me bera bibe bizotê ser dilê me, û ne jî ğerîbî û tenêtîya mehkumê me yê di paş dîwara de bibe girêka kêfa qirika me... Ma ne me îdraq kiribu jiyan bi tevatî 'îbadet e. *Ma ne me digot dema em sênga xwe ji bela û musîbeta re, ji ezyet û îşkenca re, ji hesret û kesera re vekin; cenet ji dûr ve himêza xwe wê ji me re veke û çavê xwe biqurpîne ji me re...* Ma ne me xwe bi xwe ji hevra digot *"Xweda dibêje: Xweda 'îbadê xwe yî sebirkar bi xweşîyê bêdawî dide mizgîndan"* Ji ber vê, kul û keder çima? Em guh nedin kîna dujmin, heseda hesuda nebînin, li wechê gellaca mêze nekin, peyva bel'ema nebihîzin; li ser 'înada wan bi dilekî xweş em pîroz bikin vê cejnê...Çungî ev cejn cejna me ye...

Ev cejna ku xilat û îkrameke Rebbê me ye, Em bigerînin cejnek rast ku dil bextîyar û dilşadbin tê de...Ev xilata herî xweşikî ku Rehman daye mumina bi dilekî freh ku me qebul kirîye em şanî bidin, ku çi lazim be jibo nîşandanê...

Kulîçê bêhna wan weke miskê bera ewil hazir be, xwarina 'îdê bera bên kelandin li ser tifika ji serê sibehê de û bera neyê jibîrkirin kirrîna şekirê xweşik jibona zaroka... Ewil cîran bera hevdu zîyaret bikin û di pêy ra tev bi hev ra bi komelî bera bêne zîyaret kirin tevê malê mehelê. Xeydandin bera rabe, dilgiranî bera nemîne, xeydandin bera bê jibîrkirin; û 'îbadê Xwedayî îman pê anîne kêfa îdê weke nîyaza şukrê yî ku buram buram bêhna cennetê jê tê tevlî av û hewa herêma xwe kin... Çungî ev cejna ku xilata Rebbê me ye cejna me ye.

**Cejnê me, bi kêfê re rojê 'îbadetê, bi 'îbadetê re rojê qezenca xêra, bi qezenckirina xêra re rojê 'ebdîtîya bi rastî, û bi 'ebdîtîyê re rojên evîn û dilgeşîyê ne...** Dema bi kêf û şahî em pîroz dikin vê cejnê bi vêna re, cejna me diqepişîne defterê me... Jibo nimêja îdê her gava em davêjin xêre jibona me. Tekbîr û zikrê zimanê me dibêjin, Quran a guhdar dikin, nimêj û xutba li hêvîya wan disekinin, tev xêr û qencî ne jibona me... Di vegera mizgeftê de zîyaretkirina xelqê malê, pîrozkirina cejna dost û muhiba 'îbadetin jibona me... Di şeveqa sibehê de çûna me ya ser qebra, xwendina "Yasîn"a 'îbadetin jibona me... Dînê me yî ku mizicandinekê bi tenê jî sedeqe dihesibîne; devlikenbûna me ye bi kêf, musafaha me ye bi birayê me yê Musluman re muheqeq wê me ji guneha paqij bike... Wan zarokê ku berya îdê bi cillê nu wan kêfxweş dikin, û sibeha îdê jî wan yetîmê ji bedêla bavê wan em serê wan miz didin; muheqeq li cennetê wê bircê bilind ava bikin jibona me... Feqîr û mihtac, yetîm û belengaz, jinebî û bêkesê ku em fitre , zekat û sedeqê xwe dighînin wan; li cennetê dinava me de muheqeq wê pacak ma'newî jibona me vekin... Ha wuhaye û divê ku wuha bin cejnê me... Ji ber vê yekê em kêf bikin, bidin kêfdan, şukur bikin û ğafil nemînin; çungî ev cejna ku ji cem Xweda hatiye, cejna me ye...

Em muslumanê ji hêla ma'newîyatê de me xwe teqwîye kiriye, ji qirêja guneha xalî bûne, defterê xweyî xêr û hesenata tîjî kiriye û ji hêsîrtîya temamê tiştê dinyayî azade bûne; li miqabil van tişta teva ku em di vê îdê de kêf nekin gelo wê kî kêf bike? Bê guman ev cejn ne cejna neyarê Îslamê yî ku dibêjin cejn 'îbaretê ji tahtîlê ye. Bera kesek li qusurê mêze neke ev cejn hew cejna me bi tenê ye... Ev cejn cejna Muhemmedîya ye...

Bera qelbê me mehzun neke ew tewtewê di vê cejnê de bi bazdan baz didin bajar tahtîla... Ê ku cejnê jibo fisq û fucurê rojê firset dizanin, ku herdemê xwe bi fisq û fucurê derbas bikin; bera tengasîyê nede qelbê me... Û ewê ku Xweda gelek îmkan û nî'met daye wan da ku wan biceribîne û ew jî cejnê sivik digrin bera halê wan teng neke sînga me... Bi tehqîq! Em qenc dizanin ku **"Jîna dinyê lîsk û kêf e, dîyarê axretê jibo wanê xwe diparêzin hê qenctir û çêtire"** **"Bê guman hemu kes bi 'emelê xwe wê bizîvire bal Xweda û bi hemu kesî re mu'amele li gorî 'emelê wî wê bê kirin"**

Ji ber vê yekê em bihêlin bera hemu kes li gorî bawerîya xwe derbas bike vê cejnê û weke zane bera pîroz bike vê cejnê... Lê belê em weke Rebbê me ji me dixwaze em bibînin vê cejnê. Weke ji me dixwaze em pîroz bikin û bi wesîla vê cejnê em bighêjin razîbûna Rebbê xwe...

Bi hêvîya ev cejn bibe xassê bi me, û li gorî 'adetê îslamê bê pîroz kirin.... **Cejna we pîroz be...**

Mela Ahmed Hilmî el Qoğî



# Boraq (Qurban)

Boraq, qurbana ku di 'îda (cejna) hecîya de tête serjêkirin e. Ev sunneteka pir sewabe ji herkesî re.

Qurban: Ew heywana ku (pez, deveh û dewar) ji bo nêzîkbûna bibal Xweda ve ji roja 'îdê heta dawîya rojê teşrîqa tête serjêkirin e.

Bingeha boraqê berî icma'ê ev ayet in: ***"Deveh jî, me ji we re kirne nişan û 'elametê Xweda..."*** *(Hecc: 36)* Yanê me kirne nişan û 'elametê dînê Xweda... Û: ***"Ji Rabbê xwer limêj kê û qurbanê ser jê ke."*** *(Kewser: 2)*

Di hedîseke ku Muslim ji Enes (Xweda jê razî be) riwayet kirî de derbas dibe ku Resulullah ('aleyhissalat û wesselam) du heb beranê sipî û bi qiloç bi destê xwe serjêkirin e. Dîsa di hedîseke ku ji dîya me Hz. 'Aîşe hati riwayet kirin de Resulullah ('aleyhissalat û wesselam) weha gotî ye: *"Ti 'emelê ku benî Adem di roja 'îda qurbanê de dike li cem Xweda; ji serjêkirina qurbanê şêrîntir nîne..." (Muğni'l Muhtac)*

Boraq (Qurban) sunneta kîfaye ye. Heger yek ji ehlê malê bide bese. Sunnet ji teva re pêk tê. Lê xêra wê ji ê serjêkiriye re ye.

Ji boraqa sunnet re nêt şert e. Kesê serjêke ewê bêje: *"Min nêta qurbana sunnet didim."* Lazime vêya bi qelbê xwe bêje û dîqqet bike. Lewra lefzê "sunnet" ne bêje û bêje: *"Nêta min ez qurbanê didim"* dibe nezir.

Sunneta ji xwedîyê boraqê re ku; neynukê xwe û pora xwe di deh rojê Zîlhîccê de ne qusî ne. Sunneta ku ew bi xwe (boraqê) serjêke. Duruste ku wekîl bigre. Dema ku wekîl girt, divê nêt bîne dema ku teslîmi wî dike. Hem duruste ku nêtê jî bispêrê muslumane kî çi wekîl be çi ne.

Bese di boraqê de pezê mêşinî ku yek salî be ketibe duduwa, pezê bizinî ku dusalî be ketibe sisîya. Deveh ku pênç salî be ketîbe şeşa. Dewar ku du salî be ketibe sisîya. Her devehkî bese ji heft kesa re ku têda bibin şirîk. Weha rengî her dewarkî bese ji heft kesa re. Her pezêkî besê ji yekî re û ev çêtire ji şîrîkantîya deveh û dewara de. Ji xeyrî pez û dewar û devehan, ti heywanê din nabine boraq. Murad ji dewaran: Ga û gamêş û çêlek in.

Ji İbn–î 'Ebbas hatîye rîwayet kirin ku ji xwîn rijandinê re (serjêkirina boraqê re) bese her çi ji mirîşkan be. Hinek 'alima teqlîda wî durust ditîne ji bo feqîra.

Çar qismê van heywana hene nesalihin ji boraqê re: Heywana kor û qop û nexweş û pir lewaje ku mêjîyê wî helîyaye ji ze'ifî. Lê korayî û kulekî û nexweşî ya hindik zirarê nadin.

Heywana avis jî nabe boraq. Lewra avisî wê ze'îf dike. Heywana nêrî xesandî, dibe boraq. Hem eva bê qiloç û a qiloç şikestî, bi şertê ku goşt pêve ne çube di be boraq. Eva guh jê kirî nabe boraq, hem eva ku bê guh xuliqîye. Lê qelaştina guh û qulkirina wî ne zirar in. Eger goştê heywanê bi wan kêm nebe.

Heywana duv jê kirî nabe, lê a ku bê duv yan bê guhan xuluqî be dibe.

Weqtê serjêkirina boraqê ji limêja 'îdê pêve ye yanê ji roja 'îdê ku roj der bû û zemanek buhurî biqasî ku meriv du rek'et limêj bike û du xutbê sivik bixwin e di be wektê ser jê kirinê û dom dike heta ku roj here ava ji roja paşî ji eyyamut–teşrîqa.

Sunneta linik serjêkirina boraqê pênç tiştin:

**1–** Besmele

**2–** Salata li ser pêxember

**3–** Berdayîna qiblê (Berê heywanê meriv dide qiblê)

**4–** Sê tekbir berya besmelê yan piştî wê

**5–** Du'aya ji bo qebûlê ku weha bêje: **"Xwedayê min! Ev (boraq) ji Te ye û ji bo Te ye. Qebûl bik."** (Amîn)

Kesê boraq nezir kirî dema boraq da ne duruste jê bixwe. Belkî wacibe/ferze ku tevî bide. Tişkî ji malê re nehêle.

Kesê boraqa sunnet bide duruste ku jê bixwe. Karê ji sê behra behrekî bixwe û di behra belav bike. Ne duruste ku tişkî ji boraqê bifroş e. Ne goştê wî ne muyê wî ne çermê wî... Hem ne duruste tişkî ji boraqê bike ucreta serjêkirox. Lê ku behawî sedeqekî bide dibe.

Wacibe ku hinek goştê boraqê bixavî bête daîn ji hinek feqir û miskîna re. Yanê bese ku bête daîn ji yekî tenê re.

Efdal ewe ku temamê goştê wî bide feqîra binêta sedeqê, ji dewlemenda re bi nêta hedyê. Îlla çend luqma ji kezeba wî bixwe ji bo teberruk.

Kesê mirî ku wesyet nekiribe boraqa wî nayê daîn, kesê sax jî ku izin nede boraqa wî nayê daîn.

***(Çavkanî: Hediyetu'l Hebib... Me ew nivîs, ji vê pirtukê girtîye. Ji herfê 'Erebî me wergerandî herfê latînî.)***

M. Mahmud Tibyatî

**Pabûse murada me ji yara xwe di 'îdan**
**Mehrum nekî me ji murada xwe murîdan**
***(Melayê Cizîrî)***

# Qurban Çiye?

**Qurban,** ji koka "Qe re be" tê, û bi ma'na "nêzîkbunê" ye. Di dîn de ma'na wê: Bi armanca nêzîkbuna Xweda serjêkirina heywanekî berçav. Bi armanca bawerîyê serjêkirina heywana hema hema di tevê dîna de heye. Bê guman gorîkirina heywana bi herdu zarê Adem (s.x.l) destpêkiriye.

**"Ji wan re axbarê herdu zarê Adem bi heqqî bixwîne. Di bîra xwe bêne dema bi armanca nêzîkbuna Xweda her yekî qurbanek teqdîmî Rebbê xwe kiribun û ji qurbana herduya ya yekî hatibu qebul kirin û ya ê din jî nehatibu qebul kirin."** (Maîde, 27)

Serjêkirina qurbanê di sala hîcrîyî duduya de hatiye tetbîq kirin. Serjêkirina qurbanê 'îbadetek bi mal tê kirin. Di nabêna însan û xaliqê wî de nêzîkbunê bikar tîne. Nexasim ji hêla 'ebdîtîyê de şukrê îfade dike. Qurban di nabêna însan û rebbê wî de hem 'îbadet û hem jî wecîbak îqtîsadî û civakî ye ku komela însana bi hev girêdide. Evêna jî dîgel emrê Xweda pêk tê anîn, hissê 'îbadetê di qelba de bi can dike...

Di zimanê 'Erebî de li şuna qurbanê bêjeya "Udhîye" tê bikaranîn. Di heqqê serjêkirina qurbanê de fikrê 'alimê îslamê ne weke hevin. Li gor hinek 'alima, serjêkirina qurbanê wacib e, li gorî hineka sunnet e, li gorî hineka mustehab e. Feqet qewlê cumhur dibêje serjêkirina qurbanê sunneteke pêxemberî mueked e.

Li gorî mezhebê Henefî, Malikî û Henbelî serjêkirina qûrbanê li ser hemî muslumanê maldar wacib e; û li gorî Şafi'î jî serjêkirina qurbanê sunnet e. Divê derheqê de nexasim di roja me de muslumanê hal û wextê wî li cîh be divê ku qurbanê serjêbike. Çungî Resulê Xweda di vê derheqê de dibêje:

**"Di 'îdya qurbanê de, qurbanê serjêbikin. Çungî serjêkirina qurbanê 'adetek ji bavê we Îbrahîm (s) ji we re mîras maye"** (Îbn-î Mace)

Ji eshabê pêxember 'Ebdullahê kurê 'Ebbas dibêje: *"Resulullah (silavên Xweda lê bin) deh sala li Medînê ma miheqeq her 'îda qurbanê qurban serjêdikir."*

Dîsa Bera b. 'Azîp dibêje: *"Resulê Xweda di her xutba 'îdê de emrê me bi serjêkirina qurbana dikir û digote me* ***"Ji we her kî karibe qurbana serjêbike miheqeq bera serjêbike."***

Di heqîqetê de qurban temsîleke û mesajê dide 'alema ruha. Çungî hezkirina mal di tevê qelba de heye, bi serjêkirina heywanekî însan mesaja ku dikare tiştê xwe yê herî bi qîymet jî di riya Xweda de feda bike, dide rêdan. Herwekî di vê derheqê de Xwedayê Te'ala dibêje: **"Û me devê ku wê bêne qurban kirin jî, ji we re kirin ji nîşanê Xweda."** (Hec, 36)

Serjêkirina qurbanê nîşan û 'elametê teqwa û parastinê ye. Çawa ku Hz. Îbrahîm jibona razîbuna rebbê xwe rabu ku kurê xwe di riya Xweda de serjê bike, wiha rengê serjêkirina qurbanê wê yadîgara kalê me Îbrahîm, bi can dike. Îsma'îl (s) şêrînê ber dilê Îbrahîm (s) bu, û bavê wî bêteredut rabu ku şêrînê ber dilê xwe di riya Xweda de fîda bike. Malê însan jî li ber dilê wî pir şêrîn e, çaxa malê xwe di riya Xweda de feda bike vê suneta Îbrahîm (s) bi can dike. Evêna jî hissê malperestîyêyî ku bi insane re heye dişkîne.

Resulê Xweda (s) dibêje: **"Gelî însana! Her însanê maldar di 'îda qurbanê de bera qurbanekê serjêbike."**

**"Emrê min hate kirin ku ez roja qurbanê bikme 'îd. Çungî Xweda ev roj jibona vê ummetê kiriye 'îd. Û di vê rojê de qurbanê serjêbikin."** Sehabakî go: "Ya Resulellah! Ji ğeyrî heywanekê tu tiştekî min tune ye, ez wê jî serjêbikim?" Resulullah: **"Na! Wê serjêneke. Bes heger tu porê xwe qurf bike, neynokê xwe jêbike, muyê xwe yê heram biqusîne; evana li qatê Xweda jibona te dikeve şuna serjêkirina qurbanekê"** (Ebu Dawud)

Bêguman rojê 'îda rojê kêf û şahîyê ne, rojê xwarinê ne, rojê zikrê ne, rojê tobê, parastin, û bi 'emelê salih hilkişandina meqamê bilind in. Ji ber vê yekê di van roja de meriv kêf bike û muhtac û feqîra kêfxweş bike 'îbadetek herî mezin e.

Serjêkirina qurbanê bi kîtap, sunnet û îcma'a 'alima sabit e. Hukmê serjêkirina qurbanê Xweda di Quranê de wiha tîne ziman: "**Jibona Rebbê xwe nimêj bike! Û qurbanê serjêke!"** (Suretê Kewser, 2)

Li gorî vî emrî kesê jê biqede û hal û wextê wî li cîh be lazim e qurbanê serjêbike. Çungî Enes ê kurê Malik dibêje: **"Di her 'îdê de Resulê Xweda qurban serjêdikir û emrê tevê eshabê xwe bi serjêkirina qurbana dikir"**

Serjêkirina qurbanê jibo însanê Musluman 'îbadete û dikeve ber gelek bela û musîbetê di pêşerojê de wê were. Bi qasî misqal zerre fêdê li Xweda nake. Lewra Xweda dostê 'ebdê xwe ye û dixwaze wî ji neqencî û guneha biparêze.

**"Ne goştê qurbanê we û ne jî xuna wan naghêje Xweda, encax teqwa we (tirsa we yî ji wî ) dighêje Xweda."** (Hec, 37)

Saîd Yusuf



# Nûra Îmanê

**Bi Silavên Xweda,**

Wek hun jî dizanin, xususîyetek Kulliyat a Seyda Bediuzzaman yek jî yê, pêkanina usûla tehqiqê ye. Birastî ev, bi 'eslê xwe usûlek Quranî ye. Ya di, em dinêrin hedisên pêxemberê me -aleyhisselat û wesselam- jî, bi vê usûla han hatine xemilandin. Îcar mirad û meqsed, ji vê usulên; bi misalên heri sivik û yê rehet mesele û behsên heri giran û girîng bîne menzila fêmbarê. Yanî ev mesele û behsên giran, di nezer xwendevanan de sehl(hêsan) bike.

Emê niha, ji van minakana yekê bi ders û 'îbret bineqînin û pêşkêşi we bikin. Belê ev mînak wê ne li ser halê xwe yên wekî kû hatibe... Yanî wê ne wergerek hişk û rasterast be. Wê qelem li bin guhên we ketibe... Çimki hun jî baş dizanin kû di wergerek rasterast de ta'mek xav û sarbûnek ğerib heye. Li gor taqeta xwe hun çiqas li ser bisekinin jî, dê disa ev sarbûn û xavîtî wê tê de bê dîtin. Îcar jibona ta'ma vê minakê xweş û tabi'î bibe, pêwiste ku em, ji cuhe ê xwe çengek xwê ya hurik dirbixin û li navê xin... Lê, digel vê jî, hefsarê vê xwê yê wê ne berdayî be. Jixwe lazim e kû ne berdayî be... Da kû sînor derbas neke û ji hedd dernekeve.

Birastî di vê behsê de, ango di vî resî de meqseda me ya ewwil, em ji xwe re bi reheti goşîkî tirî bixwun, meqseda me ne lêdane rezvan e. Hemu mesele jî li dor vi hebinî her û werin...

Piştî vê destpêkê êdî emê karibin bizîvirin ser mesela kû em ê qal bikin. Mesela me di **"Soza Bist û Sêyemîn"** de derbas dibe. Li wir, di nuqta dûyemîn de Seyda Bedi'ûzzaman dibejê ku: **"Di bûyerek xeyali de min dît..."** Aniha emê baş bala xwe bidinê kû gelo ka bê çi dîtiye?

Min dît ku, .... çiyayê mezin û bilind li hember hev û .... ( noktali ibarelerdeki kelimelerden ben de anlayamadim asil metinden siz de baksaniz) hebun. Li ser van herdu çiya, pirekek bi hêwil (dehşet) û saw (azamet) hatibu avakirin. Da kû bi têkildar bin... Di binê pirê de çemekî pir kûr diherikî û li gor mecraa xwe bi alîkî ve diçe. Lê, bextê xerab! Ez jî li ser vê pirê me. Û dinya jî, ji alî reştariyekê ve hatiye leyandin. Kû ev reştari, birastî mîna qir û gitranê ye...

Di vê navberê de min li alîye xwe yê rastê nêri... Çi bibînim? Mezrakî ekber, ango gorekî pir mezin di nava reştariyek heri bê dawi deye. Yanî min ev halê han xeyal kir. Dû re zivirîm aliyê xwe yê çepê. Viyalî dehîşandine jî wi yali! Di nava pêl û mewcên tari weke qîrê de bahozên girs, teqereq û xirecirên bi xewf û belâ yên girîng têne amadekirin... Pişt re min li binê pirê nêrî. Te dibê qey ez li ser kendaleki bê binîme.

Hate bîra min çerexek min ya bêrîkê heye. Din nav vî hâlê han de, kû halêkî bi tirs û xewf saw e. Min rabu ew çerax bikaranî. Çeraxek ne temam, belê hema kû şewq tê de heye. Wisa... Disa jî, bi ronayîya wê ya kêlê koran min li der û dora xwe mêze kir.

Bi vê nerînerê ji min re diyar bu ku, rewşek mudhîş û heri hêwil heye. Heta li pêş çavê min, li ser pirê û li der û dora wê hinek ejderha û cinawirên wisa xwuya bun kû ji ber tirs û xofa wan min got: *"Aaxx! Xwezi ev çerexa min ya bêrikê tuneba û min ev dehişandin û hêwila ha nedîtiba."* Min berê wê çeraxê dida kîjan alî ew dehişandina hem dihat ber çavê min. Ez mame heyirî û birasti telaşek heri mezin ez girtim. Bi xewf û telaşa han re min got: *"Ey wax! Ha ho! Ev çeraxa han bu belê, bu musibet li serê min..."* Ez Jê qeherim, hêrs bum û min rabu ew çerexa han li erdê xist û min şikand...

'Ecêbek mezin! Çawa ku min ewê çerax şikand, tam bi şikandina wê re tişteki wisa bu ku, weke ez destê xwe bidim bişkoja elektrikê... Ku ev elektrik bû sedema çuyin û valabuna wê reştariyê ji dinyê... Ronayiya vê panosê şewqa xwe da her ali û helqedor bi nura wê tije bu. Vîya jî bu sedem, ji bo heqiqeta her tiştî derkeve holê...

Li ser vê yeka han min mêze kir: Ew pira ku min dîtî, aniha li cihkî birêkupek û di nava deştekê de papûrek û ca'deke.. Ew gora mezin ku min li alîyê xwe yê rastê dîtibu, aniha ji serî heta binî hemu bexçe û bistanê şîn û yê xweşik û delal... Dibin serdariya mirovên nuranî de meclisen ta'at û 'îbadet û xizmet û yê zikr û sohbetê ne.

Îcar ew bahozên girs û teqereq û xirecirên bi xewf û belayê herî girîng ku min dîtibu li aliyê xwe yê çepê (temamê vana di kendalek bêbinî de bun) aniha li pêş çavê min çiyayên bi xemlîn û cancanki û bi cezîbe ne... Dê di paş wan de cih yên ziyafetan û cihên ger û seyranê û cihên binberdanêne. Belê, ev temaşegaha han min xeyal meyal dît.

Û ew cinawirên mudhîş û ev mexluqatên ku min di got qey ecderhane, lê heywanê bermalî ne. Weke devan, ga, mih, bizin û yên din...

Li ser izalebuna halê min yê bu tirs û xewf, êdî haleki bi hizur û bi emîntî li min peyda bu. Bêguman viya jî nûra imanê ye. Û jibona vî ni'metê hanê min got: **"Elhemdulillahi 'ela nûrîl îmân"**

Pişt re jî min ev ayeta han xwend: **"Allahu weliyyullezîne âmenu yuxrîcuhum minezzulumâtî îlennûrî"** (Suretê Beqere, 257) We dispêrim Xweda...

# Guz û Mewîj

Şêx Muşerref Özcan el-Xinukî

*Gelî Feqyan gelî feqyan! Nezer kin*
*Heçî bêjim bizanin hem jiber kin*

*Çiku ez bo we tehqîqen evînim*
*Muhibbek sadiqim hem ğemrevînim*

*Kelamê min xweş û pur nazdar e*
*Şêrîne tazeye wek nûbehar e*

*Ji bo qet'a xerabî şîr e tîj e*
*Wekî navê xwe ye guz û mewîj e*

## Fesla Tehsîlê
*Bixunin hun nekin teqsîr û sistî*
*Emanet se'y û tehsîl û durustî*

*Dersê te lefzkî kurt û dirêj e*
*Kesê ku ew dersê te nabê qirêj e*

*Bixunin hun di havîn û zivistan*
*Nebî çêbî ji we yek roje westan*

*Kesê xwenda muheqqeq her amîr e*
*Nexwenda her wekî pîvaz û sîr e*

*Bi dîqqet hun bikin daîm mutal e*
*Mutale malekî qet bê zewal e*

*Ji metnan qet nebî lefzek jibîrkin*
*Xwe dest vala û bê mal û feqîr kin*

*Nivîsandin qe nahêle ku xwenda*
*Ji 'ilmê xwe bikit yek lefzê winda*

*Ji 'ilmê ra qelem la şekke nîv e*
*Jibona herkesî xet zêr û zîv e*

## Fesla Qedra Seyda
*Ji bo Seyda muheqqeq ferz e îkram*
*Kesê ku nake îkram naxwe în'am*

*Ji Seyda ger dixwazî îstîfad e*
*Divêtin tu bikî lew înqiyad e*

*Ji Seyda ra kesê nakit îta'e*
*Qe nabînî di dunya întîfa'e*

*Eger jê ra mutî' nabî bizane*
*Ku Seyda ê te ew nefsa nezan e*

*Jibo wî zahir û batin evîn be*
*Kesê ku ew nevî jê ra nevîn be*

*İmamê me 'Elî dêje efendim*
*Li her erdî jibo ustadî 'ebdim*

*Yekî got "ey Sikender bo çi daim*
*Dikî teqdîm li ser babê xwe 'alim"*

*Cewab da "faîda bab e fena ye*
*Welakîn faîda 'alim beqa ye"*

## Fesla Mu'amelata Hevalan
*Bi hev ra xweş biborînin bi şahî*
*Bixunin hun bi meqsuda îlahî*

*Bi hurmet bin ji bona hev dewamî*
*Hinî pêk ra ji hevra kin ğulamî*

*Emanet sed emanet sed emanet*
*Jibona hev bikin daîm siyanet*

*Xususen yê ku lefzek zêde xwendî*
*Hemî hevra ji bo bêjin efendî*

*Hemî hun 'eskerê xas ê îlah in*
*Ğulam û xadimê wî barigah in*

*Eger ku hun jibona hev ne baş bin*
*Ji dergeh dê lipaş bin bê me'aş bin*

*Nebî carek di dunya ê ku şer kin*
*Heta saqin fehêtkar û zerer kin*

*Nebêjin ratiba min zêde zor e*
*Weya ev xizmeta hanê bi zor e*

*Nikarim ez hero hîcre bimalim*
*Li mala xwe 'ezîz û hem delalim*

*Kubarim min ji şalê xwe fihête*
*Binêre îşlekê min şibeh pête*

## Fesla Exlaq
*Nebî çav we daim bî li kevçek*
*We ya şal heşîn û we ya ne perçek*

*Cil û pirçik ji exlaqê jina ne*
*Biha nakit kesê metnê wî nan e*

*Ji bo feqyan civat û hem 'elaîq*
*Digel ğeyrî feqyan qet nîn e layiq*

*Dinava gund herin meşyek giranî*
*Li rast û çep nezer 'eyb e tu zanî*

*Muheqqeq pir kenîn û deng bilindî*
*Menafî ye ji bona 'aqilmendî*

*Cihan paqij bikin çendî bikarin*
*Di hicran qirş û qal wek 'eyb û 'arin*

## Xatîme
*İlahî tu min û feqyan îlahî*
*Hîmayetkî ji ef'al û menahî*

*Me şêrîn ke biwan ewsafê şêrîn*
*Gelek muhtac û ne'lac û feqîrin*


*Ji wê behra ku jê reh tê biqencan*
*Bike îhsan jibo me yek du fîncan*

*Salat û hem selam hingî hurufan*
*Li pêxember digel sehb û mirovan*











“Biratîya rastî,
kulîlka Jiyanê ye”

Jiyan û Îslam

# Banga Me: Biratî ye

‘Emerê Wezrînî

**“Misilman tenê bira ne.”**[1]

Xweda ê Te’ala Misilman bira î’lan kirin e. Şekl û şemalê wan, qawm û ‘eşîrên wan, ziman û rengen wan bi çi awayî bin bira bibin, gotîye ewana bira ne. Ferqî di navbera wan de tune ye. Cudatîya însana yî maddî tenê meznatîya Xweda nîşanî ‘alemê dike. Qudret û hikmeta Wî darî çavê mexlûqata dixe.

Misilman li ser vê fermana Xweda ê Te’ala, bi çavê biratîyê li hev dimeyzênin. Cudatîya qewm û ‘eşir û reng û tiştê wek wana li cem wan wek gulên rengînin kû dinav bexçekî da ne. Lewra gava însan hatî dinê, dê û bavê xwe, ‘eşîr û qewmê xwe, reng û zimanê xwe ne neqandîye. Kesî pirsa van tişta jê ne kirîye. Evya ne bi îrada însanin. Xweda bi sedem însan îmtîhan bike neqandina van tişta ne spartîyê. Ji ber vê yekê mafê kesî tune kû bi sebep van tişta doza meznatî, amirtî û serwerîyê bike û bêjê: **“Divê ez, an ‘eşîra min, an jî qewmê min mezin be.”** Kesê doza vî tiştî bike îman bi vê ayeta Xweda neanîye. Asabîyet sedema mihokirina biratîyê ye. Bingeha zilm û zorîyê ye.

Însan ji dê û bavekî hatine dinyayê. Hêdî hêdî zêde bune û li dinyayê belav bune. Her çiqasî zêdebuna wan çêbûye hewqasî ji hev cuda bune. Piştî demekê îca ‘eşîr û qewm peyda bune. Xweda dinav însana da qewmîyet ava kiriye; ji bo kû hevdî nasbikin û bi hevdîra dostanî û hevaltîyê bikin. Têkîlîyê wan bi hevra çêbibin û Jiyaneke civakî li dinyayê bidomînin. Heger însan tevek bi rengekî û şiklekî û bi zimanêkî tenê bûna wê çiqasî nexweş bûna. Bawer bin meyê ti ta’m ji Jiyana xwe nekirbûna. Lê vêga merîv ta’mekî ji Jiyana xwe dike. Lewra meriv hevdî nas dike, meriv hînî zimanê cuda dibe, meriv bi hev ra dikeve têkîlîyê, zarokê meriv jî rengo rengo çêdibin û ji ber vê bê çiqasî em kêfxweş dibin ne wilo?

Belê, cudatîya însana hinerê Xweda nîşanî me dike. Bê çawa ji nuqutek avê hevqas însanê rengîn tenê wicudê. Nêrîna mêyî li cudatîya însana tenê divê çarçovê da ye. Em li qewm û êl û renga, ji vî çavî pêve nanêrin. Çimkî em baş dizanin ku, gava ‘esebîyet ket holê, biratî namîne, dostanî dimre, têkîlî qut dibe. Kesê bihêz dikeve rîya serwerîyê, ji bo serê kesê ji xeyrî xwe li ber xwe bitewîne, dest bi ta’dê, zilm û zorîyê dike. Bi hemî hêza xwe, êrîşê dide qels û belengaza. Dest davêje malê wan, ev têrî nake, destê xwe dirêjî namusê jî dike, ev jî ne bese xwinê dirjîne. Jiyanê li wan dike zîndan. Zarok û kal û pîrek nasnake wan dide ber hev. Dinya dinav fitnê û fesadê da dimîn e.

Zalimê Seddam hewqas qetlî’am, talan, zilm û zorî bi sebep çi dikir? Bi hezara misilmanê Kurd kuşt û hunda kir. Ji ber çi? Hema wilo kêfa wî dixwest? Yan ‘aciz bûbû sebra xwe tanî? Birayê min! ‘Esabiyet û qewmîyetçîtî agir e, mirin e, kîn û ‘eda-

wet e, dijminantî û şer e. Zalimê Seddam û ê wek wî tev bi sedem 'esabiyet û qewmîyetçîtî yê bune xwinxwar û xwinrij. Her weha laîkê Tirka jî wilo...

Kesê qawmîyetçîtîyê bike, wî bawerî bi ayeta **"Misilman tenê bira ne"** ne anîye. Heger misqalî zir bawerî di dilê kesekî de hebe, qawmîyetçîtîyê nake. Bi sedem qewmê xwe ezyet, zilm û zorîyê li kesî nake. Bi taybetî ku misilman bin, xwe ji wî tiştî dûr dike. Çimkî Misilman tenê bi çavê biratîyê divê li hevdî meyzênin. Bi çavekîdinê nikarin li hev mêze bikin. Xweda û Resûlê Xweda ji wan qebul nake. Heger misilman bi çavê bira li hevdî mêze nekin, herkes kurê bavê xwe ye. Wê demê kî xurt û bi hêz be, ewê bi ser keve. Piştî wextekî îca wê herkes xwe bi xwe bi hev kevin. Ma iro li Afrîka ne wilo ye? Ma kesê ji 'eynî qewmî îro hevdî naqêlînin? Bi hezara kesan na kujin? 'Esabîyet nexweşîke wilo ye kû piştî demekî li xwedîyê xwe vedgere. Ji ber vêyekê, Xweda hifza me ji qewmîyetçîtîyê kiriyê. Gotîye: **"Meznatî tenê bi taqwayê ye"**, Hz. Pêxember Sallallahu 'aleyhî we sellem, gotiye: *"Gelî insana! Rebbê we yek e. Tu mezinantîya 'Ereba li ser, ê ne 'Ereb û mezinantîya ê ne 'Ereba jî li ser 'Ereba tune. Tu mezinantîya ê reş li ser ê spî û ê spî jî li ser ê reş tune. Mezinantî tenê bi taqwayê ye. Ê dinav we de herî çêtir; ê herî zêde xwe ji Xweda distirînin."* Misilman wek diranê şe ne kesek ji kesî ne mestir e.



Îro hewcêyîya me, bi biratîya Îslamê pir heye. Dijminê Îslamê ji bo Misilmana bi hevdî bidne kuştin, di navbera wan de kîn û neyartîyê saz bikin, gellacîya qewmîyetê dikin. Gelê Kurd çi kişandibe ji ber vê kişandîye. Laîkê Tirka, ji ber qewmîyeta xwe di ser a Kurda de dîtin, zilm û zorî û qetlî'am kirin. Bawerî bi biratîya Îslamê ne anîbûn. E wan Îslam û rumetê Îslamê jixwer dijmin dîtin, bi vê sedemê çi tiştê ji Îslamê hatibûn wicudê jî bi vî awayî neyar dîtin û jixwer kirin hedef. Biratîya Îslamêyî ku ev nêzî hezar salî ye dinav gelê Kurd û Tirk de hebuye, ji bo ji holê rakin, bi hemî hêzê xwe êrîş kirin. Gelê Misilmanê Kurd, zilm û zorî, êş û ezyetî zehf kişand. Hê jî dikşînin.

Ji ber vê em dibên şî'ara me eve: **"Misilman tenê bira ne."** Misilman ezyetê û ta'dê, nadê biraye xweyî Misilman, wî na aciqênê, zilm û zorê lê nakê. Gava kete tangasîyekê destê xwe davêjîyê. Dikeve bin çengê wî û wî hildigre. Dibe şirîkê barê wî, pê ra digrî, pê ra dikenê, pê ra kêfxweş dibê, pirsgirêkê wî ji bo çareser bike di tebitê. Li hember wî dilnizm e.

**"Misilman wek diranê şe ne."** Yek ji ê dinê bi sedem tiştê madî, ne mistir e. Tevek wek hevin. Ma hun nanêrin di mizgefta de, ji her rengî û zimanî û qewmî meriv dighîne hev, mile xwe didine milê hev, tevek di rêzekê da disekinin û di hizura Xweda ê Te'ala da limêj dikin. Kes bi sedema reng, ziman û qewmê xwe torpîlê nabîn e.

**"Misilman wek laşekî ne"**, gava stirîyek di tilîyê de rabe bê çawa tevê bedenê pê êşê dibîne, 'eynî wilo jî gava ezyetek werê serê misilmanekî divê, tevê misilmana jiber êşê bikşînin.

Çi Tirk, çi Faris, çi 'Ereb, çi İngîlîz, çi Alman her wekî van kî Misilman be, birayê me ye. Em biratîyê bi Quran û Sinneta Pêxember dipîvin. Mezinê me, ne reng û ziman û qewmîyet e. Kesê bawerî bi ayeta Xweda anîbin, nikarin derne dervê sînorê vê çarçovê. Kî derê, bira ji îmana xwe bitirse. Kesê bi hêstê qewmî zilm û zorê li Mislimanekî bike, bi zanibin ku wî îman bi ayetên Xweda ne anîye.


---

1. **Hucurat: 10**

M. ‘Abdulkerim Muderris

*‘Alim warisê pêxembera ne*
*De’wa pêxembera li hêvîya wane*
*Heger ew ne bin, wê însan bibin*
*Wehşi û hov wek hirç û gurane*

# Mele Îbrahimê Kurê Mele Îsma’îl



Jê re tê gotin: Mele Îbrahîmê kurê Îsma’îl. Mele Îbrahîm li gundê Beyarê mamoste bû. Beyarê gundê nehya Gul’enber e ku ev jî nehya Silêmanîyê ye.

Mele Îbrahîm di sala: 1185’e hicrî li Beyarê hatîye dinyê. Li cem bavê xwe; Mele Îsma’îl ders xwendîye. Mele Îsma’îl li ser gotina kesên rast, di nav zencîra 25 ‘alimê Beyarê de bûye. Piştî giha dema xortanîyê vegerîya medresa ku wê demê hebû.

Dema Mele Îbrahîm ilim dixwend, bavê wî yî mamoste wefat kir. (Rehma Xweda lê bê.)

Di ta’ziya rehmetîyê Mele Îsma’îl de, Mele Îbrahîmê Beyarî ji merivekî ji gund, gotinên nexweş bihîst. Mele Îbrahîm bi van gotina pir êşîya. Zilam wiha digot: **“Belê Mele Îsma’îl vefat kir. Lê kurê wî Îbrahîm di domandina dersê de kete dewsa wî. Belê çi fêde Mele Îsma’îl di pey xwe da ti xwendevanê muhtacî dersê ne hişt.”** Mele Îbrahîm bi vê gotinê zahf xemgîn bû. Piştî ta’zîya bavê wî xilas bû çû Silêmanîyê. Di medresa ‘ellame Şêx ‘Ebdulkerîmê Berzencî de bi cî bû. Wê demê Şêx ‘Ebdulkerîmê Berzencî di zanîngeha “Başenbabanî” de –ku vêga bi navê mizgefta Şêx Baban ‘Elî navdar e– mamoste bû. Heta ‘ilmê xwe qedend li wêderê ma. Piştî ‘ilmê xwe qedand çend xwendevanê jîr jî bi xwe re anî û vegerîya gundê Beyarê. Li wê derê bu momaste.

Mîrê Baban, hinek mal weqfî Mele Îbrahîm û medresa wî kir. Karê vî malî têra mesrefê medrêsê û xwendevana teva dikir.

Mele Îbrahîm di ‘ilmê belağatê de û di ‘ilmê eqlî û neqlî de şareza bû. Merivekî feqîh, salih û mahîr bû. Di wextê ‘alimê mezin Şêx ‘Ebdullahê Xirpanî de dijî bû.

Dema ku li cem sê ‘alimê mezin ‘ilim dixwend, ders da Mewlana Xalidê Kurdiyê Neqşîbendî.

Mele Îbrahîm di sala 1250ê hicrî de wefat kir. (Xweda rehma xwe lêke.)

Di pey xwe de bi navê Mele Hiseyn û Mele Tahir di kur hiştin. Mele Hiseyn jî di pey xwe de bi navê: Mele Mistefa û Mele Tayyîb di kur hiştin. Mele Mistefa di pey xwe de bi navê Mele ‘Ezîz kurek hişt. Ev kurê wî naibê qadîyê Gel’anber bû. Zincîra ‘alimê Beyarê bi Mele Mistefa qadîya ye. (Xweda rehme xwe li teva bike.)

*(Çavkanî: “Alimê meyî Di Xizmeta ‘Îlm û Dîn De” (‘Ebdulkerim Muhammed Müderris) Wergêr: ‘Emerê Wezrînî)*

## Ava Heyatê

# Şîretên Hebîbê Xweda

**1-** Dil nebijê dinyê, wê Xweda ji te hezbike, dil nebijê malê xelkê wê xelk ji te hezbikin. (960)

**2-** Zimanê xwe ji seba Mislimana bigrin. Dema yek ji wan mir behsa wî bi xêrê bikin. (949)

**3-** Rehmê li ehlê erdê bikin wê ehlê asîmana jî rehmê li we bikin. (941)

**4-** Hay ji eqrebê xwe hebin. Hay ji eqrebê xwe hebin. (940)

**5-** Çar sinif însan hene Xweda ê Te'ala li wan tê ğezebê: Firoşkarê sondxwer, feqîrê kubar, pîrê zineker û serokê zordar. (932)

**6-** Çar tişt hene ji tabî'et û exlaqê Resul û pêxembera ne: Heya (şerm û fihêtî), bikaranina bînên xweş, zewac û bikaranîna siwak û firça dirana. (919)

**7-** Çar tişt hene kesê ev her çar tişt tê de hebin ew munafiqê xalis e û ê exlaqek ji van tê de hebe, exlaqekî munafiqa tê de heye heta biterikîn e: Dema xeberda derewa bike, dema soz bide neyne cî, dema bext bide xedrê bike û dema tekoşîn bike ji heqîyê dur bikev e. (916)

**8-** Çar tişt hene wexta di te de mewcud bin, ji dinyê tiştekî te jî tunebe ne derd e: Rast gotin, muhefeze kirina emanet, exlaqê xweş û 'iffeta dixwarinê de (durketina ji heramîyê û îqtîsada di helalî de) (912)

**9-** Qencîyê miriyê xwe bêjin û xerabîyê wan ne bêjin. (905)

**10-** Wexta xwarin hate danîn ji dora wê bixwin û nîvê wê bihêlîn (ne pelişînin). Lewra bereket nazilî nîvê wê di be. (Ev di xwarina wek birinc û savarê de mimkin e.) (891)

**11-** Dema xwarin hate danîn pêlavê xwe derxin. Lewra wê lingê we bêhtir rehetbin. (889)

**12-** Dema meznatî hate sipartin ji ne ehla ra, hingî li hêvîya qiyametê bin. (887)

**13-** Gava yekî ji we, li yekî ji xwe dewlemendtir û bedewtir nihêrî, bila (di peyre) li yekî ji xwe kêmtir û feqîrtir jî binêr e. (875)


**14-** Gava şeytan di xew de bi yekî ji we leyîst (xewnê nexweş nîşanî wî da) bila liba kesî pê ne peyîve. (844)

**15-** Gava hun sisêbin, dido ji we, heta hun tevlî însana nebin bi hev re pispisê nekin (bidizî xeber nedin). Lewra ewê hevalê we mehzun bibe. (842)

**16-** Gava ê heval sisê bin bila dido bê ê sisîya bi dizî xeber nedin (pispisê nekin.) (827)

**17-** Zilamê ku du jinê wî hebin û dinav wan de 'adaletê neke wê roja qiyametê bi şaqekî were ber heşrê (826)

(Çavkanî: Camiussağir (Suyutî)
Wergêr: Mela Mizgîn)



## Xefkê Li Ber Xort û Keçê Kurda (3)

# Bê Edebî, Bê Heyayî û Exlaqsizî

Bi navê Xweda ê Rahman û Rahim

Silavê Xweda ê Te'ala li ser we xwendevanê hêja bin.

Tim û daîm hemd ji Xweda ra be. Selat û silav jî li ser pêxemberê me Muhammed Sallallahu 'aleyhî wesellem be.

Çavkanîya edeb û exlaqê Misilmana Îslam e. Misilman di bin terbîya Quran û sinneta pêxember de digihin. Edeb û heya xwe, ji van distînin. Xweda 'ezze we Celle ji bo pêxember Sallallahu 'aleyhî wesellem di Quran a pîroz da wiha dibêje:

**"Bê goman tu, li ser exlaqekî mezinî."**

Pêxember exlaqe xwe ji Quranê girtibû û Xweda Wî terbîye kiribû. Edeba xwe rasterast ji Xweda sitandibû. Jiber vêyekê weke tevê Misilmana gelê Misilmanê Kurd jî edeb û exlaqê xwe ji Hz. Pêxember Sallallahu 'aleyhî wesellem sitandin e. Ji roja Îslam qebul kirin heta weke îro, zar û zêçê xwe bi wê edeb û terbîyê rakirin e, û wan mezin kirin e, exlaqê pêxember di jîna xwe da serwer kirin e. Li gor hêz û taqeta xwe wek pêxember Sallallahu 'aleyhî wesellem dijîn e.

Gelê Misilmanê Kurd, ji ber ku bi Îslamê re dilsoz bû, li hember emr û nehyê wê zahf zîz bû, di dijê emr û nehyê Îslamê de tiştek ne dikir. Li hember Rebbê xwe ser tewandî û li hember pêxemberê xwe jî evindar û dilnizm bû. Gelek 'adet û kevneşopê Misilmanê Kurd, li gorî emr û nehyê Îslamê hatine wicudê. Ji ber vê di nava kevneşop û 'adetê wan de, di dijê Îslamê de kêm tişt hene. Heger îro tiştê ğeyrî Îslamî di nav de zêde bûbin evya ji ber ku hêdî hêdî ji edeb û exlaqê Îslamî dur dikevê ye. Lewra du heb dijê hev, di ciyekî de nacivin. Vêya ne mimkin e. Gava tiştekî ğeyrî Îslamî kete cîyekî, bizanibin ku li wê derê tiştekî Îslamî rabuye.

Dijminê Îslamê vêya baş dizanin. Ji ber vêyekê pir bi şeytanî di xebitin û wek rovî xefkê xwe dixedin. Bi hîla û dek û dola nêçîra xwe digşînine bibal xefkê xwe va.


Di xortanîyê de xwîn dikelê. Hinek hestê însan zahf xwe nîşan didin. Di nav van hêstan de jî ê heri girîng hêza şehwetê û hêza xişmê ye. Van herdu

hêzan di dema xortanîyê de gelekî pêş dikevin. Lewma di vê demê da meriv zu dixapin. Edeb û heya Îslamî însana ji teşqelê xortanîyê diparêzin. Exlaqê Îslamê wek mertal li hember êrîşê şehwet û xişmê di sekine û xwedîyê xwe distirîn e. Dek û dolê dijmina fêde nade. Lê dema edeb û heya ji holê rabe, exlaqê Îslamî wê ne mîne, pî; ewê wî wextî zu biterpile. Ev edeb û exlaqê xweşewîst ku di rohnayîya Qur'an û sinnetê da saz buyî, dijminê Îslamê bi şikilnî cuda dixwazin ji holê rakin.

**Geli Keç û Xorta! Li Hungivê Bi Jehr Ne Civin, Pê Ne Xapin...**

*Tiştên şehweta insan tetmîn dikin û di wextekî derbasbuyî de wî kêfxweş dikin wek hungivê bi jehrin. Wek marê nerm in... Hungivê bi jehr devê insan şêrîn dike belê êş û mirinê bixwer tîne. Mar jî nerm e; belê bi insan vedide, wî dikuje...* A ha! Dinya di nav heramîya de ev e. Îro neyarên mêrkuj, bi alavê wek televîzyon, sînema û tîyatroyan; bi fîlm, bername û leyîstkê ğeyrî Îslamî tim û daîm êrîşî edep û heyayê dikin. Bê edebî, bê heyayî û exlaqsizîyê belav dikin. Ew keçê kurda ku ji heya wan kesekî wek 'adetê ruyê wan ne didît, îro cilê tango li xwe dikin, ser qot, çeng rut û paq tazî li der û dora digerin. Ew xortê ku ji fedîya serê xwe ji ber xwe ranedikirin, îro hiş û eqlê wan li xerabîyê dişxule. Ma vana tev bi seb çi ne?

Bi navê "Festivala" keç û xorta wek heywana dikin nav hev; bi navê "Dîlan û daweta" wan dikine milê hev û direqsînin; bi navê "Konser" wan di nav hevde dihejînin û dihejînin. Edeb û heya wan ro bi ro dikujin. Jiyana filleh û cihûya saz dikin. Hê di mektebande bi zarotî keç û kura li cem hev rudnênin û bi vî awayî exlaqê wan xiradikin, perda 'eybu 'arîye diqetînin. Gava perda heyayê qetîya, êdî pêşya hemu xerabî û nebaşîya divebê. Zimanê min na gerê ez bejim, lê a rastî bi vî awayî fuhş û zina zêde dibe. Nesil di lewut e, komala gelê Kurdê Misilman ber bi xerabîyê ve diçe.



Ji ber vê gelê meyî Misilmanê xoşewîst! Hey ji keç û xortê xwe hebin. Ew edeb, heya û exlaqê Îslamî cardin bi tevê hêza xwe derxine holê. Zarokê xwe bi exlaq û edeba Resulê Xweda bixemlînin. Wan li hember xefkê dijmina hişyar bikin. Wan ji hilê wan dur bikin. Vêna bizanibin û jibîrnekin ku xuşk û biratî bi xwin û şîr çêdibe. Kese di bên: "Em tev xuşk û bira ne" derewa dikin, hîla dikin, derdê wan ku keç û xorta ji rê derxîn in.

Gelî keç û xortên hêja! Bextewarîya we bi edeb, heya û exlaqê Îslamî ye. Xilasîya weyî dinya û axretê bi edeb, heya û exlaqê Pêxember Sallallahu 'aleyhi wesellem e. Vêya jibîr nekin ku: **"Heya ji îmanê ye."** Hêya a zêde, 'elametê îmana zêde û zexm e. Helal û heram hişkere ne. Hêzê weyî ku zehf li derin bi helalîya bitebitênin. Ji hêramîya wek ku hun ji agir direvin birevin. Kêf û zewqê dinyayê nepayîdarin. Nefs doza xerabîyê dike, şeytan û hevalê wî jî alîkarîye bi nefsê re dikin. Îro sifra Deccal raxistîye. Hey ji xwe hebin. Sifra Deccal, bi kêf û zewqa xemilandiye. Ê jê bixun ewê bi xisirin. Ê jê durbikevin ewê xilas bibin.

Xefkê ku liber we hatine danîn bi kurtasî em behs dikin. Guh bidne me û xwe ji wan biparêzin. Edeb û heya xwe wek çavê xwe bistrînin, xwe bi exlaqê Resulullah 'aleyhissalat u vesselam bi xemlînin. Azadî û xelasî bi vêye.

**Tiştên şehweta insan tetmîn dikin û di wextekî derbasbuyî de wî kêfxweş dikin wek hungivê bi jehrin. Wek marê nerm in... Hungivê bi jehr devê insan şêrîn dike belê êş û mirinê bixwer tîne. Mar jî nerm e; belê bi insan vedide, wî dikuje...**




Hevpeyvîn:
Necat ÖZDEMİR

## Sıddık Şeyxanzade:

*"Heger îro musluman bi me'nake heqîqî werne bal hev û bibne ehlê tewhîdê, wî çağî wek gotina Seydayê Bedîûzzaman **"Madem em muwahhîd in, naxwe em muttehîd in."***

*Sıddık Xoca yekî heyata xwe di belavkirina tefsîra Rîsalên Nûr de derbas kiriye. Digel vî qasî, ji mezlûmîyeta gelê Kurd re jî bê deng nemaye. Jiber nexweşiya mamoste, me bi kurtehî, pê re hevpeyvînek lidarxist. Em bawerin ku "Kovara Kelhaamed" wek pirên Muslumanê Kurd û dozvanê Îslamîyetê, hêvîyek ji hêvîyên Sıddik Xoca bûye. Me xwest, ew jî çend peyva bi wesîla vê kovarê ji xwendevanê me re bibêje...*

**Mamoste, Seydayê Bedî'uzzeman di eserên (berhemên) xwe de li 'esabîyetê û mîllîyetperwerîyê bi çi hewayî dinêre?**

Seydayê Bedî'uzzeman, di eserên xweyî berê û yên nû de bi tenê xwedyê fikra ummetê ye. Mîllîyet jî di çarçova Îslamîyetê de mutalaa kirîye. Bedî'uzzeman di temamê heyata xwe de bi temamê hêz û qeweta xwe, jiboy hakimiyeta Îslamê şuğulîye. Ligor Îslamê mîllîyetperwerî esas û bingeh nayê qebulkirin. Digel vê mîllîyet heye. Üstad di sê kategorîya de mîllîyetê dide nîşandan: Menfî mîllîyet, musbet mîllîyet, mîllîyeta Îslamê yî pîroz. A herî rast û meqbul, mîllîyeta Îslamêyî muqeddes e.

Tirk yan jî Kurd be, dema kesek ji xeta Îslamê derket dikeve menfî mîllîyetê. Hevî û metoda Ustad Bedîuzzeman fikra ummetê ye. Yek dikare ji mîllîyeta xwe hezbike. Belê divê zanibe ku Xweda qebîle û millet jiboy naskirin û alîkarina hevudin çêkirine. Li ba Xweda yên mezin; ê bi teqwa ne.

**Dema em li heyata Seydayê Bedîuzzeman dinêrîn; em dibînin ku neyarên Îslamê jiboy pêşîya Ustad bibirin, mîllîyet kirne asteng. Gotine "Seîd Kurd e, Kurdekî bi dûv e, divê Tirk lipey neçin..." Em ji vê fahm dikin ku; neyarên Îslamê jiboy jihevkirin û perçiqandina Muslumana mîllîyetê didne pêş.**

Mixabin... Rast e, wilo ye. Belê ew gotinê wanin, ew pêve girêdayî ne. Lê em bixwe di bîr û bawerîya ummetê de ne. Ya herî muhîm mîllîyeta muqeddes e; ku ew jî Îslamîyet e. Belê jiboy vê bîr û bawerîyê terbîya ruha lazim e.

Heger îro musluman bi me'nake heqîqî werne bal hev û bibne ehlê tewhîdê, wî çağî wek gotina Seydayê Bedîûzzeman **"Madem em muwahhîd in, naxwe em muttehîd in."** Emê bi bawerîyeke ligor Quran û sunnetê singa xwe ji muslumana re vekin.

Heger yek milletê xwe ji yên din mezintir bibîne û yên din înkar bike ev ne Îslamîyet e. Di Îslamê de nuqte a esas teqwa ye.

**Mamoste, gelê Kurd xususen piştî cimhurîyetê pir zulm û te'de dîtin. Vî milletî jî wek mesela "Yen dikeve behrê, xwe tavêje mar" bi fikrên batil û ne rast xwe girt...**

Rast e, mixabin (maalesef) vêya tiştekî mezin anî serê Kurda. Îro bi pirî em dibînin yên ku doza Kurdîtîyê dikin însana bibal menfîtiyê ve dibin û teşwiq dikin. Belê divê bê zanîn ku evêna ne çare ye. Çare Îslam e, şerî'et e... Divê em lebat, metod û hemû tiştên xwe rasterast ligor Îslamê bikin.

**Ligor me bihîstiye, Seydayê Bedîuzzeman mizgîniya Kurda daye ku heger li Îslamê xweyî derkevin, ewê bibne wesîla yekitiya milletên musluman...**

Belê, Bedîuzzeman gotiye: "Heger Kurd xwe bi Îslamê bigrin, Quranê bikne rehber, di çend se'eta de karin dewleta Rus jî zept bikin, bistînin."

Üstad, di temamê heyata xwe de jiboy "Îttihada Îslamê" xebitiye. Dibê ji Îslamê ta'wîz neyê dayîn. Lewra ta'wîz yekî ji Îslamê dûr dike û wî dixe bin zîlleteke mezin.

Şêx Seîd gotiye; yê me û Tirka tîne bal hev Îslamîyet e, kengî wana dev ji tetbiqa Îslamê berda wî çağî me qiyam kir, serhilda. Qiyama wî jî Îslamî ye.

Bihevrebûna me li ser Îslamê ye. Divê pîvana me Îslam û Quran bixwe be. Şî'ara me ev e...

**Mamoste, Xweda ji we razî be. Me hun westandin...**

# Seyda Bedîuzzeman û Mîllîyet



Kelhaamed

*Di welatê me de, ji demekê dirêj heta niha, mîllîyetperwerî û nîjadperestî di devê xelkê de ye. Wilo xuyaye ku, zûbizû ranabe jî. Dewleta Tirkî dest bi vê minaqeşê kir. Lewra navê xwe, navê millîyetekê danî û go "Hemû kes Tirk e" Belê ev gotin û tetbîqat ji teref dujminê Îslamê ve hatîye derxistin û tê domandin. Ne karê milletekî musulman e... Em jî wek seydayê xwe dibêjin em bi mîllîyeta xwe Kurd in, belê ev mîllîyet di heyata meyî civakî ya hundir de ji Îslamê re alikar, qel'e û zirx e. Lewra Îslamîyet mîllîyeta meyî herî bilind û muqeddes e û bi milyona bira ji mer çêkirine. Di vê çarçovê de emê guh bidne seydayê mezin, Bedî'uzzeman Seîdê Kurdî.*

## "Menfî Mîllîyet" nexweşîyeke Ewropa ye

*"Ji berê de, min li menfî mîllîyet û 'unsurîyetperweriyê, bi çavê nexweşîyeke Ewropa û jehreke mêrkûj, meyzandiye. Ewropa, ev êş avêtiye nav Musulmana jiboy tefrîqe bikeve nav wan, bibne perçe û pare; da ku ji qurpandina wî re hazir bibin." (16. Mektub)*

## Ğaye ji fikra mîllîyetê perçekirin û 'qurpandina muslumana ye

*"Fikra millîyetê di vî zemanî de pir bi pêş ve çûye. Xususen zalimên Ewropayî hilekar, vêna bi şeklekî menfî dinav Muslumana de hişyar dikin; da ku bikne perçe û biqurpînin.*

*Him di fikra mîllîyetê de, zewqeke nefsanî heye, lezzeteke bi ğeflet, qeweteke bê oğir heye. Jiber vê yekê di vî zemanî de kesên bi heyata civakî re meşğul dibin "Dev ji fikra mîllîyetê berdin" nayê gotin. Belê fikra mîllîyetê du qism in:*

*Qismekî wê menfî ye, bê oğir e, bi zirar e. Bi qurpandina yên din, xwe xwedî dike, bi dujminatîya yên din xwe didomîne, hişyar dimîne. Evêna jî sebebê dujminatî û keşmekeş û qirênê ye. Jiber vê yekê di hedîseke şerîf de pêxemberê me wiha ferman kiriye:* ***"El îslamîyyetu hebbetil 'esabîyyetîl cahîlîyye"*** * *Û di Quranê de jî hatîye fermankirin:* ***"Dema kafir wê ğireta, ku ji te'essuba cahilî bixwe ye, bi cî kirin, Allah bi ser qasidê xwe û mumina de aramî, tebat û ewleyî daxist; di teqwa û girêdaniya bi sozê xwe de, tebat da wan. Şixwe ewana ji vê re layiq û ehl bûn. Xweda her tiştî bi heqî zane."*** *(Suretê Feth, 26)*

*Aha! Ev hedîsa şerîf û Ayeta Kerîme, bi şeklekî qet'î menfî mîllîyet û fikra 'unsurîyetê qebul nakin. Lewra mîllîyeta Îslamêyî musbet û muqeddes, îhtîyacê bi wê nahêle..."*

## Mîllîyeta Îslamêyî muqeddes bi milyara bira çêdike

*"...Erê, gelo kîjan 'unsur sê sed û pêncî milyon heye?(Îro ji milyar û nîvê derbas bûye) Û ew fikra 'unsurîyetê di cîyê Îslamîyetê de, da ji xweyê wê fikrê re biran, him birayên ebedî kar bike?..."*

## Musbet Mîllîyet çiye?

*"...Musbet mîllîyet, ji hewceyiya hundir ya heyata civakî tê. Sebebê alîkarî û piştevaniyê ye, qeweteke bi fêde peyda dike, dibe wesîtake ku biratîya Îslamê bi qewet dike.*

*Ev fikra musbet mîllîyetê, divê ku ji Îslamê re bibe xizmetkar, qel'e û zirx; ne ku bikeve ciyê wê. Lewra dinav biratîya ku Îslamîyet dide, hezar biratî heye; di axret û mezel de ew biratî sermedî ye, her dimîne. Jiber vê yekê, biratiya mîllî çiqas bi qewet be jî, encex bibe perdake biratiya Îslamê. An na, ku wê bêxe ciyê wê, mîna guhertina kevrê kelihêyî bi xezîna almasên kelihê ye; û avêtina almasa ye ku cînayeteke ahmeqane ye." (26. Mektub)*

## Hemîyeta dînî, an hemîyeta mîllî bi qewettir e, lazimtir e?

***Pirs:*** *"Hemîyeta dînî, an hemîyeta mîllî bi qewettir e, lazimtir e?*

***Cewab:*** *"Li ba me muslumana dîn û mîllîyet bixwe yekbûyî û yekbend in; di navbera wan de î'tîbarî, xuyayî, arizî cûdahîyek heye. Belkî,* ***dîn heyat û rihê mîllîyetê ye.*** *Wexta li herduka cihê û ciyawaz bê nihêrtin; hemîyeta dînî 'am û xas vedigre, belê hemîyeta mîllî ji sedî yekî re –yanî ê ku menfe'eta xweyî şexsî fîdayî millet dike– mexsus dimîne. Madem wilo ye divê di huquqa 'umumî û tevayî de esas û bingeh hemîyeta dînî be; hemîyeta mîllî jê re bibe xizmetkar, qewet û qel'e. Bi taybetî, xususen, em ehlê rojhilat ne wek ehlê rojava ne. Dinav me de, hissa dînî hakimî dila ye. Qederê ezelî bi şandina pirê enbîyaan di rojava de, dide nîşandan ku; bitenê hissa dînî ye, ya rojava hişyar bike û ber bi pêşveçûnê bibe. 'Esra se'adeta pêxember û a piştî wî ji vê re delîlê qet'î ne." (Tarihçe-i Hayat)*

## Mîllîyeta me Îslamîyet e

*"Ez, mîllîyeta me bitenê Îslamîyet dizanim, jiber wê, ez her tişti di nêrîn û çarçova Îslamîyetê de muhakeme û daraz dikim." (Tarihçe-i Hayat)*

*** Yanî Îslam; fi'l, lebat, 'adet û bawerîyên berya xweyî ne rast, jêdike, radike. (Buharî, Ahkâm: 4, İmâra: 36, 37; Ebû Dâvud, Sünnet: 5; Tirmizî, Cihâd: 28)**

**(Werger û Berhev: Necat ÖZDEMİR)**



# Bigre Şîret Nebe Sosret!

Gelî ehlê ğîretê! Guhdar, digrin şîretê... İnsan bi aqil e. Weka durra kakil e. Negre şîret, dibe sosret. Ew çax kul û keder, kerb û keser, davêje der... Xweda bistirîne, hizur dibe hesret.

Bav û kala, ap û xala, ev çend dewr û çend sala, dewla wan, ticar nemaye vala. Bi îman û namus, ticar guh nedane xwedênenas û deyyus...

İnsan li ba Xweda, pir hêja ye û bi şeref e. Lê jibîr bike rêya Xweda, çiqas heyf e. Ma jê re dimîne şahî û kêf e?

Heger kakila însan pûç be, eqlê wî ji kîsê Rumê ruç (ru reş) e. Jê re dibe terrî û boçe. Nikare deyne ser hev, çend kevir û kuç e. Dike pir 'eyb û suc e. Ya dibe ji ê kurtêl (mayina jiber xwarinê) û bertîla, yan jî dikeve nava zelîla...

Lê kakila însan, weka durra giran be qelbê wî jî, tije îman be, ji der û dora xwe re sermîyane. BerXwedar û bextîyarê du cîhan e...

Heyat weka seferê. Bi çol û çîya, di kar û gerê... Geh li ser rez û mehserê, geh li ser bexçe û bênderê. Ji nêz û dûr, nebe lome û qusur, hem jî nuha hem jî berê, **li wan teva gazîye, bibal pêxemberê serwerê.**

Gelî bira, tevî pismam! Dayka bi qîmet, xweha bi 'îffet û dotmam, gede û zarok, jin û zilam! **Şerefa me ye namus û îslam...**

Hey mam û metik, xal û xaltîk, qîz û berxik, gir û hurik, boz û reşik! Kurd û Zaza, 'Ereb û Tirk! Em musluman in, tune ferqik, qasî qirşik... **Bilindayî bi teqwa ye, ev kovar beyan dike xweşik...**

Gelî dost û kirîv, nas û ğerîb, meriv û cîran, rêwî û mêvan, digel me'zuban!(xweyê malê) Em bixwînin, bidin xwendin Quran.. **Mal û mizgeftên me, bi deng û sewtên Quran, çiqas xweş e heyran...**

Ey dengbêj û hozanê ber mîr; mêrê li deşt û zozana pir jîr, bav û bapîr, xwedî 'eşîr, çi dewlemend û çi feqîr! Nekin jibîr, Munker, Nekîr. **Heyat bi îslamê, xweş e wek şîr...**

Lo welatlîyu omîdno(kesên nas), lo hevalno, hogirno, maqul û camêrno! Hey cotkar û karker! Gelî azadperwer! **Em tev guh bidin pêxember, ew e ji me re rehber...**

Gelî bajarîyu gundîya, zaryê çîya û deştîya, ê liser erda, ser karîya! Dinav pel û pincar, ser tevnê bi teşîya. Kesê li 'eresê(ji cîyên esnfaê wek hev re tê gotin) ê liber derguşê, ê pez didoşê! Ey mervê ser boraqê, dew diklê dike rûn û toraqê. Ji dil û cîger, selam li we, merheba ji wer! Serxêrêbê kar û boraqa we. **Rêya Xweda ye xelasîya me...**

Ey kesê deng dighêje. Rê li xwe nekin dirêje, şîyar bin bi îslam. Nebin sergêje. Li we nebe seqem û cemed. Selewat bînin li ser Hezretî Muhammed, **rewşa eşqa pêxember e, ev kovara Kelha Amed...**

Soz, soza mêra ye. Dewran tim ê şêra ye. Xwe virde wirde nede. Azadî bi rêya pêxembera ye... Heyrana çava, şêrîna ber dilê dê û bava! Dîn û doza Muhammed, silh û silamet daye civat û millet. **Milletê musluman, jin û mêrê bi îman, hem mêr bûne, hem şêr bûne, bi namus û ğîret, diber îslamîyet.**

Zilamê bi fedî, bi Mecdî û zîvek; pîreka bi fedî, bi zêrê çend bar û bajarek... Mêşin nede bi bizina, genim nede bi kizina. Dosta nede bi bazina, dû re neke gazina... Cirr û bazara xwe, rast û xweş ke. Dost û dilxwazê xwe, şad û kêfxweş ke. Bira û meriva bipirse, li ser heqyê netirse. Gelî însana, xwedyê soz û wîjdana! Lixwe nekin serma û qeşem. Her duşem û her pêşem, bila 'emelê me, bi hiskirna Resulê Ekrem, derkeve ba Rebbê 'alem.

**Her bijî îslam û ummet, li we hemîya selam û hurmet.**

# MUNACAAT

*Xwedawenda! Tu Xaliq û Qedîm î*
*Bi halê min Besîr û hem ‘Elîm î*
*Tu sahib Rehmet û fedlê ‘emîm î*
*Bi ‘ebdê xwe ‘eta bexş û Kerîm î*
*Eger kerdim guneh esteğfîrullah*
*Bi sidq û bawerî hatim ber dergâh*
*Nih in min ğeyrê te ‘esla çu Ellah*
*Biğefrînî gunehê min Qedîm î*
*Wekê bê emrî zahir bu ji Adem*
*Girî û hem nezer da ‘erşê ‘Ezem*
*Muhemmed dî resulê tey mukerrem*
*Şefa’et kir bi wî tuhda selîm î*
*Bi heqê hurmeta navê Muhemmed*
*Bibexşî cumle ef’alê me yê bed*
*Du’aya ku dikem ya Reb nekey red*
*Tu Ğeffar î û Rehman û Rehîm î*
*Îlahî tu mukemmel key îlahî*
*Îman û sidqê min sahib gunahî*
*Biğefrîn î gunehan ê Sîyehpûş*
*Ji can ê muhbet ê key mest û bedhuş*
*Munewwer key bi rehmet ya Mumecced*
*Ji nurê me’rîfet qelbê Muhemmed*

*SİYEHPÛŞ*

**Xwedawenda: Ey Xweda yê Xwedyê hemu kaînat ê**
**Bed: Xerab**
**Bexş: ‘Efukirin, meğfîret**
**Mumecced: Bi şeref kirin, Bi medhê hatîye mezinkirin**



Jiyana Eshab

Muharrem Feqîr

# Ebu Ubeyde Bîn Cerrah

Bi navê: "Bawermendê ummetê" tê bîranîn. Ji ewwilê Misilmana û ji deh sehabîyê ku bi cennetê hatine mizgîn kirin e. Navê wîyî 'esil: Amîr b. 'Ebdullah b. el–Cerrah e. Ji qebîla Qureyşîya jî lawê 'Fîh" e.

Ebu Ubeyde bî da'weta Hz. Ebu Bekir yan jî di bin seroktîya Osmanê kurê Mu'az de çuye cem Resulullah 'aleyhîssalat û wesselam û Misilman bû ye. Resulullah 'aleyhîssalatu wesselam ji bo wî weha gotîye: **"Bawermendê her ummetê heye, ê ummeta min jî Ebu Ubeyde b. Cerrah e."**

Ebu Ubeyde jî wek wan sehabîyen mezîn bi Resulullah aleyhîssalat û wesselam re ketîye tevê cenga. Di herba Uhudê da dema kumzirxê pêxember Sallallahu 'aleyhî we sellem, di arguşka wî de çûbu, Ebu Ubeyde bi diranê xwe ew cîyê ku di arguşkê de çubu derxist. Gava derxistîye diranê wî yî beş ketin e.

Di tevê herban de merxasekî serxwere bû. Bê çawa di hemû herbande li cem Resulullah aleyhîssalat û wesselam cî girtibû bi wî awayî di fetha Mekkê, dor lê girtina Taîfê û Hecca xatirxwestinê de jî li cem Resulullah aleyhîssalat û wesselam cî girtibû.

Di zemanê Hz. 'Umer (Xweda jê razî be.) de ji bo cî û wara fetih bikin, bi artêşê re bi alîyê Surî ve çu. Di artêşê de fermandar bu. Di fetha: Bîsan, Taberîye, Baalbek, Humus, Hama, Şeyre, Maarra, Lazkîye, Antarîus, Banyas, Selemîye, Halep, Antakya, Menbîc, Delul de hebu ye.

Di sala 634an de li hember artêşa Împaratorê Roma Herakleîus bi tevî hêzê Yezîd b. Ebî Sufyan, Şurahbîl, Amr b. El–Ab û Xalid b. Welîd re li "Ecnadînê" şer kirin. Di vî şerî de Misilmana sê hêzar şehîd dan û ev der fetih kirin. Dema Şam dor lê girtin Ebu Ubeyde di derîyê Cabîye de êrîşî bajar kir. Xalid kurê Welîd jî ji wan alîyen dîn ve êrîş kir.

Bi fillehê Şamê re aşîtî kirin û bajar bi dest xistin. Di sala 635an de herba Fahlê derket. Artêşa Romayê sê çar qatê Misilmana bû. Berîya her du artêş werne miqabilî hev, qasidê Romayê ji bo şertê aşîtîyê biştexilin heta qerargaha Misilman a. Piştî het pêşnîyarî ya Romayîya got: "Heger hun ji 'erda Roma derkevin emê zêra bidne we." Ev pêşnîyarî Ebu Ubeyde qebul nekîr û şer derket. Şer Misilmana qezenc kir.

Di sala 635an de Humus hate fetih kirin. Ebu Ubeyde gelek cî bê herb û şer, bi aşîtî bi dest xist. Di sala 636an de Herakleîus artêşeke pir mezin dahev û berê xwe da Surî. Ebu Ubeyde jî ji fermandarê der û dora xwe re name nivîsandin û gazî wan kir. Namekek ji Hz. 'Umer re jî şand. Qerargaha xwe li Yermukê bicî kîr. Herbeka pîr mezîn di navbera wan de derket. Bi alîkarîya Xweda misilmana, zora artêşa Roma birin.

Hz. 'Umer di sala 638an de Xalid b. Welîd ji serfermandarîya artêşê dûr kir û ji dêlva wî ve Ebu Ubeyde ta'yîn kir.

Li Surî nexweşîya webayê derket û Ebu Ubeyde jî di vê nexweşîyê de wefat kîr. Mezelê wî li Şamê ye.

Ebu Ubeyde, sehabîyekî pir mezin bû. Xwedî zuhd û teqwa bû, mêrxas, cengawer û 'adil bû.

Gorî dibêjin, merivekî ne dirêj û ne kin bû, rukî wîyî xweşik hebu, aqilmend û bî merhamet bu. Dema li Şamê walî bu, ehlê Şamê jêr digotin: **"Mîrê adil."**

Îbrahîm Berzencî

# Kaniya Hêzê (Qewetê) û Xurtbunê

Pir cara –wek şaş tê zanîn– qewet; ji pirbunê, yan ji çek û mal û perê pir nayê. Kanîya hêzê tiştnî dine. Ev tişt jî ne girêdayiyê bi pirbunê ne. Ji bo vî awayî Xwedayê Te'ala di Qur'an'a pîroz de gotiye:

*"Gelek qewmê hindik bi izna Xweda zora qewmê pir birin e."*[1]

Ev qewmê hindik çawa zora qewmê pir birin e, qeweta xwe ji kû sitandine? Em dixwazin li ser va tişta bisekinin. Bi rastî va tiştana pirin. Em nikarin di vê xebata xweyî kurt de teva bêjin. Lê belê li gorî xwe, ê muhimê wan emê binivîsin, înşaallah.

**1–Biheqqî Hêze/Qewete:**

Qeweta herî mezin ku meriv li ser heqyê be. Tiştekî meriv tunebe û dinya tev jî dijminê meriv be, dîsa jî ku meriv li ser heqyê be meriv ji dijminê xwe bi qewettir e û xurttir e. Çimkî heq bi tenê xwedîyê xwe mezin dike. Neheqî jî timî daîm kanîya qelsiyêye.

Tiştekî zêde muhim jî; ku meriv bawer bike meriv li ser heqyê ye. Ev bawerî jî pir muhim e û qewetek zêde dide meriv. Lêbelê çiqasî meriv li ser heqyê jî be, ku taswas di dilê meriv de hebe û meriv bibê belkî jî em neheqin. Ev hal qeweta meriv dibe û meriv pir qels dixe.

**2–Yekîtî Qewete:**

Yekîtî û tifaqî ji kanîya qewetê ne. Çiqasî yekîtîya meriv hezkirina meriv dilrahmbuna meriv ji hev re zêde bibe qeweta meriv jî ewqasî zêde dibe. Çawa kû Ûstad Bedîûzzaman –Xweda rahma xwe lêke– gotîye: **"Çar însan bi tenê bin, qeweta wan qasî çar heba ye. Lêbelê çi wexta vana bên cem hev û qeweta xwe bikin yek, milê xwe bidin hev, qeweta wan ji hezarî dersbas dike."**

Çawa kû yekîtî qewete bi mîna vî şiklî bêtifaqî û tenêbunî jî ze'îfî ye. Qewmekî bêtifaqî têkeve nav wan qeweta wan û heybeta wan dere, tirsa wan ji dilê dijminê wan derdikeve. Wek tizbîya benê wê qetyayî ji hev bela wela dibin. Li ser vê bahsê di suretê "Enfal" di Xweda ê Te'ala di vê manê de gotî ye:

***"Îta'eta Xweda û Resulê Wî bikin. Bêtifaqî bira ne kevi nava we. Dawyê wê tirs têkeve dilê we, heybeta we here, wî wextî sebir bikin. Bê guman Xweda bi wan kesê kû sebirkara re ye."***[2]

**3–Exlaqîtî Qewete:**

Exlaq qewetek wusaye kû însan tenê bi exlaq dujmina ji xwer dike dost û bê tanq û topa dewleta fetih dike. Meriv li sîyera Resulullah 'aleyhissalat u wesselam dinêre, meriv dibîne ku gelek însan hew ji bo exlaqê Wîyî mezin Müslüman bune. Sehabê Wî jî di exlaqde li pey Wî diçun. Însanê bi dujminantî dihat nav wan, çi wexta ew exlaqê mezin ji wan temaşe dikir, hema li wir îman tanî û ji wan re dibu dost û heval.

Di vê mijarê de Hz. Yûsuf 'aleyhisselam jî ji mer mîsalek mezin e. Çimkî wî bê herb û bê leşker hew bi exlaq û 'îffeta xwe welatê Misrê fetih kirye û buye mezinê wan.

**4–Sebr û Hêvî Qewete:**

Kanîya qewetê yek jê jî sebr û hêvîye. Li ser ruyê erdê tiştekî rihet tune. Di her îşî de zor û zehmetî heye. Însanekî talibê îşe mezin be û bibê: "Gerek ez zehmetyê jî nebînim" ew nikari tu îşî bike. Zehmetya mezin jî li gorî îşê mezine. Madem lazime îşê mezin bê kirin û îşê mezin jî pir dijwarin, wî demî sebr lazim e, belkî ferz e.

Dujminê meriv jî însanin. Ê wan jî sebrek wan heye. Ku sebra meriv bê ber qedandinê gerek meriv zanibe sebra dujminê meriv jî hatîye ber qedandinê. Di vî hawayî de kî hebkî di sebir bike ewê biserkeve.

Ê sebrê dide însan jî hêvîye. Hêviya însan çiqas zêde be, sebra wî jî hewqas zêde ye. Lê bê hevîbun mirin e. Ê hêvîya wî tune be, sebr û tebata wî jî tune.

**5–Xwedî derketina li nefsê qewete:**


Dujminê herî ğeddar ji însan re nefsa wî ye. Însanê karibe bi nefsa xwe, kare bi her tiştî. Însanê li pey nefsa xwe here ew nikari bi tu kesî. Ji bo vî hawî xwedî derketina li nefsê qewet e. Çawa ku Resulullah 'aleyhissalat û wesselam gotî ye:

*"Ê bi qewet ne ew kesê di pêlewanîyê de ê li hemberê xwe tavê, lêbelê ê bi qewet ew kese ku gava hêrs bu, karibê bi hêrsa xwe."*

Bêgoman qewet ji gelek tiştê di jî derdikeve. Lêbelê me ê muhîm ji wan rêzkir. Lazime em vêya jî bêjin; ku vana tev me li gorî 'alema sebeba nivîsand. Vana misilman, kafir kî xwe biwan bigre wê biser keve û wê xwedî qewet be. Lê ji bo misilmankî qeweta mezin bi tevlî vana bawerîya û spartîya Xweda ê Te'ala ye. Emanetê Xweda bin.



1. Beqere: 249
2. Enfal: 46



# Dil Got!

Jiyan
Selamîyê Bilêderî

✔ **Ma dujminê min dikarin çi bikin ji min? Ez cenneta xwe û gulîstana xwe di dilê xwe de hildigrim. Ez bi kû da diçim daim li ba min û kêlîkê ji min naqetin. Ji ber vê yekê hepiskirina min xelwet, kuştina min şehadet, û nefya min î di riya Xweda de jî Hîcret e.** (Îbn-i Teymîye)

Şevek tarî, şevek ji şevê gulanê... Ber paca zindanê rûniştim. Min bi hasinê pacê girt û li asîmana temaşe kir. Dil got û çav bersiv da. Min bala xwe dayê dil weha di got: Negrî û mehzun nebe! Ayeta: “La tehzen” heye. Belê ciwanîya te, di zindanê tağut de derbas bû, te hicret û cîhad û perîşanî dît, ‘emr di zindanê de derbas kir.

Buhar hatin û çun, te gul û nêrgis, bukik û giyakî şîn nedît. Gelek sal derbas bûn, te zaruke xweyî şêrîn û bêrî ji xeynî çend carê bê rumet nedît. Belê her çigas te derd û kulê giran dîtin, wan belayê ku pişta dişkînin hatine serê te... Te por û rih sipî kir, buyî mîna pîra. Belê dijmin cezayê bêdawî daye... Dîsajî ey dil! Ti negrî û zîz nebe, ji bo çend rojê dinya gewrik.

**Çavê min!** Ti hestira nerjîn e ji bo xemlên dinyayê. Berê xwe biguhrîne ji mehbubê fanî... Berîya ku ew bejine te: **“De bi xatirê te.”**

**Dil got:** *Mehbubê heqîqî Rabbê Wedud û Resulê şêrin e. Ew dost bin her tişt û herkes dost e. Xelata dostanîyê teqwa û bela ye. Lêbelê ev armanc gelekî zor û zehmet e. Lewra cennet buha ye.*

**Sitêrkên asimana dinêrim...** Li hespê xeyala suwar bûm û çum nav ‘esr û dem û qewma... **Ey dil!** Ez xortekî pîr im. Nivmirîyekî bê kêlik û bê zîyaretwan im. Bela û musîbetê ku têne serê ummetê, pêşî dibare ser dilê minî hêtun. Qêrîn dikim bê deng... Malbatê şehîda û ê Yusufîya! Sebr bikin û serê xwe bilind kin da ku hun bibin cînarê pêxember (Sallallahu ‘aleyhi we sellem)

**Ez ji warê Yusuf, Rabbanî, Seyyid û Saîda gazî dikim.** Bigrin bi werîsê Xweda! Bigrin bi teqwa û heya! Bi rojî û şev limêja û sinneta senîyya Pêxember... Hingê wê milyaket destê we bigrin di her tengasî û zehmetîya de.

**Ey dil!** Her çigas dil carna hêtun, çav kanî be jî, hizn û tirs tine ji te re bi delîla ayêtê. Çavê te ronî be! Lewra nêz bûye hatina Mehdî! Nêz bûye qiyama Kurdê Îshaqî ku heftê hezar leşkerê Mehdî ne...

**Qêrîn dikim bê deng!** Mehbubê fanî derxe ji dilê xwe. Dil dibêje çavê xwe berde şehadetê û axretê. Belê te li dinyayê wefa nedît. Pêşîya gotin e: **“Zêrînger bi qedrê zêra dizan e.”**

Xozka gulleyek weke gulekî di sînga min de û bê kefen di hemêza axa hênîk de buma. Ne kêlîkek hebuna ji min re û ne cîyek. Tenê rehm û hez kirina Rebbê ‘alemê li ser min buna. Laşê min perçe û bela jî bûbûna jî ne xem... Zîfaf e lewra... Wusleta yarê ye... Şeb-î ‘erûs e... Xilasîya ji guneha, kul û derdaye, şehadet...

**Min got, dilo!** Ez şagird ê Rîsalê Nûr im. Daîm xwendavanê Lem’a bîst û şeşa me... Carna jî ê bist û pênca... Şagirdek ji şagirdê Medresa Yusuf im. ‘Ahd û soz dayê bi Rabbê ‘alemê re xelat bidim canê şêrin. Ser soz û ‘ehda xwe me, heta şehadetê.

**Biya nefsê neke û ji bo dinyayê negrî!** Lê ji bo axretê ji ber gunehê xwe bigrî. Hizna min ne ji bo xemlê dinyayê û dûr ketina ji wan e. Ji ber surguna dirêj e. Dur ketina ji şehadetê û mehbubê heqîqî ye. Lewra musîbetê dinê di rastîyê de ne musîbet in. Ew xelata Rabbê ‘alemê ne. Car car jî balkeş im ji bo şîyar bûnê.

**Çavê min!** Ti bibe kanî ji ber ku rê dirêj e. Him tevlî vîya gunhê te zehf in. Sekerat, mirin, gor, heşr, mîzan û sirat tev hene û tê teva bibînê. Ka bê şehadet tê çawa xilas bibe ji gunha? Van astenga tê çawa karibe derbaskî? Tevlî wan ‘emelê xweyî bê îxlas...

Malxirabokekî hêvîdarê Firdews û ‘Edn im. Yusufî û him Ya’qubî me... Dîsa jî hestirê çavê min ne ji hesret û fîraqa zaruk û malbata min e. Lewra ew dinyaya ku ez meftunê wê me ji destê min çuye, destê min nagîjîyê. Ji lewma hestirê çava ji bo Firdewsê û meskunê wî dirjîn im. Hevî ya min heye ku Rabbê ‘alemê gunhê min ‘afu bike û ji min nexeyîd e.

Ku Ew dost be, her tişt û herkes dost e. Ew ne dost be herkes û her tişt neyar e. Bi teqwayê bigre da dinya te jî û axreta te jî ava û xweş bibe. Her wext bê tirs û bê keder, bikêfxweşî û mehbub be.

Ferzan Muhammed

# Werin Em Herne Ber Pez!

Berxikvan, golikvan yan gavan... Tev şivanin... Piştî me wezîfa şivanîyê barkir û fahmkir, êdî lazim e em herne ber pez. Lewra şivan bi pez şivan e. Bi pez û bi bez... Hêj tav neavêtîye lazim e em pezê xwe derxin çêrê. Li cîyên şînayî bigerin... Belê em zanibin ku hemu cîyên şînayî ne jiboy çêrandinê ne. Mînak tu bixwaze, rez... Rez ne jiboy çêra pez e... Gundên Kurmanc a bi rez xweş in. Ji lew gotine: *"Gundê bê rez, konê bê pez, mirovê dibê ez û ez. Hemî bi kêrî tiştek nayên."* Bes, gelê me fahmkirîye ku bi rez gund, bi pez kon û bi durîtîya ji gotina "ez" mirov ava ne.

Şib be, ço be, yan gopal be; bidestê me... Kulavê me li piştê, xwarina me di nav hevan de li ser mil, seyê me li ba me û pez li pêş... Carna emê bêjin "Birr" û pez bimeşînin, carna emê bêjin "Ha! Ha!" pez vegerînin... Em şivanin û li ber pezin...

Belê... Şivanê nan helal, xweyî edeb û jêhatî, wezîfên xwe jibîr nake. Lazimîyên xwe hildigre, kerîyê xwe û dijminê kerî nas dike...

Carna dibe ku şivan bimîne şevîn ê. Heta dawîya Gulan ê, kerî sibehan dertê evaran vedigere. Piştî Gulanê, êdî şivan tevlî kerîyê xwe li çîya dimîne. Ji çêrîna şevê re "şevîn" tê gotin. Şivanê me dijminê xwe û wezîfa xwe di şevên tarî de jî, jibîr nake. Lewra kerî emanet û sparte ye jiboy wî. Ji lew şivan di şevîna de dema radizê bi pizbendekî stuwê beranekî bi tilîya pîyê xwe ve girêdide. Jiboy dema ew di xew de be, kerî here yan gur êriş bike ew beranê bi tilîya wî ve girêdayî wî şîyar bike.

Bi şev û bi roj... Em şivanin... Kerîyê me sparte ye. Wezîfa me giran e. Lê em nanê xwe bi vî karî dixwin...

Êdî lazime, em berê xwe bidin xwe. Li vê tewsîyê baş guhdar bin: *"Kesên pezê xwe di sînorê bağ û bexçên xelkê de biçêr e, ew ê pezê wî bikeve wan cîya."* Evêna gotina serdarê şivana Hezret-î Muhemmed e. Salât û selamên Xweda, bi qederê muwê mî û berxikê cîhanê lê bin... Li gor Beşîr ê lawê Nu'man gotîye, Resulullah (salallahu 'eleyhî we sellem) wiha ferman kir:

*"Helal eşkere ne. Heram jî eşkere ne. Di navbeyna herduya de hinek tiştên gumanbar û bi şubhe hene ku, pirê însana wana nizanin. Kî xwe ji tiştên gumanbar biparêze, namus û dînê xwe mihafeze dike. Kî bikeve van tiştên gumanbar, dikeve heramîyê. Ev, wek mesela şivanekî ye; ku kerîyê xwe li dor tixubê qedexe diçêrîne. Her gavî dibe ku kerîyê wî bikeve cîyê qedexe. Miqate bin! Ji her siltanî re tixubek heye. Bizanibin, tixubê Xweda heramî ne."* (Buxarî û Muslim rîwayet kirine)

Emê li vê tewsîyê miqate bin û pezê xwe li sînorê xelkê neçêrînin. Lewra heqê me li tu kesî tuneye. Şixwe şînahîyên Xweda pirin. Ne lazime em pezê xwe li dora bağ û bexçê xelkê biçêrînin. Her wekî Seydayê Bedî'uzzeman gotîye: **"Çarçova helalê besî kêfa meriye."** Belê! Cîyên bi helalî pezê me tê de biçêre pirin û besin. Lazime em çavtije bin. Helal nesîb bin... Li heq û mafan miqate bin...

**Şivano!** Heyat, dinya û her tiştê dinyayê ku Xweda dane te, sparte û emanetin. Jiboy wezîfe û ceribandinê hatine dayîn. Lazim e tu wezîfa xwe baş bizanibe. Di karê xwe de şareza be. Wexta tu Jiyana xwe bidomîne lazime li heramî û qedexîya miqate be. Ji sînorê heram û qedexîya xwe dûr bike. Da ku tu nekeve heramîyê.

**Şivano!** Siltan û Xunkarê kaînatê her Xweda ye. Wî jî, ji xwer sînor danîne. Tu jî, di milkê Xweda de şivantîya emanetê Xweda dike. Li sînorê rebbê xwe miqate be. Emanetên wî dane te mihafeze bike.

**Şivano!** Dema tu, di kar û wezîfa xwe de, zana û şareza be, lazimîyan pêk bîne, ji heramîya xwe biparêze, wî çağî zanibe ku li dinya û axretê tê di şahîyê de be. Ew ê rebbê te ji te razî bibe...

---

**Gavan** : Büyükbaş hayvanların çobani
**Berxikvan** : Kuzularin çobani
**Golikvan** : Danalarin çobani
**Ço** : Çubuklarin genel ismi
**Şiv** : Yün çirpmada da kullanilan, ince ve uzun sopa
**Hevan** : Çobanin yiyecek torbasi
**Şevîn** : Çobanin geceleri sürü otlatmasi
**Pizbend** : Şivan dema diçin şevînê beneki bi piyê xwe û bi stûwê beran ve girê dide. Navê wi beni Pizbend e.
**Şareza** : Uzman, bilinçli
**Gumanbar** : Şüpheli



Abdulbaqî Botî



# Dewra Berê

*Îro emê pelekî ji pelên dema derbasbuyî bînin ber çava. Ka gelo dewra berê? Dewra camêrî û mêrxasîyê, dewra edeb û me'rifet ê, dewra naskirina mezin û biçuka, dewra hurmet û hezkirinê... Ka ew rêzik û 'edet ên berê çima winda bûn. Me çima terikandin. Ma çima em dibêjin aax!!! Xwezika dewra berê? Dewra berê çewa bu? Ma dewra berê pir xweşbu?*

*Ez dixwazim divê derbarê de hinek pirs ji dayika xwe Hacera bikim. Da ku cardin me bibe wê dewra ku hizur û dilxweşî tê heyî.*

**Dayika berketî û pir bi hurmet! Ka ez dest û piyê te maçu bikim. Eger tu nerahet nebî, ji kerema xwe hinekî behsa jiyana biçukatîya xwe bike.**

**Lawê min ka ezê çi bêjim. Çaxê em biçukbun kul û ğemên me qet tune bun.** *Xew* **a me,** *xwarin* **a me,** *xebat* **a me... Tev ji me re weka lîstikê bun. Dinya me tev qeysê dîtin a çavê me bu. Dinya; bes mala me û gund ê me û derudorê gund ê me bu. Dema me ne wek niha bu. Niha ji kêmasî her kesi deh qat cil hene û pirê wan, moda wan derbas bûne û avêtine goşeyekê malê. Zemanê me; yek kirasê me hebu ew jî heftê carek me dişuşt û şil û zuwa ew li ber me bu û heta bihata pînekirin jî, me pîne dikir û çağê êdî nehata pînekirin; wê çağê me dişêland û tije pap dikir û me dikir balgih û mînder.**

**Niha her kesê gora demsalê û gora modayê pêlavên wan ên xweşik hene. Wê çağê pêlavên her kesî tinebun, ji bu 'îş û kar ê nava malê û yê nava gund; em tev pêxwas digeriyan. Pêlavên wê çağê jî ne wek yê niha bun. Jibo zivistanê çarox; ji çerm ê dewara çêdikirin, jibo havinê jî reşik çêdikirin. Reşik jî ji caw û ji potika çêdikirin. Yê karê derve û karê zehmet dikirin wan ji van pêlava têxistin piyê xwe. Paşê pêlavên lastîk derketin hem seğlem û hem jî gor çarox û reşika pir rahet bun, niha êdî kesek pêlavên lastîk jî naêxin pîyê xwe.**

**Zemanê me, lemba gazê jî tunebu. Ji darika xetîre çêdikirin, şev xetîre pê dixistin û karê xwe yê şevê li ber ronahiya xetîrê dikirin. Paşê çira zeytê û paşê jî lemba gazê û fanus derket.**

**Di her malê de bixêrî hebun. Li vê bixêriyê de agir dihat kirin hem mal pê germ dibu, hem pê roni dibu, hem jî nan û xarin li ser agirê bixêriyê dihat çêkirin. Lê belê ji dumana bixêriyê her daim mal reş û tari bun.**

**Rojekî bavê min ji bajêr sobeyekê têne, gundî tev têne temaşe dikin. Dibên Seyda ev çiye te anî? Bavê min dibê eva sobeye, têde agir tê kirin. Gotin "Seyda her derê wê girtiye wê çewa malê germ bike?" Bavê min sobê tije dar dike û agir pê dixe, derhal dibe gorme gorma agir û sobe sor dibe. Herkes heyirî dimênin û dibêjin eva êdî 'elametê qiyametê ye.**

**Rojên we çewa derbas dibun? Yanî rojekî de we çi îş dikir?**

**Hêj mela banga sibê nedayî, bi banga dîka em şiyar dibun. Me dest bi xebatê dikir. Ewil ji bu taştê û ji bu derûdor ronî bike ew agirê ku me bi êvarê binxwelî kirî da; ku em bê agir nemênin derdixin û**

agirê xwe pê geş dikin û dîzika nîskê datênin ser êgir. Piştê nimêja sibê çêlekên xwe didotin û heta we taştê çêdibe. Piştê xwarina taştê; karê rojê hêja despêdike. Derûdor hê ronî nebuyî her kes diçe ser 'îş û karê xwe. Yê diçe ber *pez* û yê diçe kolana *rez* û ye diçe cot... Her kes seferberê 'îş û karê rojê dibe. Yê şîr ê xwe *dimeyand* û yê mastê xwe *dikeyand* û yê dew ê xwe *dikeland* û yê penîr û toraq li kîs dikir...

Jibu nanê firavînê me hevîr dikir û jibu firavînê jî agirê xwe pê dixist û *mehir* yan jî *şorbeşîr* dida ser êgir. Paşê derûdorê malê dimalist û paqij dikir. Em diçon kaniyê me av tanî, firaxên xwe dişoşt. Em diçon tenurê me nan dipeht. Me firavin dibir ji pale u cotyara re. Li çolê jibu tenurê me darik û qirşik berhev dikir û li ser milê xwe me tanî mal... Jibu şîvê me agir dikir û girar çêdikir.

*Êvarê herkes ji 'iş û karê xwe vedigere mal, hêdî hêdî tav şewqa xwe winda dike. Selteneta rojê namîne û siya êvarê dirêj dibe û dimeşe li ser gund.*

*Dem dema şivê ye. Lê iş hê neqediya ye; êvare û vê sa'etê jî pez û dewar ji çolê tên û dikeve nava gund. Li aliyekê barebara çêlek û golik ê li aliyekê kalekala bizin û mihik ê li alîyekê zarezara karik û berxik ê li aliyekê jî zirezira kerê boz û cehşikê... Ev aheng û mûzîk; tu dibê qey mihrîcana heywanaye û dengbêj û hunermendê wan tev bi saz û awazên xwe ên coş jibu pêşbaziyê derketine sahneyê û hunerên xwe pêşan ê temaşevana dikin.*

*'Îş û karê ji tarîtîya sibê û heta niha li aliyekê; 'îşê vê demê li aliyekê. Lewra wext pir tenge. Şev hino hino tarî dibe. Hinek dibên bizna mi nehat, hinek dibên golika mi nehat... Bi vê gelcê de wextê nimêja mexribê ye, şiv û nimêj û 'îş li hev digencile. Bav dibê "Lawê min! Em şîva xwe bixwin da ku em rahet nimêja xwe bikin" Law jî dibê "Bavo! Em nimêja xwe bikin da ku em rahet şîva xwe bixwin."*

*Bi vî awayî roj û hefte û meh derbas dibin; lê belê qet 'îş û karên gunda xilas nabin.*

**Ji kerema xwe hinekî behsa karên demsalî bike.**

Biharê em diçon li çolê kereng, kidark, soryaz, karî û pir çeşîdên din ji pincara çolê me tanî, dikir şîv. Bi vî awayi ji serê biharê heta bihar xilas dibe her roja em diçon çolê me giyayên xwarinê tanî û yê zêde ji me hişk dikir jibu zivistanê.

Em diçon çolê me giya û çilo tanî, jibu heywana.

Havinê em diçon axkendê me axa sipî tanî û dîwar pê şexif dikir. Wê çaxê boyağ tinebu bi axa sipî dîwar dihatin sipîkirin. Hineka salê du cara dîwarên xwe şexif dikirin.

**Em diçon avdaniya bexçe û aşêvê.**

Çağê ce zer dibun, 'îş û karê bêndera destpêdikir. Çağê 'îşê bêndera destpêdikir; edî qet'î sekin tinebu ji me ra. Weke her wextê, me 'îşê malê jî dikir û



'îşê zeviyê û 'îşê bênderê ji me dikir. Em diçon dirutina nîsk û nohka û li bênderê me gêrevanî dikir û bênder dida bayê û serad û bêjing dikir û ka dikişande kadînê. Hê 'îşê havinê ne qedihayî, payîz tê. Payîzê 'îşê reza destpêdike. Li aliyekî dims, li aliyekî bastîq û benî, li aliyekî jî mewîj tên çikirin.

Ji buna pez, em diçon çilobirê em diçon gihîj û hermîyên çolê. Em diçon mazî û gilola. Carna gezo dibarî her kes diço gezo. Berê gezo pir dibarîya.

Çağê dibe zivistan 'iş û karê me sivik dibe, lewra *ar* ê me *dar* ê me *kar* ê me tev di mal de ye.

**Wey din we çi 'îş dikirin?**

Ji xwe tu carî 'iş nedqediya. Heftê rojekî em diçon beravxanê me ser û cilên xwe dişoştin. Sabuna kizwana hebu ew jî pir kêm bu. Xweliya dara me dixis ava kelî de bi wê avê me cil dişoştin. Di mala de av tinebu. Lewra herkes diço beravxanê.

Me hirî û mu, bi teşiyê dirist, gore û luf û kilîm û ber û cuwal û tûr û werîs jê çêdikirin. Cilên xwe me tev bi dest didirutin.

**Gotina we ya paşîn ji me ra çîye?**

Wê çağê her kesî pere tunebun. Yê maldar jî perê wan zêde tunebun. Buna vê bexîltî jî tunebu. Her kesê alîkariya hevdu dikirin. Biçûka hurmet ji mezina re digirtin. Rêzik û 'edet hebun, herkesê gora va rêzik û 'edeta jiyana xwe berdewam dikirin.

Xuda ji te razî be...

---

**Kiras:** boydan elbise
**Şêlandin:** dikmek
**Pap:** kepek
**Balgih:** yastik
**Demsal:** mevsim
**Pêlav:** ayakkabi
**Çarox:** çarik
**Reşik:** kalin bezden ayakkabi
**Caw:** pamuklu kalin bir bez
**Xetîre:** rahat yanmasi için boydan boya ezilen çubuk
**Dîzik:** çömlek
**Demsalî:** mevsimlik
**Girar:** pilav
**Mihrîcan:** Festival
**Pêşbazi:** yarişma
**Pêşan:** sergi
**Axkend:** beyaz toprak ocaği
**Şexif:** badana
**Bênder:** harman
**Gêrevanî:** harmancilik
**Gezo:** kudret helvasi
**Beravxane:** çamaşirhane
**Bixêri:** şömine

Cevdet Karaman

Hevpeyvînek



# Bi Şêx Sadiyê Şîrazî re

Bi navê Xwedayê Rehman û Rehîm

Gelî xwendevanên hêja! Me di dil da hesrete suhbeta zana û 'alima. Em bawerin ev hesret, hesreta dilê we ye jî. Ji ber vê hesretê, em ketin nav pelê dîrokê û çend qirn bi paşve çun. Me hevpeyvînek bi Şêx Sadiyê Şîrazî re di Gulistana wî de lidarxist. Ku ew Gulîstan tije binevş, reyhan û beybun bû.

Bi rastî em em bi vê suhbetê gelek kêfxweş û dilşad bûn. Lewra me ji bereketa vê suhbetê pir istifade kir. Û em noqi behra 'ilmê Seyda bûn. Me ji wê behrê bi qederê hêza xwe hinek durr u mercan deranî.

Şêxê hêja cewabê her sualek me bi çîrok û bîranînek xwe şirove kir. Me dît ku Şêx behra 'îlm û 'îrfan e. Hem jî gelek ders û şîret di vê suhbetê de civîyane. Me biryar da ku em vê hevpeyvîna xwe pêşkêşi we jî bikin. Me umîde hunê jî dilşad bibin, ji vê suhbetê ders û şîreta dûrr û mercana derînin. Keremkin Gûlîstan a Şêx Sadi guh bidin şêxê delal. Dîwan xweş serekê dîwanê Şex Sadîyê sûret xweş û sîret xweş e. Keremkin...

**Şêxe delal! 'Ewil em selam, hurmet u muhbeta xwe pêşkêşî te û hemi 'alim û 'arifa dikin. Em dixwazin te bi kurtejîna te binasin?**

"Sadî" leqeba min e. Navê min ê eslî "Ebû 'Ebdullah Muşerrîfuddin bîn Muslîm eş-Şîrazî" ye. Bi rastî ez bi xwe jî diroka welidandina xwe nizanim. Lewra di dema me de diroka welidiyê ne muhîm bû. Jixwe jînenîgariya hemi hevçağên min jî li gorî texmîna ne û nêzîk dîrok in . Bi texmin diroka ji dayikûna min nêziki 1213ê miladî ye.



Bajarê me Şîraz bajarek ji welatê Îranê ye. Min tehsila xwe ya ewil li wir qedand û paşê ez jibo tehsila 'ilmê derketim ğerîbiyê. Min li Beğdayê di "Medresa Nîzamiyê" de tehsila xwe domand. Çawa ku hun zanin, 'alimê hêja nivîskarê îhyayê Îmamê Ğezali jî, hem şagird û hem ji mudderrîsê vê medresê ye.

Piştî tehsîla Beğdayê xerîbî u ğurbet bu para min. Ez ketim kolan û bajara. El Cezire, Anadol, Bajarê Amed, Surî, Şam, Misir, Merakeş, 'Ezerbeycan, Belh, Ğezne, Pencap, Gucerat û gelek bajarên din bun war û meskenên min. Min di van bajaran da gelek kes naskirin, tecruba min zêde bu. Min ew tecrubê xwe di "Gulistan" û "Bostan" a xwe de pêşkêşi we kir. Hêvidarim hunê jê istifade bikin. Kurtejîna min ev e: ger û ğurbet, xebat û tecrube... Ka ez çi bêjim. Ez dibêm jibo gotubêjek kûrt evqas behsa jînenîgariya min bes e... Ma ne wilo ye?

**Seyda Xwedê te'ala ji te razî be. Însan carna hêrs dibe. Û bi hêrsê, karên neqenc jî dîke. Gelo mirov di wexta hêrsê de çawa dikare bibe mani'ê xwe û hifza xwe ji neqenciyê bike. Em hêvidarin tu di vî warî de li me we'z û şîreta bikî.**

Rehma xwedê te'ala li dê û bavên we bit. Bi rastî ev halêkî pir zor e. Lê heger mirov dawîya hedîsê bi ram e. Mirov dikare hifza xwe ji neqencîya bike. Çawa bi kibrîtek dehlek tê şewitandin. Her wiha carna bi neqencîyek mirov jî semera temami qencîyên xwe muflis dimîne. Şîrova vê meselê di vê çîrokê de veşartiye. De guh bidêrin. Da ji we re bibêjim.

Dibêjin Hukumdarê welatekî rojek pir hêrs buye. Û di pozê xwe de pîşkaye. Bi Wê hêrsê kuştina mirovek bê guneh ferman kiriye. Dema ew mirov ber bi kuştinê ve birine wî mirovî ji hukûmdar re gotiye: *"Padîşahê min! Bi vê hêrsê neqenciya te bi min nine, bi te ye."* Hukumdar heyirî maye û gotîye: *"Tu çi dibê. Ev çawa çêdibe?"* Mehkûm ê mirinê: *"Ger tu min bikujî ezê carek bi êşim û janê bikşînim. Dê paşê êş û jan wê li min vemirin. Lakîn heta 'umrê te rojek li dinê hebe, tu dê bi êş û jana min bijî. Û êş û jana min dê dilê te bisoje. Hem dê toqa êş û jana poşmaniyê heta bi hetayê di ustuyê te de daleqandi bimîne. Wey li te û li vî karê te."* Tesîra van peyva zêde li hukûmdar çêbûne û ew kes bexşandîye.

*Jîna li dinê zû di buhure wek bayê li çolê*
*Qenc û neqenc baş û nebaş tev diborin*
*Zalim dibê qey zulmê dikit li mezlûm*
*Zulma li mezlum dibore û radibe ji holê lakîn*
*Di ustuyê wî de dimînit toqê zulm û zordariyê*

**Xwedê te'ala ji te razî be Seyda. Halê herî baş ji bo mumina çîye? Em di vî warî de gelek muhtacî we'z û şîretên we ne. Lewra em di qirnekî pir dijwar de dijîn. Ku neyarê me di vê qirnê de pir zêde ne. Cehalet, feqr u zarûret...hwd.**

Rehma xwedê li dê û bavê we mumina bibarit. Ez dikarim bêjim ku karê heri qenc ji bo muminê zana û aqilmend her ev in: Meşgulîyeta bi 'îbadet û ta'etê ve, xwendina 'ilm û 'îrfan, teqwa û ixlas. Bi wî şerti ku mumin van 'emelên xweyî qenc bi paşgotinî, hesudî û qîl û qalê pûç nekin. Di vi warî de bîranînek min heye de guh bidêrin ez ji we re bibêjim:


Tirba Şêx Sadî

Di dewra zaroktîya xwe de, min gelek nimêj dikir, Quran dixwend û tesbîh diani. Şevek dîsa hetta berdestê sibeha şerif, min Quran xwend û ez ranezam. Rehmeta xwedê lê bibare, rehmetîyê bavê min jî wek min raneza û hişyar ma. Lê ferdên malbata me yên din tev di xewdabûn. Ez vegerîm û min ji bavê xwe re got: *"De ka li halê vana binêre. Tev wek mirîya razane. Ma çi dibu ku yek ji vana, ji xewa şîrîn raba û du rik'et nimêj eda bikira."*

Bavê min vegerî ser min û bi lewm got: *"Lawo xwezî tu jî di xewda ba, û te ev paşgotinîya wan nekira."* Ez hê hişyar bum hiş hat serê min. Û min fêm kir ku kesê ji xwe razî û mexrur be, jixwe razîbûn û mexrurîya wi dibit perde li ber çavê wî û nahêlit ew ji bil xwe kesî bibîne. Lê kesê ku heqperestin û rastîyê dibînin, û 'eleqa wan bi kesên din ve nin e. Cehd û xebata wan her ewe ku 'eyb û qusurên xwe têkuz bikin û xwe ji neqencî û xerabîya paqij bikin.

**Ji bo şerh û îzaha vê meselê xwedê ji te razî bit şêxê min. Em kefxweş û dilşad bun bi vê bersîva te. Seyda wekî ku tê zanîn derîyê tobê ji insanan re herdem vekiriye. Xwedê tobe qebulvan û bexşende ye. Her çiqas heqîqet ev be jî, merivê tobekar, nikare xwe li nêk insana paqij derîne. Çiqas behsa tobe, 'îbadet û îxlasa wî bê kirin, însanên ku ji paş gotinîyê hezdikin, hema defterên wî yên kevn tev didin. Civak wî baş nahesibîne û lê loma dike. Kesê ku di vî hali da be lazime çi bike?**

Bi rastî çawa ku Rebbê me tobeqebûlvan û bexşende ye, lazime em jî xwedî husn-î zen bin. Lazime em li însana biborin. 'Eyb û 'arên wan veşêrin. Wan teşwîq bikin bi bal tobê ve. Lê mixabin pirraniya însana bi vî rengî nafikirin. Û kesê tobekar di 'eybînin. Defterên wî yên kevn tev didin. Şireta min li wî kesê ku di vî halî de be eve:

Bila guh bide vê çîrokê bi sebrê û ecra xwe ji xwedê bixwaze. Rû xweşîya li axretê ji rûreşîya li dinê çêtir e. Dibêjin mirovek hebûye. Her neqencî tê de hebûne. Karên nebaş, xerabîyên cûrbecûr di wî de kom bûne. Hema em bêjin kîsikê neqencîyê buye. Lê rojek ji rojan, tirsa Xwedê ketiye dila û bûye poşman. Lêborîna xwe ji Rebbê xwe xwestîye û tobe kirîye. Paşê vegerîyaye ser qencîyê. Bi alîkarîya Rebbê xwe vegerîyaye ser rîya rast. Çuye bal 'alimekî alîkarî jê xwestîye. Bûye şagirdê wî. Li ber destê wî dest bi tedrîsata 'ilm û 'îrfan kirîye. Bi alîkarîya xwedê û bi wesîla vî 'alimê hêja ji temamê neqencîya dûr ketîye. Lakîn kesên nebaş û qellaş, dibin neyarê kesên 'alim, zana û baş. Her wiha nebaş û qellaşên wê dewrê jî ketine hamberiya hesûdîyê û paşgotiniya wî kirine:

*"Bextê xwe pê neynin. Ew ne guherîye. Dixwaze bikeve çavê we. Li pey dek û dolaba ye ew. Miheqeq menfe'etek wî di vî halî de heye. Ma ew nebû ku wiha wiha dikir..."* Ev tobedar dinhêre wa bûye benîştê devê çavnebar û hesûda. Hay jixwe nebu karê kû dibe sebebê bexşandina xwedê, nabe sebeb ku meriv nebe benîştê devê çavnebar û hesuda. Ji lew melul dibit. Û radibe diçe nik seydayê xwe gilîyê wan dike.

Seydayê wî ewil guhdarîya wî dike. Paşê jî dibe zar, û dest bi girî dike û jê re dibêje: ***"Lawo pir başe! Tu mirovek qenc û xalisî kû hesûd û çavnebar paşgotinîya te dikin. Ev, jibo te halekî pir baş e. Melûl û mehzun nebe. Ger ew te bi kujin jî xem neke. Wey li wî kesi ku neqence qenc tê zanîn. Dîsa sed xwezî bi wî kesî ku qenc û xalise lakîn neqenc tê zanin. Ev halê te ji halê dî çêtire sed xwezî bi te sed xwezî bi te...***

*Kesê herkes dibê qence belkî nezan û neqence*
*Însan dikare xwe veşêre ji xelqe qunce bi qunce*
*Lakîn tu tiştek naê veşartin ji rebbul 'alemîn*
*Ma'lume ji wî re zahir û batin çi qenc çi neqence*

**Seyda! Jibo vê suhbeta wek gencîne Xweda ji te razi be. Gerçî meriv têr nabe ji suhbeta we 'alima. Heger izna we hebe em dixwazin di jimarên kovara xwe yên pêş de jî bi we re hevpêyvina xwe bidomînin. Vega bimînin di xêr û xweşîyê da. Rehmeta Rebbul'alemîn bi me û we de bibare...**

Xwedê te'ala ji we jî razi be. Ez kêfxweş bûm û bi kêfxweşî li benda we me. Em silavên xwe pêşkêşi xwendavanê kovara we dikin. Me hevî heye ku kovara we 'emir dirêj û bi xêr be. Dîsa me hêvîye hun ji me re du'a bikin û fatîha bixwînin.

---

**Bersiv** : Cewab
**Qirn** : 'Esr, sedsal
**Hevpeyvîn** :Reportaj
**Noq** :Daketina binê avê
**Şîrove** : Îzah û beyan
**Kurtejîn** : Xulasa heyata insan an biyografî
**Jînenîgarî** : Biyografi
**Muderrîs** : Mu'ellim ê medresa ango rektor
**Gulistan û Bostan** : Du berhemên Şêx Sadî yên bê hempa
**Dij** : Muxalif
**Meqber** : Tirb ango gor
**İtiqaf** : Bi niyeta 'ibadetê sekna li mizgefta
**Dadgehî** : 'Edalet
**Hêsanî** : Rahet
**Hêrs** : Qehr, 'enirandin
**Toq** : Kom; granî;
**Paşgotinî** : Ğiybet
**Hesûdî** : Çavnebarî
**Pûç** : Vala, boş
**Husnizen** : Lênêrîna baş
**Curbecur** : Çeşit çeşit
**Tedrîsat** : Te'lim
**Gencîne** : Xezine

Mucahidê Mala ‘Evdilê Kolo



# Xweşdîtina Muslumana Lazim e…

Hemd û senayê bê dawî ji rebbê alemê re be. Selat û selam li ser qenctirê însana, li ser Pêxemberê me û ehlê mala wî ya pak û paqij û li ser eshabîyên xwey şeref be.

Mijarek e zehf li ‘ecêba min diçe. Min bê hizur dike. Dema tê fikrê min sîstema rehikê min ser û bin dibe û cinê min radike pêdarîyê ev mijar. Ev mijar, mijar a xweşdîtinê ye. Gelek însana vegotina tevgera xweşdîtin a rêveberê, îdarevanê muslumana û ferdê muslumana di dîroka îslamê da ji ğeyrî muslima re kirine. Her wekî cînartîya îmamê ‘Umer û mêrikê Cihu; yan pevçuna îmamê ‘Elî û mêrikê Cihu, li ser abayê îmam ‘Elî, ew abayê ku winda bubu. Û dema behs jî dikin zahf xweş dikin.

Bira şaş neyê fêhmê. Em ne ku li dijî xweşdîtinê radibin. Lê belê ni zanim çi hikmet e, tu dibê qey Xweda emrê xweşdîtinê bi tenê ji ğeyrî musluma re kirîye. Menzere bi vî rengî tê ber çav. Ev xeşdîtinî rîya xwe bi taxa muslumana naxe. Di mijara mafê mirovê ğeyrî muslim de ew muslumanên ku zehf hessas û dilzîzin, dema dibe mesela mafê muslumana ew xweşdîtinî û ‘edalet tu dibê qey wê kêlîyê ji Qur’an ê tê derxistin. Her wekî ew hukim di Qur’an ê de tuneye. Xweda bi tenê emrê xweşdîtin û tevgerê bi ‘edaletî bi ğeyrî musluma re kirîye. Ayeta ku herî meşhur e dinav van însana de jî ayeta ku Xweda dema Musa (s.x.l) û Harun (s.x.l) dişîne bal Fîr’awn ku ji wan herdu pêxembera re dibêje; **“Bi Fîr’ewn re bi zimanekî nerm bi peyvin.”** Dibêjin; însanekî wekî Fîr’ewn, bi însanekî weke wî zalim be jî, Xweda emrê me bi xeberdana nerm kirîye. Lazim e em zehf nerm bin û bi wan re xweşdîtinê bikin. Ez dixwazim vê pirsê ji wan birayê meyî ku mîsala xweşdîtin û ‘edaletê ne ez bikim. **“Gelo ev birayê weyî ku hun bi çavê neyartîyê, bi çavê kîn û buğzê li wan dinêrin, di derekê de ne, ku ji Fîr’ewn kêmtirin? Ji ber vê, hun xweşdîtinê nîşanî wan nadin? Ew xweşdîtina ku tê ra temamê bê dîn, Fille û Cihuyê dinyayê dike, dema tê taxa muslumana xilas dibe?”**

Di hedîsa pêxember de (s.’e.w) hatîye rîwayet kirin;*“Muslimanê ku ewê di dawîya temamê muslumana de bikeve cennetê, Xweda bi qasî deh qatê dunyayê ew li cennetê cî bidyê.”* Ev, herî kêmê, en qelsê muslumana bu. Îdî yê mayîn hun qîyas bikin. Herî neqencê muslumana, herî gunahkar ê muslumana dixwaze limêj neke, zîn bike, û ‘eraqê vexwe, ji ğeynî şîrk û înkarê çi gunehî dik bira bike, ji ber hilgirtina îmana wî ji kafirê dunyayê tevî qîmettir e. Îro xwedyê hêlînê xirabîyê en rîya ku lê diqe din ma ne eve? Kesî ku ne bîhîstbe ku Emerîka Qur’ane a ku ayetê neyartîya Fille û Cihu ya derxistye ku derandye tune ye.

Îro ev neyartîya Muslumana ku bi hev re neyartîyê dikin û li hemberê Fille û Cihuyan xweşdîtinê nîşan didin çiqas bi van tiştê ku me jimartî lihevtên. Tê fêhmê ku ev dek u dolabê wan in. Ji bo fêmkirina van ne lazim e ku meriv stêrnas be. Çiqas musluman ê ku xwedî aqlekî rast bin, aqilmend û şareza bin, ku berçavk a wa yî hespa tune be, ewê vê eşkere bibîne.

Bi qasî ku em di çapemenîyê da dişopînin, vêga li Pakîstanê li hev xistina leşkerê Pakîstan û hêzên Talîban serî nîşan dide. Ez nakevime pevçuna tevgerê Talîbanî buhurî. Vêga çiqas bi kêmasî û qusur bin jî, li wê derê komeleke Musluman heye. Her wekî li jor me behs kir, çiqas gunehkar bin jî, tabloya însanne ku îman bi Xweda û bi pêxemberê wî anîne, limêj dikin ku hevdu bê ujdan dikujin mijara xeberdanê ye. Ê dikuje jî u tê kuştin jî muslumanin. Ji bo kî û ji bo çi vî şerî dikin? Weke dîkê şer, ew bi hev re şer dikin, û neyarê wan jî li wan di fericin. Li kîjan ‘erda dunyayê însanê ku hempişkîya ‘eynî zimanî û ‘eynî dînî dikin hevdu dikujin? Çima temamê herba, xwîn û hêstir li herêma Îslam ê xwe nîşan dide? Herba Îran û ‘Îraq ê, herba Kendavê, îşğal (dagirkirina) a Efğanîstan ê, Pakîstan, Keşmîr, Filistîn û hê çi qasî dî. Dek û xayîntîyê ku sekin biwan nakeve... Lêbelê herî şuğlê bi dil êş eve ku, di van şer u herba de dewletê bi nav Musluman û ‘alimê di nav ‘alêma Îslamê meşhur û bi nav û deng, ne li rexê muslumana ne, li rexê kafir û neyarê, qatilê muslumana ne.

Ha ev hal dilê min dibirêje, xewê min direvîn e. Ya rebbî! Nizanim emê kengî fêhma dekê neyarê xwe bikin? Nizanim emê kengî weke zemanê berê milê xwe bidne milê hev û li hember ê neyarê xwe û neyarê te emê êrîşa daxin? Ya reb! Wan roja di zemanekî nêz de nîşanî me dî.

Heta jimareka din, bimînin di xweşîyê da, emanetî Xweda bin. Hêvîya di’a dikim

| | | | |
|---|---|---|---|
| **Radibine pêdarîyê** | : Cinleri ayağa kalkmak | **Stêrnas be** | : Müneccim. |
| **Sîstema rehikê min** | : Sinir sistemi | **Çapemenî** | : Basin |
| **Rêveber, îdarevan** | : İdareci | **Hempişkî** | : Paylaşmak |
| **Herî neqencê** | : En kötü | **Kendav** | : Körfez |
| **Diqesidin** | : Başvurmak | **Di fericin** | : İzliyorlar |
| | | **Xweşdîtin** | : Hoşgörü |

# Exlaqê Xebatê
# Ziman û Zimanê Dozvanê İslamê III

**Bi navê Xweda...**

Hemdên kamil ji Rebb ê Subhan re, Silav û hurmet ji Resul ê Zîşan ra.

**Gelî dozvan û da'wetkarên hêja!**

Behsa meyî liser ziman û bêjê dom dike, Xweda zane ê hîn pir dom bike. Yunus Emre li ser gotinê di helbestek xwe de wiha dibêje: *"Kesê zanibe ru sipî dike bêjek/ Ê ku bêjê cîdi bêje karê wî sax dike bêjek/ Carnan betal dike herba bêjek/ Carnan jêdike sera bêjek/ Xwarinê dike hingiv u nivîşk bêjek/ Ger mirov zanibe qeysa beja xwe/ Nebêje gotinê tal û zêdeyî xwe/ Cehnema vê gerdunê dike cennet bêjek."* Xweda jê razîbe ma'na helbesta Yunus Emre bi nêzîkahî were ye.

Erê em diben gotin û em derbas dibin; belê bala baş bidnê, gotin jî hunereke, ma'rîfeteke, herkes nizani xweş bêje, xweşik bêje. Bele her çiqas hunerek ji be, hewceye ku dozvanê îslamê xwe pê kar bike û xwe pê bijdîne, lewra carnan kesin nîyetbaş hene meqseda wan çiqas teblîğ jî be; belê bixemgînî em karin bêjin gelek kesa ji îslamê dûr dixin.

Xweda jê razîbe, birakî meyî ku ez nas dikim li Edenê heye, zehl u zimane wî ewqas nermik û şêrîne ku diçe kudê, biçi karî mijul bibe bi îzna Xweda tê de muwaffaq dibe. Jiber wê çi karê fermî û birokrasîyê heba, wexta ew amadeba, ew pê dadiket.

**"Bawerîya 'ebdekî rast nabe, heta dilê wî rast nebe, dilê wî jî rast nabe, heta zimanê wî rast nebe"** (İmam Ahmed) Balê xwe baş bidne vê xal û noqtê gelî dozvanê hêja! Bawerî rast nabe, heta ziman rast nebe, yanê xelasîya ziman xelasîya însane, ger ziman nexweş be, însan wê nexweş û bêhal be, bawerî ê nexweş be, ê her du dinya de liser xeterek mezin bin. Yanê wexta em xelasîya însana bixwazin ger pêşî em xelas bin, mifte û kîlîda xelasîya me jî zimanê me ye.

Di bêjeke din de Resulê Xweda (s.x.l) bimeyzênin be çi gotîye: **"Wexta li kurê Adem dibe sibeh, tevî eza û lebate însan ji ziman re wiha dibêjin, di heqê me de ji Xweda bitirse; lewra hîndam û îstîqameta me bi te giredayî ye, tu rastbi emê jî rast bibin û rastîyê bibînin, ger tu xwar bibî emê jî xwar bibin."** (Tîrmîzî)

Dîsa dibê: **"Gelek şaşîyê însan ji zimanê însanin"** (Taberanî)

**"Kesê ku peyvê wî pir bin şaşîyê wî jî pirin"** (Ebu Nuaym)

Yanê ji van gotina teva tê fehmê ku mifta xelasîyê, mifte û sewgirandina cennetê zimanê însane, jixwe ev jî resulê Xweda bi xwe gotîye. (Kîtabul îstîzan-Sahîhî Buxarî)

Xwedayê Te'ala me bike ji kesê ku zimanê wan yan xêrê dibêje; yan jî hiş dibe. Xweda yar û alîkarê me teva be.

Spartîyê Xwedayê ku çi tiştê heye bi rindî diparizê, silav û rehmet u bereketa Xweda li ser we be...



# Nexweşînê Manewî Riyakarî (Durûtî)

Jiyan
Huseyîn Olam

Bi Navê Xwedayê Rehman û Rehîm**.**

Di serî de em binêrin, bê ka Rebbê me di heqê durûtîyê de çi dibêje:

**"Weyl li wan kesa be, ku nimêj dikin û hay ji nimêja xwe namînin. Ew rîyakarî (pêşanî) dikin."** (Suretê Ma'ûn, 4-5-6)

**"Ey ê ku bawer kirine! Wek wî kesî nekin ku, bi rastî bawer bi Xweda û roja axretê nanîye; lê malê xwe bi pêşanî zêha dike. Sedeqê xwe bi dil şikestinê û niç lê danê betal nekin. Halê ê wîsan, wek ferşekî ku hindikî ax li ser hebe û ew ferş bi leza ba û baranê tazî û rût bimînê. Ew ji karê xwe ti feyde nabînin. Xweda komela kafira nayne hîdayetê"** (Bakara, 264)



**"Munafiq bi xebatê xwe dixwazin ku Xweda bi xapînin. Xweda hewl u cehda wan li ser çavê wan dixe. Wexta ew radibin nimêjê bi sistî û tiralî radibin. Ji însana re nîşandanî dikin û Xweda kêm tînin bîra xwe."** (Nîsa, 142)

**"Ne bin wek wan kesê ku bi erçel û quretî jibo ku xelqê ji rêya Xweda bidin zivrandin ji warê xwe (muşrîkê Mekkê) derketin. Xweda dor li wan girtîye."** (Enfal, 47)

Di pey van kelamên Xweda ê te'ala de, lazime em guh bidne Hebîbê Xweda, Resulullah 'eleyhisselat û wesselam:

Resullûlah (selat û selamên Xweda li ser wî bin) ji sehabîyê xwe re wiha gote: **"Ez di derheqê we de ji hemu tiştî zêdetir ji şîrka biçuk ditirsim..."** Sehabîya pirsî: **"Ey resulê Xweda! Şirka biçuk çîye?"** Resulullah (s.x.l) goht: **"Rîya ye, lewra Xweda yê tê'ala roja qiyametê wexta berdêla 'emelê însana dide, ji rîyaka re dibêje; *"Di dinyayê de we ji kî re rîyakarî dikir herin cem wan! Binêrin gelo hun karin li cem wan xelatek bibînin?"*** (Ahmed-Beyheqî)

Şeddad ê kurê Ews gote: "Min dît ku Resulullah (s.x.l) digrî. Min pirsî, "Ya Resulullah! Tu ji bo çi digrî? Wiha gote; **"Ji bo ummeta xwe ji şirkê ditirsim. Ew ne puta, ne roj û hîvê û ne jî kevira dihebînin, le belê wê bi 'emelê xwe rîyakarî bikin!"** (İbnî Mace)

Piştî me fahm kir bê Hezret-i Resulullah di derheqê rîyayê de çi gohtîye, êdî lazime em berê xwe bidne warisên pêxember. Lewra ewin mezin û pêşîvanê mumina.

Hezretî Elî (keremullahu wechehû) gotiye: "Sê nîşanê rîyakara hene;

1. Wexta ku tenê be tilarî dike.
2. Wexta li ber çavê xelqê be xwe jêhatî dike
3. Wexta ku pesnê wî bidin zêde 'îbadet dike. Ku pesnê wî nedin 'îbadetê xwe kêm dike.

Hz. Ömer, dît ku yekî stuyê xwe xwar krîye u mitale dike, jê re goht:

-stuyê xwe rast ke! Tirs, ne di stu de ye, tirs di dil de ye!

Hesenê Besrî dibêje: "Rîyakar, dixwaze ku qedera Xweda binketî bike. Ew bi xwe xirabe, lê dixwaze ku xelk je re bêje "Çiqas yekî başe"

Belê, bi van ayet û hedîs û peyvê mezinan tê zanîn ku temelê rîyayê ser xweşgotin û teweccuha însana tê avakirin. Rîyakar dixwaze di dilê însana de cî bigre. Xebat û 'emelê wî ne ji bo riza Xweda ye; tenê ji bo pesindana însana ye.

Wekî ku 'ezîz û şîrînê dilê me, Muhemmed (s.x.l) ji vê nexweşînê ditirse û li ser me digrî, nexwe ev meselekî pir girîng û girane. Merezekî mezine. Mîjarekî dijwar û direje. Bila tu kesek nebêje ev êş bi min re tineye. Bi awakî em tev bivê êşê nexweşin. Di pirê 'emel û fikrê me de wek rêça morîstangê, hîle û xapandinê veşartî hene. Resulullah (s.x.l) wiha gote: **"Hifza xwe ji vê şirkê bikin! Lewra ew, ji rêça morîstangê veşarîtirê"** (Ahmed, Taberanî)

Di vê meselê de belkî pîyê pirê 'alimê hêja şemitî be. Em bi vî halê nezan, xwe ji rîyayê dûr nebînin? Bi taybetî ê ku barê Qur'an-ê dane milê xwe, gere hê bêhtir hişyar bin. Lazime em ji Xweda re rast û durist bin. Di 'emel û xebatê xwe de bi sextekarî neçin huzura Xweda. 'Ebdîtîya Xweda ne karê heneka ye. Em nikarin ti tiştekî xwe, ji Xweda biveşêrin.

Ne hewceye ku birayê Musluman xwe bêxê çav. Wekî ku jibo Xweda xebatê dike, ne lazime ku hay û gumana kesî jê hebe, bila vî ji xwe re neke derd. Hekena wê rîyakarî bikeve vî îşî.

Ez nivîskarê vê mijarê; dihişê min de derbas dibe, "Gelo ez bikêrî vî îşî hatim an na? Gelo wê ber pîrsîyarê vê kovarê bi 'ecibînîn an na? Min jibo Xweda ev xizmet kir, an jibo 'ecbandina însana?" Bi rastî ez nikarim şadeyî li nefsa xwe bidim, di quncikekî hişê min de ev fikir veşartî dimîne. Ger çiqas ev mijarek dirêj be jî hewqas cîh ji me re hatîye veqetandin. Me umîde wê bê fêmê.

Em ji rebbê xwe hêvî dikin ku bi alîkarîya xwe va êşê me timar bike. Bi şefqet û rehma xwe hifza me ji rîya yê bike. Selamê Xweda li ser tevekî muslumana be.

| | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|
| **Pêşanî** | : Gösteriş | **Erçel** | : Şimarik | **Teweccuh** | : Yönelme |
| **Zeha** | : İsraf | **War** | : Yurt | **Girîng** | : Önemli |
| **Niçlêdan** | : Başa Kakma | **Berdêl** | : Karşilik | **Mijar** | : Konu |
| **Rewş** | : Durum | **Xelat** | : Ödul | **Morîstang** | : Karinca |
| **Ferş** | : Kaya | **Hebandin** | : Sevmek | **Veşartî** | : Sakli |
| **Lez** | : Şiddet | **Pesn** | : Övmek | **Şemitîn** | : Kaymak |
| **Rût** | : Çiplak | **Stû** | : Boyun | **Bi taybetî** | : Özellikle |
| **Hewl** | : Çaba | **Mitale** | : Fikir | **Tîmar** | : Tedavi |
| **Tiral** | : Tembel | **Binketî** | : Mağlup | | |

# Namê Allah

*Sernameyê name, namê Allah*
*Bê namê wî natemam e wellah*

*Ey metle'ê husnê 'işqebazî*
*Mehbûbê heqîqî û mecazî*

*Namê te ye lewhê nameya 'işq*
*İsmê te ye neqşê xameya 'işq*

*Bê neqşê te, neqşê xame xam e*
*Bê namê te, name natemam e*

*Namê te ye şahebeytê meqsûd*
*Fihristê mukatebatê mehmûd*

*Mezmûnê muraselatê la-reyb*
*Meşhûdê mukaşefatê bî-l-ğeyb*

*Mehbûbê qulûbê men lehu l-qelb*
*Qelban tu dikî bi bal xwe ve celb*

*Me'şûq tu yî, bi fexr û naz î*
*'Aşîq tu yî, lêk bê nîyaz î*

*Mutleq tu mufîd û mustefad î*
*Bê şubhe murîd û hem murad î*

*Nûr î tu di husn-i rûyê dildar*
*Nar î tu di qelbê 'aşiqê zar*

*Şem' î, ne ji qismê nûr û nar î*
*Şems î, ji 'eyan tu perdedar î*

*Genc î tu di nêv tilsimê 'alem*
*Kenz î tu 'eyan ji îsmê adem*

*Ev 'alem û ademî û meşhûd*
*Ev mumkin û masîwayê mewcûd*

*Hemiyan bi te ye mudare û debr*
*Feyyazê riyazê xelq û we-l-emr*

*Emrê te bi lefzê "kun" du 'alem*
*Mewcûd kirin, xerez çî adem*

*Adem bi xwe yek ji herdiwan e*
*Yek herf e ji emrê "kun" fe-kane*

...

*Ev karegeha 'ezîm û dewwar*
*Ev baregeha bedî' û seyyar*

*Ev çende zemîn digel 'enasir*
*Ev renge 'erez digel cewahir*

*Ev çende he ni'met û nefais*
*Ev renge he meakil û melabîs*

*Bî l-cumle ji bo me ra li kar in*
*Fî l-cumle ji bo me ber di bar in*

*Heqqa ku te xweş nîzam û rewneq*
*Tertîb kirin ji bo me el-heq*

*Em ğafil û 'atil û gunehkar*
*Mayîne di qeydê nefsê emmar*

*Nînin me di qelbî fikr û zikrek*
*Nakin bi zebanî hemd û şukrek*

*Xanî ku nehin bi qelbî zakir*
*Barî bîde wî zebanê şakir*

*Şêx Ehmedê Xanî*



**Name** : Nav
**Metle'** : Destpêker
**Xame** : Qelem
**Mezmûn** : Naverok
**Muraselat** : Tiştên hatine şandin
**La-reyb** : Bê guman, bê şubhe
**Celb** : Kişandin
**Mufîd** : Fêdedar
Mustefad : Yê fêde jê tê dîtin
**Genc** : Xezîne
**Xerez** : Ğaye
**Dewwar** : Zîvirînok
**Bedî'** : Bedew
**Seyyar** : Gerok
**Men lehu l-qelb** : Xwedî dil, Yên dilê wan heye.

Muhammedê Hecî'ezem

## Li Hember Tengasî û Zehmetiya

# Sebr û Tewekkul



**Sebr**; Hilgirtin û kirina xemgînî û tengasîya ye, berXwedana dijwarî û musibeta ye, sedema dûrbuna ji guneha û kirina xêra ye.

**Tewekkul;** Piştî pêk anina hemû vazifê ku ji mirov ra hatin e danîn; mirov pêk bênê û encama karê xwe tewekkulî Xweda bike û bi encama ku ji alî Xweda ve hatiye teqdîrkirin razi bibe û baweriyên bi Xweda werîn û ji aqibeta xwe ne tirs e.

Hz. 'Elî dibêje: ***"Sebra di imanê de, weke seriyê ku di bedenê de ye*[1]** Bawermendekî ku di jiyana xwe de leqayî tengasî û zehmetîya bibe û sebr û tewekkul bike, wê li axretê xelata xwe bistêne. Jiber ku di wî wextî de zehmetî û tengasî pir kişandiye û ji âlîkî din jî tengasî îmtîhan e, jibo kesê ku bawerî bi cîh anîye û ê ku bawerî bi cîh ne anîye. Heke tengasî û zehmetî nebana belkî tam meqseda îmtîhanê jî nehatibana fêmkirin. Sebr û tewekkul encex bi imtihanê eşkere dibe. Îxlas û teqwa jî bi sebr û tewekkulê tê fêmkirin. Çawa ku em dibêjin di kirina 'îbadet de jî sebr; çimkî em zanin nefseke ku rebbê xwe nas nekiribe û bi terbiya rebbê xwe nehatibe terbiyekirin wê kirina 'îbadeta jê re zor û zehmet were.

Gelek mirov dibêjin em Misilmanin û bawerî bi Xweda û roja axretê anîne û dibêjin em li pey Quranê ne. Lêbelê, kesê ku ji ticareta xwe, ji canê xwe û weke van gelek tiştê ditirsê, wextê leqayî zehmetîyan tên xwe didine paş. Heke ew mirov leqayî zehmetîya ne hatibana dibu ku samîmîyeta wî derneketibana holê. Ji bo wê yekê, heke demê tengasî û zehmetiyê nebana belkî ê gelek mirova dirûtî kiribana û rûyê xwe yî bi rasti dernexistibana der. Û ji âlîkî ve jî, zehmeti û tengasî rehmeta Xweda ye, paqij û pîsa jihev diveqetîn e. Xweda di ayetê de wisa ferman dike: "***Roja ku du civak li hemberî hev hatin. Tiştê ku hate serê we bi destûra Xweda bu. Evya jibo ku mumina (bawermenda) veqetîne û minafiqa derxê holê bu..."*[2]

Çawa ku di tekoşîna Îslamê de jî gelek zehmetî hene; gelek ji we zanin berîya neha bi çend sala hinek mirovên Xwedênenas û neyarê İslamê û hinek Mislimana li Mislimanên şîyar îftira kirin û bi bêbextî erîşî wan kirin. Gelek ji wan şehid kirin, bûne sebebê ku muhacirbun, ketne zindana, ji malbatê xwe bi dûr ketin û gelekî tengasî û zehmetî dîtin. Wexta tengasîya destpêkir gelek mirovan jî xwe dane paş. Mînakê bi wî rengî di dîroka Îslamê de pirin û gelek mirov li pêşerojê xwe, fikirîn e û xwe dane paş. Bi vêya hate xûyakirin ku di bawerîya xwe de ne dilsozbûn. Di tali de bi 'izzet û şeref serfirazbûn. Çawa ku Xweda yê Te'ala di Quranê de dibêjê: "...***'Îzzet ya Xweda, Pêxemberê Wi û bawermenda ye..."*[3]**

Kesên tam baweri ne anîbin, di demê tengasî û zehmetîyê de bi şunda divegerin û ji rehmeta Xweda bêpar dimênin. Her zehmetîya ku bawermend liser sebr û tewekkul bike wê bibe xêr û xweşi. Lewra lebata li hember zehmetîya di riya Xweda de wesîla riza Wi û rehmeta Wi û wesîla cennetê ye. Xweda yê Te'ala li hember zehmetiyê mumina (bewarmenda) wisa heşyar dike: ***"Ma qey hun guman dikin ku ev tiştê hatine serê ê berîya we, heta neyne serê we, winê têkevine cennetê? Ew wisa bêçare û perîşan bûn û wisa bitirs hatin hejandin ku dawîyê Pêxember û ên pê re ku îman anîbûn, di gotin: "Gelo alîkarîya Xweda wê kengî werê" dêhnê xwe bidin, bê guman alîkarîya Xweda pir nêzîk e."*[4]**

Kesê bawermend ku di Jiyana xwe de zehmeti û tengasî dîtî ye bêhtir buha ê ni'meta di zanê û li hember ni'metên Xweda behtir şikir dike û qinyatkar e. Ji ber ku di Jiyana xwe de tengasî dîtîye kengê ku di gihêje ni'meta, serxweve naçe û şikir dike. Bikurtî, tengasî û zehmetî wesîle ye ji bo ku baweri û xulq ê bawarmenda tekûz bibe.

Ji neha de cejna/'îda weyî Hecîya (Qurbanê) piroz be. Xweda yê Te'ala bike wesîla rizgarî ya Mislimana. Heta carek din em bibne mêvanê we, bimênine di xêr û xweşiyê de.

1. Seyid Abdülkadir-i Geylani "İlim ve Esrar Hazinesi" s: 493-494
2. Al-i İmran 166-167
3. Munafîqûn:8
4. Al-i İmran:140
5. Baqara 214

# Em Meğlub Nabin

*Em muwahhîd meğlub nabin, bi ti hîlew herba*
*Dujmin nikar me bixîn, bi ti ezyet û derba*
*Wek çîya me nahejîn, ba û bahoza dujmin*
*Ji zîndan û ji 'îdama re, sed car merheba*

*Wek agirê di kurê, di zîndana de dujmin*
*Nikarin ji qirêj û zengê pêve j-me bigrin*
*Ji lewma dagirtîne, j-me tije kîn û werm in*
*Hîle û ezyetê dujmin, di me da çûne heba*

*Ew hîlew ezyetê ku, çîya j-ber wan heJiyan*
*Bi alîkarya Xweda, di me da tev helîyan*
*Ziravê dujmina-j cesareta me qetîyan*
*Umîd û emelê dujmina, tev bûne ber ba*

*Îro wek nebî Yusuf û wek Bedîuzzeman*
*Mekteb û medresê me jî, bûne heps û zîndan*
*Emê tê da bibêjin, dersa Îslam û Quran*
*Wê dujmin û xaîn tev, bifetsin j-derd û kerba*

*Kesî bê kuştin û zîndan, serî ne hilda ye*
*Ev sunneta enbîyaw ewlîya yê Xweda ye*
*Zelîl bûye çi kesê, dev ji vê rê berda ye*
*Wesyet û şîreta Mizgîn e, li dost û muhibba*

*Dengê Ummeta Îslam*



# Nimêj

Kî çi bêjê bila bêjê
Ez nakim terka nimêjê
U ez nabim 'evdê 'evdan...

İnsan çîye lê?
Parçek goşt
Sê dilop xwîn
Dil û îman...

Eger 'eşq nebê
Eger 'aşiq nebê
Êzê çi bikim
Ji jîna bê Jiyan...

Cîhan çîye lê?!
Parçek ax...
Sê dilop av
U ger û seyran...

Eger gul nebê
Bilbil nebê
Ezê çi bikim
Ji kewn û mekan...

İnsanim lê
Bi soz û peyman.
Ne keştîyek bê qêrarim
Li ser avê

Barê min giran
Soza min mezin
Rêya min dûr e
U Her demê
Her anê...

İhtîmala binavbuna min
heye
Ji ber vê dibêjim...

Kî çi bêjê bila bêje
Ez nakim terka nimêjê
U nabim lîstika şeytan...
De ka bêje?
İnsan kîye?
İnsanîtî çîye?
Na na!

Her civîn,
Ne ji bo reqsê ye.
U her dîwar,
Ne ê hebsê ye.
Ax hemu nabê zêr
Av hemu ne av e...
Ava kizabê cisma di helînê
Ava heyatê Jiyanê
dibexşînê

Her însan jî ne însan e;
Mêr ne mêr e
Jîn ne jîn e

Hin qabîlin;
Dil kevir
Bira kuj
U firar

Hin Yusuf in
'Efukâr in ji biran re
Xelaskarin ji qewman re
U ronîya çavên Yaqub...

M. Tahir SORANÎ





Kelhaamed

# Rusipîtî

Mamosta 'Elî derîyê hêwanê vekir û kete hinduru da. Ew mirovek pîr bu û piştî ku teqawît bubu, tu xebat nedikir. Diçu serdana; lewra dizanîbu ku serdana heval û hogira, hem pîr û nexweş û bê kesan jî bi hawakî 'îbadet e û xêr tê da heye.

Mamosta devê xwe tije kir ku selamê li "Dadger Tunç Beg" bike. Dadger Tunç Beg jî ji dadgerîyê teqawît buye. Ev herdu ahbab li gelek bajar û navçeyan bi hevra jî şiğul pêk anîne. Ji ber vê yekê dostanîya wan çêbuye. Ya ew diçe serdana wî ya jî ê dî tê serdana wi. Belê exlaqên wan bi gişayî tersî hev e. Mamoste çi qasî oldar e, bên fire ye, Dadger jî ew qasî heramxwer e, caris e, çavbirçi ye. Bi bertîla dewlemendîyek çêkirîye ku nayê gotine. Ji pere, heta bighê mirîşk, hêk, 'elbên mast, selikên tirî, fêkî, pez û wekî din. Bi van bertîlan dewlet ava kirîye. Heye ku jimara pezê wî hezarek derbas kirîye. Belê ew nizane ku ***'heramî heram diçe'.***

Hem nizanî qasidê Xweda ferman kirîye ku **"Kesê ku bertîl dide û ê ku distîne, herdu jî mel'un in."** Çima nizanî ew baş dizanî. Lewra Mamosta heye hezar carî jê ra gotîye belê ewî ber guhan nekirîye.

Mamosta hîna selama xwe xelas nekiribu, dadger dîsa dest bi gilî u gazinca kir: *"Lo bavê bavê mino 'Eli. Qesem bi şerefa te be. Mêrê ku şuğlê xwe bi helalî bikarbînin li ser ruyê erdê nemane."* Mamoste: *"Çer bu birayê dadger? Dîsa çi qewimîye?"* Dadger: *"Ma çi çer bu. Ma malik li min şewitandin. Ev çend salin ez pezê xwe dispêrim kîjan şivanî nîva wî ji min didizin. Jimara pezên min ji hezarî daket sedî. Ez nema dizanim bê ka ezê çawa kim. Qey li ser vî halê xwe yî extîyarî ez naçim şivanîyê jî nakim. Neha nayê firotin jî ku ez bifroşim."*

Mamoste nema zanî bê ka ewê bikenî, an bigrî. Dadger bixwe ne rast bu ji nerastîyê digazine. Ew bixwe heramxwer bu ji heramxwarinê digazine. Her kes dizane ku ev pez çawa hatîye tu kes newêre bistîne. Di dilê xwe da got: ***"Lê gerîya tê gerîya"***

Mamosta got: *"Li navçeya Dugirka gundek heye. Min çend salan li wî gundî mamostayî kirîye. Gelê wî gundî ez nas dikim. Oldar û helalxwer in. Li wî gundî bi navê Bedo xortek heye. Ez bavê wî bavpîrê wî nas dikim. Ez bi wî xortî bawerim. Ka emê vî pezê te ê mayî bidin wî. Salekî jî bira ew xwedî bike..."* Mamosta jî ğeletî kir. Lewra Îmam 'Emerê kurê Xetab gotîye ku ***"Mirovê ku te pê ra hevaltî an jî dayîn û sitendin nekiribe tu wî nasnake."*** Mamoste ne pê ra hevaltî û ne jî dayîn û sitendin kiribu, ji wî ra bu kefîl. Dadger got: *"Ji xwe ez wî nasnakim. Hem ne navê wî, û ne jî navê gundê wî min seh nekirîye. Û ez bi wî bawer jî nabim. Lewra dilê min gelekî şewitîye. Belê ji vê pirsgirêkê ra çareserî lazim e. Ji bêçareyî ez vî tişta te gotî qebul dikim. Sibê bake wî bila bê pez bibe."*



Mamoste qasid şand, Bedo hat, pez bir, û berî da gundê xwe. Bedo Bedo ye. Guh di serî da dilivin. Çav di serî da dileyîzin. Bedo di dilê xwe da got: *"De here Bedo! Xwedayê mezin û bê heval îjar da te. Si'uda te vebu. Ha bavê bavê mino! Şêro bi lepê xwe."*

Sal zîvirî. Ji xwe rojên bi jimar zu xelas dibin. Bedo 'elbek mast û postek bizinan kirye destê xwe, berî da bajêr, çu qesra dadger. Ewê hesabê xwe bibînin. Bedo got: *"Xalê Dadger! Li "Gîharê Sor" li "Birekê Emer Ağa" bîst pez ji tahtê ket û mirin. Li ser "Kanîya Qamîş" gur ket nav hijdeh kuştin. Li "Newala Dara Mazi" hirç ket nav diwazdeh kuştin. Li "Guhera Guhujê" dîsa gur ket nav nozdeh kuştin. Hebek hat heşt mirin, av rabu yazdeh di ber çun, zerik hat heft mirin, kerimok hat çar mirin. Talî mabu bizina kirî beş. Min ew bizin doşt, evîya şîrê wî ê dawî ye. Min kir mast û pişt ra li ser rêya qîr a ku nû çêbuye wesayîtek sor lê ket ew kuşt. Hema min serjêkir. Heram neçu. Ev jî potê wîye min ji te ra anîye û ez bi xêr, tu bi selamet. Hesab ev e. Ez bi xebata xwe tu bi malê xwe."*

Dadger hingî ku hêrs bu, nema zanî bê ka ewê çawa bike. Hema 'elba mast girt û bera ser serê Bedo da. Bedo di derî ra derket. Li paş derî Mamosta 'Elî rastî wî hat: *"Bedo ev çi hale bavê min?"* Bedo: *"Herê Mamosta! Mirov bi rusipîtî hesabê xwe bide, halê mirov ê ev be."*

***Mamoste Faruqê Çiyayê Mazî***

## Ma Qey Kesî Xwend?

Gur û rêvî ji demeke dirêj de li serê çîya nêçîrê dikin. Êdî birçîbunê li serê wan xistîye. Lewra newêrin dakevne deştê û jiboy xwarinê êrişî pez bikin.

Rojekê gur û rêvî li serê çîya bi hev re dişteğilin. Rêvî dîbeje: *"Brayê Gur! Tu halê me dibînî? Bê çewa em li serê van çîya lipey mar û kêzik û tupişka ne, da em zikê xwe têr bikin. Li alîyekî din ev deşta ha tije pez e. Goşt û xwarin pir e. Lê em li serê vî çîyayî birçî ne."*

Gur dibêje: *"Tu rast dibêje. Belê heger em dakevne deştê ewê şivan û kuçikên wan me sağ nehêlin. Nahêlin em tiştekî bi dest xin."*

Revî: *"Rast e. Lê ezê ji te re nivişteke çêkim. Bi vê nivîştê ewê kes nikaribe zirarekê bide te."* Gur qebul dike. Rêvî nivişteke çêdike û bi stûyê gur vedike. Gur xwe berdide deştê. Hêvîya wî goştê pir e. Lewra; mî, bizin, ga û heywanên din li deştê diçêrin.

Bi van xeyalan gur tê deştê. Belê wexta pîyê xwe davêje deştê ji her alî de şivan û kuçikên wan êrişî gur dikin. Gur dest bi revê dike û canê xwe zor xelas dike. Bi hilke hilk tê ba rêvî.

Rêvî dibêje: *"Te xêr e brayê gur? Ma çibu?"* Gur dibê: *"Min canê xwe zor xelas kir. Hemuka êrişî min kirin."* Rêvî dibê: *"Ma nivişta min çêkiribu ne di stûyê te de ye?"* Gur dibê: *"Belê nivişt di stûyê min de ye. Lê ma qey kesî xwend; ku zanibin lazime êrişî min nekin!!!"*

***Haci Weysî SIPYAĞÎ***

# Beyatname [1]

Bîsmîllahîr-rahmanîr-rehîm, elhamdu lîllahî rebbîl-'alemîne we selat û we selamû 'ala seyyîdîna Muhammedîn we 'ala alîhî we sehbîhî ecme'în.

Ez bi zanayîşê vatîşî xu şehadetî dana, eşhedû enla îlahe îllellah ve eşhedû enne Mûhammeden resûlûllah.

Yani ez gayrî Allahû te'ala çeyî r' îbadet we îtaat nîkena. Ez gayrî vatîşî Allahû te'ala bi vatîşî çoy îhtîqat ve 'amel pi (pê) nîkena.

Ancî (ez) bîzanîyîş û vatîşî xu şehadetî dana, Mûhammed Selle'llahû we sellem peygamberî axîr zaman û resûlî Homa yo te'alay û; gayrî vatîşî yî bi vatîşî çoy îhtîqat ve 'amel nîkena, ancak bi hûkmî Şerî'ati Îslam 'amel kena.

Emîr ve nehyî şerî'atî Îslam, (ez) di nefsî xu d' we di nefsî ehl û 'ayalî xu d' we di mal xu d' ana ca we pi 'amel kena. (Ez) bawerî bi caardîş ferzîyetî nîmaji panc waqt ana, ca ardîşî edayî panc waqt nîmac îman û, nî caardîş nîmaj we terkî nîmaj kufr û; bînîmajî (bênimajî) ser bimirû, şinû cehennem, zana.

Eger camî we cema'at nîbû, daîmî di key xu d', (ez) ezanî waqt, sunnetî ratîbanî waqt we tesbîhanî waqt bi ehlî xu, bi cema'at ana ca.

(Ez) bawerî bi dayîşî zekat ana, her serr hezî vatîşî şerî'at zekatî xu dana. Dayîşî zekat îman zana we nîdayîşî zekat murtedîye zana. Kom zekat bidû benû zengîn we bereket konu malî yî, zana.

(Ez) bawerî bi caardîşî farzîyetî sewmî ramazan ana; her serr, di aşmî ramazan di roce gena, roceguretîş yî sedeqatî îman û nîguretîş yî munafiqî ya, zana. (Ez) terawîhan kena ha bi cema'at ha tena, we zekatî fitir dana we pîya muslumanan roci gena we roşan kena.

(Ez) bawerî bi ferzîyetî hac ana, eger mî rî



Şêx Selaheddîn
Naqşîbendî el-Palewî

şîyayîşî hac muyesser bibû, ca ardîşî hac xu d' ana ca, bi temamî menasîkî hac 'amel kena.

Ez bawerî bi temamî awamîr (ewamîr) û newahîyî Homayî te'ala cc. ana we kam bi temamî xu d' bîyarû ca, resenû rehetî yû selametî dunya we axîret we pi 'azîz serfîraz benû konû zumreyî 'îbadu's-salîhîn.

Ez bawerî bi emr û nehyî vatîşî Resûlu Ekrem yaqînen ana, pi 'amel kena. Bi xîlafî vatîşî Resûlî Ekrem bawerî pi nîana we pi 'amel nîkena bi duşminanî yîn ra haz we dostayî nîkena we yîn dima nîşîna, kam yîn ra haz bikrû we dostayî bikrû yeqînen mumîn we musluman we Îslam nîyû Cenabi Haq te'ala îman we ta'atî yîn qabul nîkenû.

Ez bi gayrî partîyî Haq te'ala ra wet, yanî hîzbûllah ra wet temamî partîyan ra we terîqî delalet ra dur we berî ya; yardim we me'awînet yîn nîkena welew kî pî min bû we laj min bû we biray min bû we aşîretî min bû. Laîlahe îllallah Mûhammedû'r-resûlullah. (Ez) dostî Homayî te'ala we Resûlî Ekremî ya. Bi ena vatîş ra wet ra çoy rî vatîş mîn çînî yû (yo)

Hatta merg enû îhtîqatî xu ser dewam we pi 'amel kena, înşaallahû'r-rahman we mînhû'l awnû we'l-îhsan.

Kam bi sitqû (sidqo) rastî we bi menfîatî dunya enû (nê) panc ruknan 'amel bikrû bi

xîlafî watîşî Homayi we Resûlî Ekrem îtaat we pi 'amel nîkrû, benû ehlî se'adet, şînû cennet.

Gerek yeqînen bizanû kam gayrî homayî teala cc. 'îbadet we îta'at bikrû we dûşmînani yîn ra haz bikrû yeqînen şinû cehennem.

Kam îtaatyî şerîat nîkrû we pi 'amel nîkrû, watîşanî duşminanî Homayi te'ala dima şeyrû, musluman we mumîn we Îslam nîyû, Homayî te'ala çik yîn ra kabûl nîkenû. Yanî nîmaj`yî, Z-zekat yî, rocey yî we hac yî betal kenû; sebeb, haskerdîşî duşmîn we watîşî duşmînanî yîn dima şîyayîşû.

Kam yeqînen bi ena şekîl, xasseten lî'llahî te'ala ra sadiqane 'îbadet we îta'at bikrû we gayrî Homayî te'ala ra nîtersû we gayrî yî çoy dima nîşîrû, benû mumîn-î kamîl we dunya we axîret (de) resenû se'adet we selamet; bi nûrî kemalî îman munewwer benû, konû zumreî meşaleyî des (û) hîrîn we şînû hawzî Kewser ser, pîya Resûlî Ekrem pirdî sîrat ser vîrenû şînû cennetûl Fîrdews benû layîqî dîdarî Homayî teala we benû cînarî resûlî Ekrem.

Kam bi ena şeraîtan beyat bikrû, hatta merg ser windirû, ez bena kefîlî yî enî nîmetan, lewra mubellîğa şîma rî rayî se'a(de)t beyan we tarîf kerd kî, (şima) daxîlî zumreyî hîzbûllah bibîn [1] ; muhaqqaq şîma benî galîbî dunya we axîret, ela înne hîzbellahî humu'l-ğalîbûn. Yanî agah we hîşyar bibîn, galîbîyet se'adet partîyî Homayî ta'alahû, dewam bikrû benû galîbî dunya we axîret.

Ey mumîn! En vatîşan we kalan rin(d) bid(e) hiş-aqil xu, manayî bizan, sarî ho fîn, ser vîndîr zaf zaf tekrar bikir we şekhu we şuphe kalb tu ra şeyrû we 'aynel yeqîn tu rî hasîl bibû; hînî vatîşî muxalîfan we munkîran tu di tesîr nikrû, şeytan we tabî'î şeytan tu nîxapînû; lewra (ti) vîneni munkur roj û şew karî yîn fîtne we fesadîyî salîhan û. Daîma zem yîn kenû. Çî yîn dest ra bîrû taqsîr nîkenû, pîya tabî'an xu şima dima konî hatta şima bikîr hezî xo. Zînhar goş mekû vatîşan yîn, (ê) şî delalet we felaket, wazenî şîma bikîrî anbazî xu; ti hînî zana mekrû hîllî yîn, muslumanîyî xu ser dewam bikir, bizanin we'l-aqîbetû lî'l-mûtteqîn ray se'adet we selamet we galîbîyet ma rî îhsan bikrû. En beyat xu dima şîrin, şîma resenî ganîmetî dunya we axîret, wellahû 'ala ma n(e)qûlû wekîl [2] we'l-hamdû lî'llahî rebî'l-'alemîn.

**Amadekar: Bîlal Nêribij**

## FERHENGEK

**'ala:** ser, ser o
**anbaz:** embaz, heval
**awamîr:** ewamîr, emrî
**berî:** xelîsîyaye, fîlîtyaye
**beyat:** bey'at, qebul û tesdîq
**cc.:** celle celaluhu
**cînar:** cîran
**çeyî / çoy:** yewî, kesî
**d':** de, di
**dîdar:** rî
**en / enû:** no
**en / enî:** nê
**ena:** na
**haz kerdiş:** hes kerdiş
**hezî:** sey, zey
**hîzb:** 1)qism, zumre 2)terefdar 3)partî
**hîzbûllah:** 1)terefdarê Homayî, 2)partîya Homayî
**'îbadu's-salîhîn:** evdê salîhî, evdê başî
**îhtîqat:** îtiqad, bawer kerdiş
**îta:** tîya
**lewra:** çunke
**me'awenet (er.):** ardîm, muawenet
**mekr:** deke, xape, hîle
**menasîkî hac:** ruknê hacî
**mubellîğ:** teblîxkerdox, keso ke teblîx keno
**munkîr / munkur:** înkarkerdox, keso ke înkar keno
**mutteqî:** keso ke Homayî ra terseno
**muyesser bîyayîş:** bî asanîye bîyayîş
**murted:** keso ke dînê îslamî ra vejîyeno
**nehy:** qedexe, yasax
**newahî (er.):** Qedexeyî, yasaxî.
**pi :** pê, bi
**ratîb / rewatib:** 1)ê ke ferz nîyê, sunnetê muekkede 2)zîkr
**r' / rî:** rê
**sewm:** roje, roce
**terîq:** rayîr, rar
**welew:** wazena wa, hetta
**wet:** o het
**galîb:** serkewte, xalib
**gayrî:** ...ra teber, bê
**xîlaf:** vera, zîd, eks
**xu:** xo
**yî:** ey
**yîn:** înan
**zînhar:** nêbo ke, saqin
**zobîna:** sewbîna

1. Beyatname (Bîatname) mewludanê Ehmedê Xasî û 'Usman Efendîyo Babijî dima kitabê hîrin ê kirdkî (zazakî) yo ke neşr bîyo. Şêx Selaheddîn, no beyatname seba murîdanê xo bi herfê latînî nuşto û serra 1977 de çap kerdo û nimite vila bîyo. Peynîye beyatname de seba murîdan yew vîrd (zikir) zî nusîyayo. Şêx Selaheddîn lacê Şêx Seîdî yo. 'Eslê nê broşurî bi alfabeya tirkî nusîyayo. Semedo ke na alfabe de herfê Ê, Q, W, X çinê yê, wendişê û famkerdişê ey zehmet o. Ma nê herfan bedelna û newe ra bi alfabeya kurdkî nuşt û hetê rastnuştişî (îmla) ra goreyê zanayîşê xo rast kerd; labelê ma telaffuzê nuştî qet nêbedelna. Ma tay parentezan zî nuşt ke tay kelîmeyan hina weş bêrê famkerdiş. Seba rastnuştişî ma no nuşte ra îstîfade kerd: *Malmîsanij, Şêx Selaheddînê Şêx Seîdî û Beyatname; Kovara Vate, Humara 16, r.8-16; 2002*
2. No qism de beno ke meqsed wina bo zî: "Lewra [ez] mubellîx a, [mi] şima rî rayî se'a[de]t beyan we tarîf kerd kî [şima] daxîlî zumreyî hîzbûllah bibînî."
3. **"wellahû 'ala ma n(e)qûlû wekîl":** wa Homa vateyê ma ser o wekîl bo.

Adem Gönül

# Edeb û Heya

Qey muslimanan namûs, qel'eyke şedîdo. Lewra tenêke de namûs çinêbo, êde şexsîyet zî nêmaneno. Edeb û Heya û Namus bi ma'neykey. Heme zî 'elametê 'efîfî û pakîtîye însanê.

Eno dewir de, ehlê kufr û tuğyanê, semedê wedartişê edeb û heya-y herb 'ilan kerdo. Nêwazenê ehlê îmanî, binamûs û heya bimanê. Namûs û edep; qey emelê şeytanîye îne manî'eykew. Ehlê kufr û tuğyanî, wazenê însanan bifînî sûretî heywanan... Zey heywanan bikoy têmîyan û dimay şehwetê xu şêrê.

Derheqê ene meselî de, ehlê şeytanî kewtê meydanan û qîrenê û vanê **"Ma namûsê yewî zî nîyê. Namûsê ma azadî û serbestîye maw!"** Ma meqsed û ğayey îne fa'm kerdo. Lewra da'wet û govendanê înede, azadîye cînîyan ma vînenê. Mêrde û cînî, keyna û lacê konê destê yobînan û bê fedî reqesênê. Xeyalê îcraatê Marks û Lenînê kenê. Le belê hesabê muslumanan nêkenê. Qedr û qiymetî nî'metanê Allahî nêzanê.

Enê newînan ra ma vanê: **"Eno welat, welatê muslumanano. Çi Zaza beno û çi Kurmanc... Xelqê ma muslumano. Bi namûs û şerefo. Hezar sere zî derbas bo terkê namûs û edebê xu nêkeno. Enî baş fa'm bikerê, bi neyartîye dînî Allahî şima nêrisenê muradê xu. Bi fikr û rêçey Ewrupa, Kurmanc û Zazan şima nê eşkenê bixapênê.**

Hem wa bêro fa'mkerdişî; derheqê edeb û namûsî de ma vatişê Allahî û Resulullahî anê ca... Homa, ma ra reyir moto. Ma, bê qeyd û şert, mutî'î emrî Allahî benê... Rebbê ma Quran de ana vato:

**"Ey Resulê min! Muminan ra vace: wa nêhanê hêram ra, namûsê xu wa mihafeze bikerê! Eno înerê daha paktiro. Birastî, Allah, temamê kerdişê înera xeberdaro. Hem cînîyê muminan ra vace: Wa nehanê hêram ra, namûsê xu mihafeze bikerê! Wa xemlê xu nêvecê âşîkar û çîtê xu verdê serê kuftanê xu..."** (Surey Nurê: 31)

Ayetêke bîne de, mihafeze kerdişê namûsî, naberê şertê muminan de hamew hesebnayişî:

**"Muminê; nimacê xu bi xûşu' de kenê, çîw beyhûdera rî xu çarnenê, zekate xu danê, namûsê xu mihafeze kenê, emanet û 'ahdê xu ra rî'ayet kenê."** (Surey Muminûn: 1-8)

Derheqê ene meselî de Resûlî Homa'y zî za'f vatiş vato: **"Her dînî de exlaqêke xûsûsî esto. Exlaqê îslamê zî heyaw."** (Tirmîzî)

**"Cînîyke panc wextî nimacê xu bikero, namûsê xu mihafeze bikero, bi mêrdey xu baş derbasbo... Ka heb berê Cennetîra biwazo go derbasbo."** (İbn-î Hîbban)

**"Semedê ke şima xirabîra bêrê mihafezekerdişî; bi nîkah û bi 'îffet bê."** (İbn-î 'Asakîr)

**"Ey gelê xortan! Namûsê xu mihafeze bikerê, zîna mekerê! Enî baş bizanê, kam namusê xu mihafeze bikero, êrî Cennet esto."** (Hakim)

**"Çimêke nihano heramra, agirê Cehennemî nêvîneno"** (İsfehanî)

**"Kamo ke 'ewretê xu âkero û banîro 'ewretê şarîra, la'netê Allahî yî serbo!"** (Beyheqî) **"Heya, îmanraw."** (Buxarî)

**"Ğîretê namûsî îmanraw. Kêfkerdişî cînî û mêrdan têmîyande nîfaqraw."** (Deylemî)

**"Heya rindo, lakîn cînîyandebo daha rindo."** (Deylemî)

**"Kamo ke, tersê 'ezabê Homay'ra rî xu cînîyî ğerîbanra biçarno a, Allah te'mê îbadetî dano ci."** (Hakim)

**"Kamo ke 'erak boro, li daw bay xura 'asîbo û deyyûsbo; şîyayişî Cennetî êrî heramo."** (İmam Ahmed)


**"Eger şima bi namûsbê, cînîyî şima zî go bi namus bê."** (Hakim)

Temamê enî ayet û hedîsan ra yeno fa'mkerdişî; îslam, bê namûs û bê edebî qebûl nêkeno. Edeb û 'îffet, qey muminan tacê şerefîyo. Kam namûs û edebê xu mihafeze nêkero, we şeref û 'îzzê xu vinî keno.

Ey Rebbê ma! Edeb û heya ra ti ma mehrum nêkerê!

Ey Rebbê ma! Ti ma şerrê bê namûsanra mihafeze bikerê!

Ey Rebbê ma! Ti ma esîrî şeytan û nefsî nêkerê!



Kelhaamed

# A Menda Mar Muslumantira?

Muslumanî îna welatê mad wextê Hz. Ömer ra bîya hakim. Aye çağ ra heta îna çağ kom, qebla ma sey muslumantî xwu ser vinêrt. Pê vatiş İslom werzên, ronîşên. Çenek, tayê gure ser îna nîkense rina zaf guren xwu ser îna ken. Muslumanî înson marî sey awe şîrina. Weht yew mesla yin bîya, cad von: **"Ma şin şerîat."** Î nara, melatî, seydatî semed dîn Allah ser yen heskerdiş. Mîlletê ma ser zaf kay viraşt, yin zaf mazlumtî dî, çîle ont, zulum o hekaret dî. Reyna dîn îslom ser pay vinert. Labele tayê amel, gure, kal mîlletê ma İslom ra durî. Cahiltî, bîdat, hurafe muyonêd êst. Şîyayîş înson ma her weht reya heq sera.

Cînî, mêrik, con, extîyar... Ellah(c.c), yînir her çî. Weht sey zera xwu ra von **"Homa!"** deronid aw pesên! Homa, her çî viraşt; Rahîm o Rahman. Pîltî xwu ser virazyeyî xwud meşnon ra. Zafê meslon pê İslom o şura hel ken. **Çare problemo şerîat, cemaat.** Tay mesla rasên hukumat.

Dîn mabeyn ina mîlletid pê seran sera wehtan îrtîbat ê komelkîd cayê xwu gurewt. Melan her çağ dîn muhafeze kerd. Medrese zeyde, talîp îlîm bîya zed. Medresandî fikhê Şafi'î yen wendiş. Na erdonid mezhebê Şafi'î yena zonayiş. Dersê Quron, qissê pêxambero, şîyayîş alim o ewlîyan, fikih, amel senî yen kerdiş, hadîs... musnen. Tut dersê xwu awîl keyad gen. Her keyad Quron est. Mîllet, melan medresa melan dîyanet ra ver depişana. Mesla komelkîd goşdarî melan medresa ken.

Şîyayiş mîlletê mad ayetê **"Allah mar bes, O ci hol yew wekîl!"** çilawa. Qaderîr îmon zihm. Ayra tewekkul ser zerê yin hêzina.

Dewenid guron bexçê, bax, ard pîya virazên. Çere, genîm, cew xwu pîya çînen. Yew bînan tepîşen. Bînayte yinid yewî esta. Des erzen faqîr, yetîm. En verên kar yi virazên. Sankî ina ayet yinîr bena versî: **"Holî o teqwa ser yew bînan ardim bîkerê."**

Aqrebatî, xisimî beynatî mîllete mad pîta. Sila-î rahîm hema esta. Şew, rêj, payîz, wesar, roşan, merg, zewaj, nêweşî, zorîyêd şîyayîş/omayîş, persayîş/pêdestî zedon. Beyntarî aqrebatî o cîrantî la ne erzen. Tewr heskerdiş, des ertişid cîron xwu yew ling ver depişên. Heqqê cîrontî zon.

Nimac, roje, zika... Var ne verdên. Nimac, heyat. Yew merdim yew weht nimac ne rawynon. Eger nimac yi rawyase ina yir sey merg. Aşmê rojed tuton ra hetton pîlon herkes roje xwu tepîşen. Co roje xwu ne wen. Sedaqa, def e bela û musîbet yena zanayiş. Weht sey yew tut biya, newê yew eşya omî girewtiş, yew nêweşî virazya, yew rayî durî ra ome cad yew sedaqa erzen teber. Sedaqe yin yan perê, yan cil, yan çikê verdiş. Ekser roje îne sedaqa xwu don. Îna du'a semed sedaqa ken: **"Ya Rabbî ma bela, qaza, afat ra durî depeş, bi xelîsn!"**

Camî key Ellah (c.c) yên zanayiş. Zere camîyd kes bi edebî nêken. Camî pe des mîllet yena viraştiş. Camîî her çîyê. Uca semed nimac yen pêser, guran xwu uca halken. Uca cay şura, mesle uca yen qiseykerdiş. Zere camî pak tepîşeyn.

Çî herom ra xwu durî tepîşeyn. Çîm kes mal, namus kes ser nêben. Fal, sîhr... Çî ko necîs. Nazar ser înancê ko zihm est. Ayra herkes xwu nazar ra hifz ken. Ya yew sedaqa donî ya ayet ê nazar keyed alleqnên. Îna meslad cahîltîz zaf.

Cînnek, pê edeb xwu werzên, ronêşen. Çîman xwu cumerdon ğerîbon ra durî tepîşeyn. Weht veje teber emrê Ellah (c.c) ser himar u rîpêş ancen xwu. Himar yin ya çarşaf ya yew aba hîraye. Cînî, zere key yena zonayiş. Key pê des cînî yen çarnayiş. Cînî daye tuton xwu va, yîn terbîye kena.

Birayî şît o ahret zaf. Gerçî, mîllet birayî şît ra xwu kena. Nê vazên caddê qismet be qevilnê. Birayî axret, bawî/dayî ju birayî ra vera. Ay sey ju bînon ra hesken, qiymet donî ju bînan ekser mabeyn xwu d birayî û axret virazên.

Mîlletê a sond, adaq, nêweşî, tazîye ser vinena. Weht yew tut bi, yew zorî fetilya, yew gurê rind ame vernî yin; semed şikir Ellah (c.c) yew heywan waadnên.

Tazîyed herkes cay wayîr cenazid vinen. Des erzen yi. Nêverden key xwu d çîyê werdiş pêş. Hîrê roj cîran yi hêr gured des erzen yi. Cinaza neyna vindertiş, cad meyyît defin ken. Vasîyet ê merîk ayn ca. Lezîye vasîyet ser ina kelom yena vatiş:

| | |
|---|---|
| *Kefen mi bîya hazîr* | *Hînî cara qet nê şîn* |
| *Ave mi ha gîrêyena* | *Mal dunya aya miv* |
| *Melay he serî mi ver* | *Nê mend yew çarê* |
| *Ronîşt Quron wineyn* | *Ma Ellah ra ome* |
| *Azraîl omay fêk ber* | *Ma he şîn reyna Ellah* |

Kînç meyyît donî feqîron. Weht ze tut sebî merd, zan cîr sual qebr çîn. O tut cad şin cennet. Kam pê des xwu con xwu girewt yîr xelasî çîna. Zîyaret mezelo yen kerdiş. Kom şi mezel avîl silom donî meyyîtan. Bad uca ra merg xwu r Quron winen.

Roşayn Remezon û Qurbon pê la yen kaşkerdiş. Weht roşayn omê vernî şîn nimac roşan. Bad nimac roşan cemaat roşaynon ju bînayn persena. Uca ra herkes şîn key xwu. Ya kîyed vinen misafir qabul ken ya şîn çîron û eqreba persen...

Aya adet kî mîllete ma serda zaf sey muslumantîya. Maz îna adetan ra bahs çend heb kerd.

Şima hemê yemon Ellah (c.c) wê...

**Îbrahîm ÇABAKÇURÎ**

# Dest Hirayi

Dest hîrayî çitawa, berên ma dîn xura bi mus:

Dest hîrayî, hem zengîntid hemîz feqîrdit mal xu qê rizê Humê xerc kerdiş. Musluman gerek per xeyr dima vazd, mal xu riye Humêd xerc bikêr.

Kum qê xeyr çita xerc kerdse, Heq Te'ala hewirde yî ken de. Çunke ayîg mal xu riye Heq Te'alad don, munen yo bezri. O bezri hot weşê ğeli don, her weşê ğelidizîd se hev esta. Yanî kum yo xeyr bikirse, Heq Te'ala hewirde yî hot sê xeyr don.

Qe Hume pere xerc kerdişit servet kêm ni ben, daha ben zed. Huma mara von: "Ti mal xu riye mid bid, ez hewirde yî daha zed bi ti. Ayetê: **"Verê holi, holi wa"** yena ina ma'na.

Her rej di melek yen rî erd, aya di melekona yo ihna du'a kena: **"Ya Rabbi! Kum dest xu hîra depiş o mal xu qê ti bidse, ti hewirde ay mal daha zed bi yî!"**

Aya meleka bînîz îhna vuna: **"Ya Rabbî! Kum bexiltî bikirse, ti mal yî helak bikêr."**

Heq Te'ala helal qezençra xeyr qebul ken, heram qezençra qebul niken. Xeyr çendêk qijalekiwse qijalekiw Heq Te'ala ken zed, ze ko ken gird.

Merdim gerek fêk cizdon akir. Çunkê kum fêk cizdon tum a nikirse o mal xu tay bidse, Huma Te'ala berki ni erzen mal yî.

Pêxember ma bexiltîra xu kerdên. Du'an xud: **"Ya Rabbî! Mi bexîl mekir, bexiltî mira dûr fîn!"** Watên. Kum yîra yo çî biwaştên, heyat xud ni watên "ne!"

Yo roj newi Musluman biw yo merdim, pêxember mara yo meşna waşt. Pêxember ma yo meşna ne, yora zaf meşnê dê ci. O merdim waxt şi dewê xu, dewijon xura va: **"Hadê şerên, Musluman biwen! O pêxember, feqîrtira ni tersen."**

Înson ina dunyad fanî. Çendêk zêngînîwse zêngînîw mal yî îtad munen. Waxt merdse, mal xu riye xêronid xerc nikerdse, o mal mulk yî cîr faydi nidon.

Berên ma binê pêxember ma geştarîk, semêd bexiltî von se:

Bexiltîra daha xirav yo niweşî çîna.
Bexiltîwo îmon yo qelbid pa nibên.
Yo Mumîn hem bexîl hem exlaqxirav niben...
Heq Te'ala vama dest hîrayonra bik, bexiltîra dûrik. (Âmin)

***Hesen ÇOLIGİ***

# دَعْوَا عَصَبِيَّتِى دَعْوَا ظُلْمِى يَه

عَبْدُ الصَّمَدْ حِلْمِي

**قَنْجْتِرِى وَه لِبَا خُدَا يِ تَعَالَى اَوِى كُو تَقْوَاوِي زِيدَه تِرَه. مُحَقَّقْ خُدَايِ تَعَالَى بِهَرْ تِشْتِي زَانَه اُو (هَرْ تِشْتِي هَيَه"** (حُجُرَاتْ: 13ِ) **خَبَرَا وِي**

دُو آلِيَاقَه هَاتِيَه خُلُقَانْدِنْ: آلِيكِي وِي لَوْرَا اِنْسَانْ مَادَّه يَه يَكْ ژِي مَعْنَايَه. آلِيى مَادِّي حَرِّيَه، آخَه. آلِيى مَعْنَوِي ژِي رُوحِى خُدَايِ تَعَالَى يَه اُو نُورَا وِ يَه. رَبِّ عَالَمِى بَرِى آدَمْ عَلَيْهِ السَّلَامْ ژِحَرِّيِى چِى كِرْ، پُشْتْرَه رُوحْ دَايِى اُو حَرِّي كِرْ قَالِبْ ژِبُونَا وِي رُوحِي. خُدَا اَوْ قَالِبي كُو ژِحَرِّيِى چِي كِرُ و وَرْگَرَانْدْ بِبَالْ گُوشْتُ و هَسْتِي وُ خُونِى ڤَه، بِعُنْصُرِى وِى حَرِّيِى ڤَه گِرِيدَا كُو اَوْ عُنْصُرْ ژِي دُنْيَايَه، اُو آخُ و آڤُ و حَرِّيَا كُو دُنْيَا ژِى هَاتِيَه وُجُودِى. اَوْ رُوحِى كُو عَقْلُ وفِكْرُو قَلْبْ خَوه پِيڤَه دِگْرِنْ ژِي بِعَالَمَا مَعْنَوِي ڤَه گِرِيدَا يَه، اُو رُوحْ ژِوِى عَالَمَا مَعْنَوِي تِى خُدِي كِرِنْ و قُوَّتَا ژِينَا خَوه بِتَمَامِي ژِوُرْ دِسْتِينَه.

آلِيى مَادِّي ژِانْسَانْ رَه ژِبَرْ كُو خُدَايِ تَعَالَى بِدَسْتِى قُدْرَتَا خَوه دِ "اَحْسَنِ تَقْوِيمْ" دَه آنِيَه وُجُودِى اُو كِرِيَه قَالِبْ ژِ رُوحُ و نُورِى رَه قِيمَتَكْ وِي هَيَه وُ اَوْ بِخَوه نِعْمَتَكِي پُرْ مَزِنَه. بِنْهِيرِنْ بِى شَيْخِى خَانِي ڤِي نِعْمَتِى خُلْقِيَتِى بِزِمَانِى عِشْقِى چَوَا نَظِمْ كِرِيَه وُ گُوهْدَارِى خَوه مَسْتْ كِرِيَه:

**سُبْــحَــانَــكَ كُــلَّمَا خَــلَــقْتَ[1]**
**اَحْسَــنْتَ فَكَــيْفَ مَــا فَلَــقْتَ**

**هَرْ چِي كُو تَه چِي كِرْ اَيْ نِكُو كَارْ هَرْ**
**يَكْ دِحَدِّى خَوه دَا سَــزَاوَارْ**

غَيْرْ ژِوُجُودَا اِنْسَانْ تِشْتِينْ مَادِّيِينْ دِي ژِي هَنَه كُو اِنْسَانْ بِوَانْ ڤَه گِرِيدَايِي يَه يَانْ ژِي اَوْ بِاِنْسَانْ ڤَه گِرِيدَايِي نَه. وَكْ زِمَانْ، عِرْقْ، رَنْگْ، خُونْ، وَلَاتْ، تَارِيخْ اُو چَانْدَه (كُولْتُرْ). لِى قِيمَتَا تِشْتِى مَادِّي تَمَامِى وِى ثَابِتَه، لِگُورْ حَالُ و عَمَلُ و وَقْتَا كِيمُ و زِيدَه نَابَه. بَلِى آلِيى مَعْنَوِي ژِانْسَانْ رَه هَمْ ژِبَرْ كُو خُدَايِ تعَالَى ژِجَمْ خَوه ڤَه دَايَه اِنْسَانْ بِقِيمَتَه هَمْ ژِي ژِبَرْ عَمَلِى قَنْجُ و خَرَابْ — كُو مَعْنَوِي نَه- قِيمَتِى وَانْ كِيمُ و زِيدَه اُو مَزِنُ و بِچُوكْ دِبِنْ بِقِيمَتَه.



مَثَلاَ آڤَايِيكَه كُو بِكَڤِرَا هَاتِبَه آڤَا كِرِنْ؛ آلِيى وِى يِى مَادِّي لِگُورْ جِسْمِى وِى يَه، اُو كِيمُ و زِيدَه نَابَه. لِى بَلِى جِهَتِى وِى يِى مَعْنَوِي لِگُورْ مَقْصَدَا آڤَا كِرِنَا وِى اُو عَمَلِى كُو تِيدَه تِى كِرِنْ گَشْ دِبَه، فِرَه دِبَه، مَزِنْ دِبَه اُو حُرْمَتْ دِسْتِينَه، يَانْ ژِي حُرْمَتَا خَوه وَنْدَا دِكَه اُو دِبَه سَبَبِى كُو لَعْنَتْ وَرَه خَونْدِنْ. قِيمَتَا مَدْرَسَا بِتَحْصِيلاَ عِلْمِى دِهُنْدُرِى وَانْدَه يَه كُو دَرُو دُورِى خَوه بِعِلْمُ و عِرْفَانِى شِينْ دِكِنْ, نَه بِدِيوَارُ و كَڤِرِى كُو پِى هَاتِنَه وُجُودِى. قِيمَتَا لَمْبِى ژِى بِرُهْنَايِيَا وِى يَه كُو اَمْ ژِى اِسْتِفَادَه دِكِنْ، قَالِكِى وِى ژِي بِرُهْنَايَا وِى قِيمَتْ دِسْتِينَه. پِشْتِي كُو تِيلِكِى نَاڤَا وِى نَمَا رُهْنِي دِدَه قَالِكِى وِى وُ رَوْشَا وِى هَرْچِقَاسْ زَرَارْ نَه دِبِتِبَه ژِي اَمْ رَادِبِنْ وِى لَمْبِى دَاڤِيژِنْ سَرْ پُوخَانِى.

اِنْسَانِى كُو ژِحَرِّي وُ نُورِى هَاتِيَه خُلُقَانْدِنْ لِگُورْ تَرْكِيبَا خُلْقِيَّتَا خَوه تِيدَه دُو خُصُوصِيَتُ و تَمَايُلْ هَنَه: يَكْ ژِى اَوْ تَمَايُلاَ حَيْوَانِي كُو دِتَمَامِى حَيْوَانِى زِنْدِي يِى دِنْ دَه ژِي هَيَه. آدُدُوَا اَوْ تَمَايُلاَ اِنْسَانِي كُو اِنْسَانُ و حَيْوَانَا ژِ هَڤْ دِقَتِيينَه. اَڤْ قَسْمِى دُدُوَا خَاصِى بِاِنْسَانْ ڤَه يَه، دِحَيْوَانَا دَه تُنَه يَه. تَمَايُلاَ مُشْتَرَكْ (هَڤْپَارْ) دِنَاڤْبِينَا اِنْسَانُ و حَيْوَانْ دَه "سَوْقَا طَبِيعِي" يَه كُو بِتِرْكِي ژِيرَه دِبيژِنْ "iç güdü" تَمَامِى ذِي رُوحَا -اُو اِنْسَانْ ژِي- بِسَوْقَا طَبِيعِي بِى حَمْدِي هِنِكْ تِشْتَا دِكِنْ: وَكْ تِي بُونُ و بِرْچِي بُونِى، حَسْكِرِنَا ژِوَلاَتُ و مَالُ و مُلْكْ، خَبَرْدَانَا اِنْسَانِى كُرْدْ بِكُرْدِى، اِى تِرْكْ بِتِرْكِي، مُدَافَعَا نَفْسُ و اَوْلاَدَا لِهَمْبَرْ ظُلْمِى وَسَائِرَه.

ژِهَرْكَسِي ڤَه مَعْلُومَه كُو اَڤْ خُصُوصِيَتْ دِحَيْوَانَادَه ژِي هَنَه. بَلِى فَضْلاَ اِنْسَانْ لِسَرْ حَيْوَانُ و مَخْلُوقَاتِينْ دِنْ بِتَمَايُلاَ اِنْسَانِي يَه. عَلاَمَتِى ڤِى تَمَايُلِى يِي مَزِنْ ژِي، "شُعُورُ" و "اِيمَانَه". كَسِى بِسَبَبْ تَمَايُلاَ اِنْسَانِي شَخْصَكِي مَحْكُومْ بِكَه؛ مَثَلاَ ژِيرَه بِيژَه :"گَرَكْ تُو بِكُرْمَانْجِي خَبَرْ نَدِي" ظُلْمَه. اُو اَوْ كَسِى كُو تَمَايُلاَ اِنْسَانِي بِكَه مَزِيَتْ ژِخَوه رَه؛ مَثَلاَ قَوْمِى خَوه ژِ قَوْمِين دِي چِيتِرْ بِبِينَه اَڤْ ژِي ظُلْمَه. دِبَه كُو اِنْسَانْ ژِزِمَانُ و وَلاَتُ و قَوْمِى خَوه حَسْ بِكَه بَلِى دَمَا كُو مِرُوڤَكْ ژِ تِشْكِي حَسْ بِكَه اُو بِيژَه گَرَكْ هَرْكَسْ ژِڤِي تِشْتِي حَسْ بِكَه، اَڤِيَا هَمْ ظُلْمَه هَمْ اَحْمَقِي يَه. هَا عَصَبِيَتْ اَڤْ ظُلْمُ و اَحْمَقِيَه. حَتَا ژِڤِى ژِي وُرْدَه تِرْ عَصَبِيَتْ اَڤَه كُو اِنْسَانْ ژِآلِي خُلْقَانْدِنَا ژِآخِى خَوه چِيتِرْ دِبِينَه. هَرْ مِلَّتْكِي لِبَا خَوه دِبِيژَه: "حَرِّيَا كُو اَزْ ژِي چِي بُومَه اُو هَاڤِينِى حَرِّيَا مِنْ أصْلِيَه قَنْجَه، قَوِينَه؛ حَرِّيُ و هَاڤِينِى ڤَانْ مِلَّتِينْ دِي نَه تُو هَاڤِينُ و حَرِّيَه. حَتَا اَوْ ژِچِرَاڤَا گَنِي چِى بُونَه" اَڤَانَا اَوْ كَسِنْ كُو خُدَا دِقُرْآنِى دَه دِحَقِّى وَانْدَه دِبِيژَه: "بَلْ هُمْ اَضَلُّ" (اَعْرَاف: 179) يَانِي ڤَانَا ژِحَيْوَانَا بِيتِرْ خَوه شَاشْ كِرِنَه. چَاڤُ و گُوهِى وَانْ هَبِنْ ژِي حَقِّيِى نَه دِبِينِنْ نَه فِيمْ دِكِنْ.

اَڤْ تِشْتْ، دِبِنْ سَبَبِى اَنَانِيَتِى، كِبْرِى، غُرُورِى اُو كُورْكِرِنَا فِيمِى. لَوْرَا اِنْسَانْ كُو قُرَّه دِبَه خَوه چِيتِرْ دِبِينَه. خَوه ژِفِيمْ كِرِنَا حَقِيقَتَارَه دِگْرَه. اَڤْ ژِي دِبَه سَبَبِى شَرُّ و حَرْبُ و فِتْنِى. فِتْنَه ژِي شُغْلِى شَيْطَانَه. يَانِي چَوَا كُو شَيْطَانْ خَوه ژِآدَمْ عَلَيْهِ

السَّلاَمْ مَسْتِرْ دِيتُ و گُوتْ "اَزْ ژاَگِرِمْ آدَمْ ژِحَرِّيِى يَه. آگِرْ ژِي ژِحَرِّيِى چِيتِرَه" اُو نَچُو سَجْدِى وُ بِڤِي سَبَبِي ژِرَحْمَا خُدَا دُورْكَتْ، عَيْنِي بِڤِي شَكْلِي كَسِى بِخَصْلَتِى فِطْرِي خَوه مَسْتِرُو چِيتِرْ بِبِينَه ژِرَحْمَا خُدَا دُورْ دِكَڤَه اُو دِكَڤَه رِيَا شَيْطَانْ. ژِبَرْ كُو نِكَارِنْ دَلِيلاَ بِينِنْ ژِگُوتِنِينْ خَوه رَه دَسْتْ بِدَرَوَانُ و خُرَّافَانْ دِكِنْ، تَارِيخِى تَحْرِيفْ دِكِنْ. كَسِينْ كُو بِتَارِيخِي مَشْغُولْ دِبِنْ ژِي بِوَانْ تِينْ خَاپَانْدِنْ. چَوا كُو هِنْ قَوْمِينْ عَصَبِى دِشُغُلِنْ ژِبُو اِثْبَاتْ بِكِنْ كُو تَمَامِى گَلِينْ دُنْيَايِى دِاَسَاسْ دَه ژِگَلِى وَانِنْ؛ وَكْ عَصَبِيَتَا هِتْلَرْ كُو دِگُوتْ: "كِي بِخَوازَه ژِي نَه خَوازَه ژِي هَرْ كَسْ اَلَمَانِي يَه" مَعْنَا ڤِى گُتِنِى اَڤَه: يَانِي هُونْ بِخَوازِنْ ژِي نَه خَوازِنْ ژِي اَزِى وَلاَتِينْ وَه اِسْتِلاَ بِكِمْ.

هَاتَه زَانِينْ كُو عَصَبِيَتْ خَوه بِآلِيِى اِنْسَانِي مَادِّي ڤَه دِگْرَه. اَڤْ ژِي دِبَه سَبَبِى دُورْبُونَا ژِخُدَا. چَوا كُو شَيْطَانْ ژِي ژِرَحْمَا خُدَا دُورْكَتْ. قَنْجِتِرْبُونَا اِنْسَانْ بِنِيزْبُونَا بِبَالْ خُدَا ڤَه چِى دِبَه. كِي نِيزِي خُدَا بِبَه اَوْ قَنْجْ دِبَه. اَڤْ ژِي بِحَرِّيَا عَصَبِيَتِى چِى نَابَه. آنْجَاغْ بِجِهَتِى نُورِى چِى دِبَه كُو خُدَا اَوْ نُورْ ژِي دَايَه اِنْسَانْ. شَيْخِى خَانِي ڤِيَا دِبَيْتَكِى دَه بِشَكْلَكِي خُوشِكْ خُلاَصَه كِرِيَه:

**اِنْسَانْ بِخَوه هَمْ ظَلاَمَه هَمْ نُورْ        آدَمْ ژِ تَــه**
**هَمْ قَرِيــبَه هَمْ دُورْ**[2]

قِيمَتُ و بَاشِيَا بِنُورِى ژِي بِاِيمَانُ و عَمَلِى صَالِحُ و تَقْوَايِى خَوه دِدَه نِيشَانْدَانْ. آيَتَا سُورَتِى حُجُرَاتْ كُو مَه ذِكِرْ كِرْ سَرِى وِى اَڤَه: **"اَيْ گَلِي اِنْسَانَا مَه وَه ژِ زِلاَمَكُ و پِيرَكَكِي خُلُقَانْدْ"** يَانِي ژِآلِي خُلْقِيَتَا بَشَرِي ڤَه هُونْ تَڤْ وَكْ هَڤِنْ. لَوْرَا دِى وُ بَاڤِى وَه يَكِنْ. رَنْگُ و عَرْقُ و مِلَّتِى وَه چِه دِبَه بِرَا بِبَه. "هُونْ تَڤْ ژِآدَمِنْ آدَمْ ژِي ژِحَرِّيِى يَه"(خُطْبَةُ الْوَدَاعْ) يَانِي مَادَمْ هُونْ ژِي بِوِى وَسِيلِى ژِحَرِّيِى نَه بَاشِيُ و بِلِنْدِيَا رُتْبِى ژِآلِي حَرِّيِى ڤَه نَه تُو خَبَرْدَانَه. دَاوِيَا آيَتِى ژِي اَڤَه: **"قَنْجْتِرِى وَه لِبَا خُدِى تَعَالَى اَوْ كَسِى كُو تَقْوَا وِي زِيدَه تِرَه"**

ژِپَاشِيَا آيَتِى سِى مَعْنَا دَرْتِينْ:

1 – قَنْجِي وُ قَنْجْبُونُ و قَنْجْتِرْ بُونَا مُعْتَبَرُ و حَقِيقِي لِجَمْ اَللّٰه تَعَالَى يَه.

2 – لِجَمْ اللّٰه تَعالى ژِي قَنْجْتِرِي وُ بِلِنْدْتِرِي بِتَقْوَايِي يَه.

3 – كِسِي تَقْوَا وِي زِيدَه تِرْ لِجَمْ اللّٰه تَعَالَى قَنْجْتِرَه يَانِي اَوْ چَاغْ دِتَقْوَايِى دَه كِيمَاسِي وُ زِيدَه بِي چِي دِبَه، دِخُلْقِيَتَا ژِآخِى دَه چِى نَابَه.

مَه نِيَتْ نَكِرِبُو كُو لِسَرْ مَاهِيَتَا عَصَبِيَتِى هَوْقَاسْ دِرِيژْ بِسَكِنِنْ. دِحَسَابْدَه آزَادِي وُ يَكِيتِي ژِي هَبُو، لِى بَلِى وُهَا چِى بُو. خُدَا بِى هَرِى دِژمَارَا پِيشِيَامَه دَه اَمِى لِسَرْ ڤَانْ مَسَلاَنْ بِسَكِنِنْ.

---

[1] مَمُ و زِينْ ، شِيخْ اَحْمَدِى خَانِي

**نِكُوكَارْ:** صَنْعَتْكَارِى خِيرَا

**سَزَاوَار:** لاَئِقْ، مُنَاسِبْ

مَمُ و زِينْ ، شِيخْ اَحْمَدِى خَانِي [2]

# اِيمَانُ وِ اِسْلاَمْ

**وَانْ كَسِينْ كُو اِيمَانْ آنِينَه وُ عَمَلِينْ قَنْجْ كِرِنَه اَمِى وَانْ دَاخِلِي جَنَّتْنَا بِكِنْ كُو دِبَرْ قَصْرُو قُونَاغِينْ وَانْدَه اُو دِنَاڤَا دَارُو بَرِينْ) وَانْدَه چَمْ دِهَرِكِنْ. اَوِى اَبَدِي دِوَانْدَه بِمِينِنْ. ژِوَانْرَه دِوَانْ جَنَّتَانْدَه ژِنِينْ پَاقِژُو نِشْمِي هَنَه. اُو اَمِي وَانْ تِيخِنْ بِنِى سِهَكَه دَائِمِي كُو طَاڤَا رُوژِى وِى وَنْدَا نَاكَه اُو نَه گَرْمَه وُ نَه صَارَه.**

سُورَتِى نِسَاء: 57

سَبَبِى خُلْقِيَتَا اِنْسَانْ اِيمَانُ و اِسْلاَمَه. يَانِي خُدَايِ مَزِنْ اَمْ تَڤْ چِى كِرِنَه دَا كُو اَمْ وِي نَاسْ بِكِنْ، اِيمَانِى پِى بِينِنُ و تَسْلِيمْ بِبِنْ ژِقَانُونُ و نِظَامَا وِي رَه كُو سَازْ كِرِيَه وُ بِقَاصِدِينْ خَوِيْ پَاكْ رَه عَلَيْهِمُ السَّلاَمْ شَانْدِيَه. وِى دَمِى اَوِى ژِي مَه دِدُنْيَايِ دَه عَزِيزْ دِآخِرَتِى دَه بَخْتِيَارْ بِكَه. ژِبَرْ ڤِي قَاسِي دِڤِى كُو اَمْ اِيمَانُ و اِسْلاَمِى بَاشْ نَاسْ بِكِنْ.

دِڤِى ژِمَارِى دَه ژِي اَمِى لِسَرْ مَعْنَا لَفْظِى اِسْلاَمِى وُ فَرْقَا دِنَابِينَا اِيمَانُ و اِسْلاَمِى دَه بِسَكْنِنْ. **اِسْلاَمْ:** دِلُغَتْدَه: اِذْعَانُ وِامْتِثَالَه يَانِي تَسْلِيمُ و تَرْكَا عِنَادِى وُ مُطِيعْ بُونَه مُطْلَقَا، ژِچِه رَه دِبَه بِرَا بِبَه.

**اِذْعَانْ:** قَبُولَه, **اِمْتِثَالْ:** بِجِه آنِينَا اَمْرَه.

**اَمَّا دِشَرِيعَتْدَه اِسْلاَمْ:** تَسْلِيمُ و مُطِيعْبُونَا بِظَاهِرُ و عِيَانِيَه ژِبُو هَمِي تِشْتِى كُو پِيغَمْبَرْ صَلَّى اللهُ عَلَيْهِ وَسَلَّمْ ژِجَمْ خُدِى تَعَا لَى آنِيَه. مُرَادْ بِمُطِيعِيِ: قَبُولْ كِرِنَا هَمِي اَحْكَامِى شَرْعِى نَه. اُو اِقْرَارْكِرِنَا وَانَه چِه بِوَانْ عَمَلْ بِكَه چِه نَكَه. وَكِي هَرْ پِنْجْ رُكْنِى اِسْلاَمِى كُو دِحَدِيثِينْ صَحِيحْ دَه نَه؛ وَكِي حَدِيثَا: **اَلاِسْلاَمُ: اَنْ تَشْهَدَ اَنْ لاَ اِلَهَ اِلاَّ اللهُ وَاَنَّ مُحَمَّدًا رَسُولُ اللهِ وَتُقِيمَ الصَّلاَةَ وَ تُؤْتِيَ الزَّكَاةَ وَ تَصُومَ رَمَضَانَ وَ تَحُجَّ الْبَيْتَ اِنِ اسْتَطَعْتَ اِلَيْهِ سَبِيلاً** (بُخَارِي وُ مُسْلِمْ) يَانِي: اِسْلاَمْ اَوَه كُو تُو بِدَڤِى خَوه اِقْرَارْ بِكِي اُو بِدِلِي خَوه بَاوَرْ بِكِي كُو ژِ اَللهْ پِيڤَه اِلَهْ تُونِنُ اُو مَحَمَّدْ ژِي قَاصِدِى وِيَه، اُو تُو لِمِيژْ بِكِي اُو تُو زَكَاتِي بِدِي اُو رُوژِيَا رَمَزَانِى بِگْرِي اُو حَجَّا بَيْتِى بِكِي كُو تُو كَارِبِي.

اِقْرَارْكِرِنَا بِاَحْكَامِي شَرْعِي ژِي بِكَلِمَا شَهَادَتِى چِي دِبَه. كَسِى كُو وِى كَلِمِى بِيژَه وَكِي كُو تَمَامِى اَحْكَامَانْ بِزِمَانْ حَقْ بِكَه.

وَالحَاصِلْ اَسَاسِي اِسْلاَمِي: تَلَفُّظَا بِكَلِمَا شَهَادَتِي يَه. اِمَامِ غَزَالِي گُوتِيَه: "لِگُورَا لُغَتِى عَرَبِي مَعْنَا اِسْلاَمِى فِرَه تِرَه ژِيَا اِيمَانِى، لَوْرَا هَرْ تَصْدِيقْ تَسْلِيمَه لِى هَرْ تَسْلِيمْ نَه تَصْدِيقَه" اِمَامِ نَوَوِي دِشَرْحَا مُسْلِمْ دَه وُسَا بَيَانْ كِرِيَه.

اَمَّا دِ شَرْعِى دَه، لِگُورْ مَذْهَبِى اِمَامِى شَافِعِي وُ عَقِيدَا اِمَامِ مَه اَشْعَرِي دِنَاڤْ بِينَا وَانْدَه عُمُومُ و خُصُوصَا مِنْ وَجِهْ هَيَهْ. يَانِي هَرْيَكْ ژِوَانْ ژِآلِيكِي ڤَه فِرَه يَه ژِآلِيكِي ڤَه ژِي طَنْگَه. لَوْرَا دِبَه كُو كَسِكْ دِظَاهِرِى شَرْعِى دَه مُسْلِمْ بَه لِى دِحَقِيقَتْدَه نَه مُؤْمِنْ بَه. چَوَا كُو آيَتَا **قَالَتِ الاَعْرَابُ آمَنَّا قُلْ لَمْ تُؤْمِنُوا وَلَكِنْ قُولُوا اَسْلَمْنَا** (حُجُرَاتْ: 14) دَلاَلَتْ دِكَه لِسَرْ وِي قَاسِي. يَانِي "عَرَبِينْ بَدَوِي گُوتِنْ مَه اِيمَانْ آنِي. تُو بِيژَه وَه اِيمَانْ نَه آنِيَه. لِى **بَلِى بِيژِنْ اَمْ تَسْلِيمْ بُونَه**". هَمْ دِبَه كُو مُؤْمِنْ بَه نَه مُسْلِمْ بَه وَكِي مُؤْمِنِى كُو قَطْ عَمَلْ نَه كِرِبَه، حَتَا كَلِمَا شَهَادَتِى ژِي نَانِيبَه.

بَلِى اِسْلاَمَا حَقِيقِيَا مَقْبُولْ لِجَمْ خُدِى تَعَالَى كُو دِبَه سَبَبِى خَلاَصِيَا ژِ عَذَابِى جَهَنَّمِى وُ بِدَسْتْخِسْتِنَا نِعْمَتِينْ اَبَدِي، اَوْ ژِاِيمَانِى نَا ڤَتَه.

چَوَا كُو سَيْدَايِ نَاظِمْ مَلاَ خَلِيلِى سِعِرْدِي گُوتِيَه: **"وَلِيــــكِنْ ڤَه يَــــكْ بِى يَــــكِي نَابِــــتِنْ مُسُــــلْمَانِــــي بِى هَــــرْدُوَانْ نَابِــــتِنْ"**

يَانِي "اِيمَانُ و اِسْلاَمْ بِى هَڤْ نَابِنْ. مُسُلْمَانِيَا حَقِيقِي بِى هَرْدُوَا نَابَه". لَوْرَا مُؤْمِنِى نَه مُسْلِمْ يانْ مُسْلِمِي نَه مُؤْمِنْ دِحُكْمِى شَرِيعَتِى دَه نَه صَحِيحَه كُو هَبَه. لَوْرَا اِسْلاَمَا بِى اِيمَانْ عَيْنِى مُنَافِقِي يِي يَه. اِيمَانَا بِى اِسْلاَمْ ژِي وَكْ لِمِيژَا بِى دَسْمِيژَه، نَه صَحِيحَه. چِه كُو اِسْلاَمْ شَرْطِى اِيمَانِى يَه.

وَالْحَاصِلْ اِيمَانْ عَمَلَكِي قَلْبِي يَه دِدِلْدَه چِى دِبَه، آنْجَاغْ اَحْكَامِى آخِرَتِى لِسَرْ تِينَه مَشَانْدِنْ. عَلاَقَاوِي بِزِمَانُ و عَاظَايَانْ ڤَه تُنَه. شُغْلَكِي ڤَشَارِي يَه نَايِى زَانِينْ. ژِبُو وِي قَاصِي گُوتِنَا بِزِمَانْ بُويَه فَرْظْ دَاكُو بِبَه عَلاَمَتِى بَاوَرِيَا دِلْ اُو بِبَه شَرْطِى جَارِي كِرِنَا حُكْمِينْ شَرْعِي لِسَرِى دِدُنْيَايِى دَه. وَكِي نِهَا مُحَافَظَا خُونَاوِي وُ مَالِى وِي، نِكَاحْ كِرِنَا ژِنِكَا مُسُلْمَانْ، لِمِژَا لِپِيْ دَمَاكُو بِبَه اِمَامْ، لِمِيژَا لِسَرْ دَمَا كُو بِمْرَه، دَفِنْ كِرِنَا دِمَقْبَرِى مُسُلْمَانَادَه، اُو وَكِي دِي. (ژِ رَهْبَرِى عَوَامْ)

**"يَارَبِّ تُومَه بِگَرِينِي ژِوَانْ كَسِينْ كُو دِاِيمَانَا خَوه دَه صَادِقِنْ"**

عَبْدُالْقُدُّوسْ حِلْمِي دِيَارْبَكِرِي

# bexçê zaroka

## Şîret

✎ Mirov karibe bi xwe, kare bi her kesî
✎ Ê dilê meriv rihet dike dew e u ê mala meriv xira dike derew e.
✎ Xweş xebere lê min jê ne bawere.
✎ Çavê li derîya xwelî li serîya.

## Xaçepirs (Bulmaca)

**BERWAR**
1. Qurbana îdê
2. Karker
3. Tiştê hêsan, ne zehmet
4. Hizur, sikunet
5. Navendî, Kesê nava du Alî de, diçe û tê.

**BERJÊR**
1. Heywanek dibe gurban
2. ‘Eşîrek li alyê Nisêbînê
3. Kesê ji ‘Urfa
4. Pirrê cîhanê, Xweda Rebbe ... ye.
5. Birîn, qurmiçandin.

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 |
|---|---|---|---|---|---|
| 1 | | | | | |
| 2 | | | | | |
| 3 | | | | | |
| 4 | | | | | |
| 5 | | | | | |

## GOTINÊ LI JÊR DI VIR DE BIBÎNIN

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| L | I | M | Ê | J |
| H | E | R | Î | P |
| E | R | O | J | I |
| C | E | J | N | R |
| Z | İ | K | A | T |

**LİMÊJ** **ZİKAT** **HERÎ**
**HEC** **PÎR** **ROJ**
**ROJÎ** **CEJN**







## ÎDA QURBANÊ MIBAREK BE ZAROKNO!

Hey zarokno! Merheba jiwer.

Sê roj berî îdê çek e (roja kirîna cila ye). Du roj berî îdê kulîçek e. Rojek berî îdê jî ‘erefa mubarek e.

Heger we cilê îdê kirî, bila rengê wan sipî û sor be. Bihawî jî, hinekî berjor be. Lê ne bi qasî ji guwwet zêde. Jibo zarokê Fîlîstînî ji me ne ğeyde.

Sibeha îdê, dema hun rabun, heger we taştê kir, vexwar şorbe, têxne destê xwe, kîs û torbe. Piştî limêja îdê, bigerîn li şekire qendê.

Ji mehellê destpêkin, mal bi mal. Hetta mala ap û xal. Jibîr nekin metika, herne destê xaltîka. Loqim û helawî, çiqas xweş e te’ma wî. Kê da, ji desta bigre, jê re bike şikre.

## Pê Derxin? Mela Çewa Kir?

Perê merovekî hatibun dizîn. Xwedyê pera hate cem melayê gund û jê ra derdê xwe got. Mela Şemsedîn piştî li xwedyê pera guhdar kir, çîrok naskir.

Ferman da gote: “Hemî zilam û xortê gund werne mala melê”

Rê û rêwanî di mala mela de nema. Mela, tev dane runiştandin û gote wan: “Gelî gundîno! Perê vî zilamî hatîye dizîn...” Pîşt re Mela hêkek ji berîka xwe derxist danî ber xwe û ji gundîya re gote: “İdî guhê xwe vekin û qenc li min guhdar bin. Ezê çend gotinê cadoyî bixwînim, wê ev hêk here têkeve dawa kesê diz.”

Bu çînvîna Mela, hêk leqîya. Gundîyê pepûk di cihê xwe de qeşa girtin. Ji tirsa xwezîya wan nema diçu xwar. Vê gavê Mela rahişte hêkê, danî şûna wê û bi ğeyd ji gundîya re gote: “Ez naxwazim yên diz rezîl û riswa bikim. Bes heger diz pera ji min re neyne ezê wî bihetikînim û li vê herêmê wê ruswa bibe.”

Roja din, xwedyê pera berxek ji Mela re serjê kîribu û wî ‘ezibandibu. Lewra diz pere derxistibu û teslîmî xweyê wan kiribu.

Di mişwarekî kin de dengê Mela wek burûskê li nava xelqê belav bu...

Gelo Mela çawa kiribu?

(Mela, qulek biçuçik di hêkê de vekiribu. Nava wê vala kiribu û kêzîkek reş xistibu hundirê wê. Pelekî çiğara danîbu ser cihê qul. Dema kêzîk di hundirê hêkê de dimeşîya, hêk dileqîya...)

### HUN VA ZANİN?

Cîyê vala bi yek ji van gotinê xwarê dagirin...

**1–Cennet di bin pîyê ... da ye.**
a)Bav b)Kal c)Pîrik d)Dayîk

**2–Limêj ... dîn e.**
a)Banê b)Bexçê c)Sutuna d) Derîyê

**3–Limêj ... Muminî ye.**
a)Xilasîya b)Mi’raca c)Rohnayîya d)Azadîya

**4–Misilman tenê ... ne.**
a)Dost b)Heval c)Bira d)Cîran

**5–Paqijî ji ... ye.**
a)Îmanê b)Avê c)Şiştinê d)Sabunê

### CEWAB BIDIN?

***1– Navê dîya pêxemberê me Hz. Muhemmed Sallallahu ‘aleyhi we sellem çî ye?***
a)Amine b)Xedîce c)Sumeyya d)’Eyşe

***2– Hz. Muhammed Sallallahu ‘aleyhi we sellem,dema bu pêxember çend salî bu?***
a)25 b)33 c)40 d)50

***3– ‘Ebdulmuttalib çî pêxember Sallallahu ‘aleyhi we sellem e?***
a)Bav e b)Mam e c)Kal e d)Xal e

***4–Navê bavê pêxemberê me Hz. Muhammed Sallallahu ‘aleyhi we sellem çî ye?***
a)Hesen b)‘Ebdullah c)Ebu Talib d)‘Ebbas

***5–Pêyxamberê me Hz. Muhammed Sallallahu ‘aleyhi we sellem li ku hatîye dinya yê?***
a)Medînê b)Şamê c)Mekkê d)Stenbolê

### Şîret

✎ Şêr şêr e, çi jin e çi mêre.
✎ Siwarê hespê xelkê, tim peya ye.
✎ Ji ğezalê bezatir tuneye; zêdeyî rizqê xwe naxwe.
✎ Qelî ji serê çivîka çênabe.
✎ Tu mêr be şevê tarî pirin.




# Şîreta Bi Şarezarî

Rojêki Hz. Hesen û Hiseyn gava li mizgeftê ne, zilamekî pîr ku destnimêja xwe şaş digre dibînin. Jibonî dilê wî nehêlin, ji hev re dibên: “Wer, em herne cem wî pîrî û jê re bêjin: ka li me meyzêne, kî ji me destnimêja xwe xweşik digre.” Li ser vê lihev dikin û diçine cem wî pîrî.







Silava Xweda lê kirin. Jê re gotin: “Mamo! Ka li me meyzêne, kî ji me xweşik destnimêj digre.” Zilamê pîr gote wan: “Deka bigrin.” Li ser vê Hz. Hesen û Hiseyn dest bi girtina destnimêjê kirin. Herduka, ji hevdî xweşiktir destnimêj girtin. Piştî destnimêja xwe qedandin, berê xwe dane pîro û gotin: “De bêje kalo a kê ji me xweşik bû?” Zilamê pîr li wan meyzand û beşişî. Ji wan re got: “Destnimêja we herdukan jî zahf xweşik bû. We her yekî ji ê din xweşiktir destnimêj girt. Ê destnimêja wî şaş e, ezim.”

Bi vê şîreta tevde aqil, nevîyê Pêxemberê me (Sallallahu ‘aleyhi we selem) Hz. Hesen û Hiseyn bi wî zilamê pîr dane fahmkirin kû destnimêja wî şaş e. Le belê bi şiklekî wisa ku qet dilê wî jî ne ma.

**Zazakî**

## Şertên Îslamê

İslam heqq û ‘edaleto,
Qey ma zey aw û heyato,
Peyxember her dâîm vato:
Panc şertê İslamî esto...

Şertê yewine herkes vaco:
Şahida **Allah**, Rebbê mino,
**Muhemmed** marê sertâco,
Kam nêzano we gêco...

Şertê diyîne **Nimaco**,
Marê her wext Mî’raco,
Qey ma nûr û hem tâco,
Her roc, wextê ê panco...

Şertê hîrine girotişê **Roce**;
Qey Homay min girot vace,
Veyşanî û teyşanî tay bance,
‘Ezabê nefsê xu qe meance...

Şertê çarine **Zekato**;
Hem ferzo serê malbato,
Feqîr gêno bê minneto,
Allah enî mâra vato...

Şertê pancine zî **Hecco**;
Musluman wa lebbeyk vaco,
Zey İbrahîmî cefa banco,
Qurban bido, derd nêanco...

*Adem Gönül*



## Bersiva ‘Alim Ji Mirovê Bê Bawer re

Mirovekî bêbawer ji ‘alimekî sê pirsa dipirse. Dibêje: “Heger Xweda heye nîşanê min bide? Heger her tişt Xweda çêkiriye çima mirov ceza dibînin? Heger şeytan ji agir e, wê çawa agir wî bişewitîne?”

‘Alim; piştî van pirsa kerpîçekî hitlîne û li serê wî dide û di êşîne. Di pişt re ‘alim û pirsyar dikevine mehkemê. Li mehkemê dadger ji ‘alim dipirse: “Te li serê wî xistîye ne wusa?”

Merivê ‘alim dibêje: “Vî mêrikî ji min sê pirs pirsîn û min jî kerpîç li serê wî da. Çawa? Wisa gotibu: Heger xwedê heye nîşanê min bide. Heger ew jî ser êşa xwe îddîa dike bila vê êşê nîşanê min bide.

Ya diduya jî gote min: Madem xwedê her tiştî çêdike çima mirov ceza dibînin. Ciwaba min ev e: Vî mirovî çima ez şikayetî mehkemê kirime?

Ya sisiya jî gotibu ku şeytan ji agir e. Ê çawa bandora agir bibîne. Ew jî ji axê ye çima bandora kerpîça ji axê dît?

## Bersîva xwendekar ji mamoste re

Rojekê ji roja, mamostê dersa fennî, ji xwendekarê xwe dipirse?

Dibêje: “Hun min dibînin ne wisa?”

Dibêjin: “Erê?”

Dibêje: “Hun mase û qelemê dibînin ne wisa?”

Dibêjin: “Erê?”

Dibêje: “Her tiştê ku heye mirov dibîne ne wisa?”

Dibêjin: “Erê.”

Dibêje: “Ma hun xwedê dibînin?”

Dibêjin: “Na”

Mamoste dibêje “Wî çağî xwedê tune!”

Wexta vê dibêje ji nava xwendekara xwendevanekî bawermend li hember gotina mamoste derdikeve?

Dibêje: “Gelî xwendevana! Ma ruh û aqlê mamostê me heye?”

Dibêjin: “Erê.”

Dibêje: “Ma hun dibînin?”

Dibêjin: “Na!”

Xwendevanê bawermend dibêje: “Ew çax ruh û aqlê mamostê me tuneye. Hem dîne hem mirîye. Dîn û mirî ewê çawa dersê bidne me.”

### Cewaba Xaçepirsê

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 |
|---|---|---|---|---|---|
| 1 | B | O | R | A | Q |
| 2 | E | M | E | L | E |
| 3 | R | E | H | E | T |
| 4 | A | R | A | M | İ |
| 5 | N | İ | W | A | N |

# Ji Xwendevana

## Ey Muhemmedî

**Huseyin YALÇIN**

Da'wa we ye da'wa heqiyê
Bimeşînin heta qiyametê
Wek dewra Pêxemberê ûmmetê
Rakin vê zûlma li ser milletê

Yahudine her 'eskerê xayin
Zûlmê direşînin li ser Filistîn
Xort û êxtiyar zarok û pîrek
Şehîd dikin wan vedixwun xwîna wan

Ev nav li ser we hatîye danîn
Mûcahid tev 'eskerê xaliqin
Rêya we rêya Pêxembera ye
Dînê we her dînê Îslamê ye

Werin xelas bikin evan mezluma
Ji destê van ğûlamê 'emerîqa
Navê we ye mûslûmanê cengewar
Ger hun bimeşînin da'w û hûkmûllah

Ey Mûslûman tû rabe wekî şêra
Hilde ala tewhîd li çol û çîya
Mûslûmanê me hene li her dera
Netirse ji kesi tuyî qehreman

## Xiravî Bar Pîsona

**Mehmet Salih GÖNÜL**

Ey neslê benî adem bizon dunya yo zura
Wext ezrail bî tu ser, dunya a hel qedyena
Suso rindî tu xapnên hakikat vate homew
Hem marî bêr to bi est, zobî tur ben zoj guna
Sur qiyamet dapiru bêr hidayet qejîlyon
Dest tu l3in tu bên şahad, bên adir dusen cana
Tikînir benu heval, çikaj rind kelam home
Tikîz dunyad umudxu ebstên zurker şeytano
Amêltu verg beden tu wext ti şî xur holi ser
Dejter tu yen dest raşt ser, adir cehennem ben hona
Ayka homê mara vat, kom dî qalyî bi batal
Bira în imtihan gird, xirojî bar pîsona
Pexmêr vat badmi îmon, ze adir nîn depiştiş
Kom sebat bik in çe'did, kîver cennet cir bên a
Aşkê Kur'an tu zerdiv dunya bî nêş kena tu
Ters nimonen îdomra nî merqra nî zîn dona
Ze Şêx Saîd o Nursî kufri sar i weradê
Xelasî ino dunya onêna yo çilk guna

## Xewna Şêrîn
## 5 Nisan 2001 Medresa Yusufîye a Mêrdinê

**M. Ata Özmen**

Pêşiya limêja sibehê bu
Min xewnekî ğerib dît
Xewna xwe de min dît...

Gelek heywan civîya bun
Di nav wan da bi navê "Duldul"
Hespê Îmam Huseyn hebu...
Pir ğemgîn, bê hal û birîndar bu
"Ev çi halê te ye ey Duldul"
Min ev gotina xwe
Ji Duldul ra disa got
Lê Duldul disa guh neda gotina min...

"Ey Duldul!
Çima ğeyidîyî ji me?"
Kevokeke ku birîndar
Jê re digotin, kevoka mizgînîyê
Xweda ziman xiste devê wê û got:
"Ey benî Adem
Ji roja ku neviyê Resul şehid ket
Duldul, ğeyidîye ji ummeta Muhammed"

Kevoka mizginîyê, ji min ra jî got
"Ez jî mizgîn kî bidim te!
Ey 'evdê Xweda!"
Bi vê mizgîna kevokê!
Kêfxweş bubu 'Eta!
Kevoka mizgînîyê ji min ra got:
"Xweda hevale bi sebrê ra eger hun sebrê bikin jê ra
Wê Xweda alikar be ji we ra
Lewra
Xwediyê sebrê mirê misrê"

Kevoka mizgînîyê
Şiretê xwe dom dikir ku
Birakî min ez şiyar kirim
Ji wê xewna şêrin:
"Rabe ey bira
Rabe limêja sibhê bike
Şeytan ker û gêj bike
Put û senema li binguhê erdê bixe
Ji wê xewna şêrin
Min şiyar kir
Ev birayê şêrin.

# DESTANA MÊRANÎYÊ

*Ji navenda Kurdistanê*
*Şêrê Welî derket banê*
*Sehbu va dengê azanê*
*Huseynim ez şûr bi destim*

*Ji ser wê kelha Amedê*
*Gote werin naskin xwedê*
*Jiboy ev nur zêde bibê*
*Jidandî me ez ne sistim*

*Jiboy nasbikin rebbê xwe*
*Azadîyû 'izzeta xwe*
*Xiste vê rê heyata xwe*
*Ez li ser 'ehda elestim*

*Ji bona nura Îslamê*
*Ronî bide berdewamê*
*Gund bi gund gerand selamê*
*E jî pê ra kemerbestim*

*Musulman şîyarbin dîsa*
*Bigrin destê jar û qelsa*
*Azad bibe Ka'be Aqsa*
*Ez bi vê ğayê mebestim*

*Jiboy bigrin bi destê hev*
*Qewm û 'eşîr û malbat tev*
*Neyartî ji nav me birev*
*Ez jî wek wî xwedî hestim*

*Hebizbinîyû hem Remî*
*Torî, Botî û Mihelmî*
*Li dora wî civîn hemî*
*Lipey wîna ez rêrastim*

*Ji Zaza û ji Kurmanca*
*Ji Tirk û hem gelê qenca*
*Bun xwedyê rumet û tâca*
*Bi vêna îro dil mestim*

*Rabu hîzba xweda saz kir*
*Âlâ tewhîdê wî rakir*
*Ciwan û jin û mêr karkir*
*Bi vê derketnê bi bestim*

*Huseynê vê 'esra bîstî*
*Qet nasnekir tirs û sistî*
*Heq dizanî heq dixwestî*
*Bi 'ilm û cehdê arastim*

*Ji Amed û ji Mêrdînê*
*Heta Tersus û Mêrsînê*
*Qonya û hem Qonstantînê*
*Nasekinim heq bi destim*

*Heta melek mizgîn anî*
*Gote îdî were banî*
*Cengewarê vî zemanî*
*Tim û daîm heq perestim*

*İmameya vê tizbîyê*
*Ev tizbîya şehîdîyê*
*Zikrê wê zikrê heqîyê*
*Her wê hebe ez na westim*

*Bila rabe Selaheddîn*
*Vî rêzanê wek xwe bibîn*
*Jiboy hukmê şer'a mubîn*
*Ez jî wek wan tim bi qestim*

*Werin Teyran û Cizîrî*
*Bateyî Xanî Herîrî*
*Bêjin li ser merdê jîrî*
*Lew bi çûna wî şikestim*

*Seîdê Nursî-w Palewî*
*Fexrê dikin îro bi wî*
*Dîsa mumin bune qewî*
*Berdewamim bê rawestim*

*Hivdehê vî çilê ğedar*
*Sor buye jber gulê neyar*
*Firîyaye çuye bâ yâr*
*Lew e jî sekran û mestim*

*Zivingî jî wek her Kurdî*
*Xelasîya xwe bi te dî*
*Êdî vê rîyê bernadî*
*Vaye li meydanê rastim*

*Zînnur Zivingî*



**'Ehda elest:** Dema Xweda ruh xuliqandin go: "Elestu bîrebbîkum?" yanî "Qey ez ne rebbê we me?" Wan jî gotin: "Bela" yanî "Erê Ya rebbî tu rebbê me ye."

**Kemerbest:** Hevalê ku pê ra hazir
**Mebest:** Ğaye, meqsed, nêt
**Hest:** Hîss, ilham, dilzîzî
**Best:** Îlham, stendina ilhamê
**Arast:** Mucehhez, girêdayî



# Destana Meşa Azadiyê

Şoreşgerê azadî, herî li pey enbîyan e
Her ew bi rastî didin, tekoşîna însan e
Însan berê azad bûn, rast e ew azad bijîn
Ne ku bibe dîl û kolê iblîsê şeytan e

Xweda însan ji tuneyî anî hebûnê
Bire secdê jêr temamê melekan e
Piştî vî qedrê mezin wî kir xelîfê erdê
Kir xizmeta wî her tişt dayê eql û ziman e

Riya rast û riya xwar, riya ziyan û ya kar
'Edalet û zulm û 'ar, însan tê da kir zane
Ev behr û çem û kanî, bostan û war û xanî
Xweda dane însanî, tiştek nehişt noqsan e

Bes xweda ev dunya kirye ciyê îmtihanê
Jibo baş û pîs ji herkesî ve bibin xuyan e
Destûra şeytan li însan da, bi weswesê pîs
Ka wê nankorî bike, piştî van qencîyan e

Tu hakîmiyeta şeytan tune li ser însana
Bi ğeyr ji çêkirina xeyal û weswesan e
Însanê nankor û bê sebr û ğafil û nezan
Ji şeytan ra bûn 'esker rabun liber xwedan e

Bûn emirberê şeytan azadiya însan birin
Zulum ji xwer kirne kar dunya kirin zîndan e
Rîya rebbê xwe berdan riya heq û azadî
Ev erda wek beheştê ava kirin wêran e

Li hemberê van xayin û nankor û zordesta
Xweda wehya xwe hînkir hin însanê hêjan e
Ev kirne pêxember û bi qasidîtî şandin
Da însan azad kin ji şeytan û zaliman e

Tekoşîna însan dan pir dema azad kirin
Hemandin jê ra bûne bekçî û şivan e
Pêxember hatin û çûn ji qewm û 'eşîra re
Bes Muhammed bû ê temamê gelê cîhan e

Pişt ra 'aliman dan ser mila barê way giran
Weka wan bi 'ilm û xwîna xwe tarîx avdan e
Gelek tarîxê şan û şerefê ava kirin
Pir millet azad kirin tarîx şahidê van e

Îro jî wek herdemê va warisê enbîya
Mizgîn rabûne li hember zorî û zordestan e
Nabînin Muhammedî wek şêr hicuma didin
Dujminê însan, şahid herder û Kurdistan e

**Seydayê Mela Mizgîn**